

Sernivîser
Qado Şêrîn



Derhêner
Xorşîd Şûzî

Hevbenda Nivîskar û Rojnamevanên Kurd li Sûrî



hejimar '22' - Sibat 2014

شهرية تصدر عن رابطة الكتاب والصحفيين الكورد في سوريا

Boniye Cegerxwin

Pîrozbahîya 8ê avdarê



Bi salaye ku jinên cîhanê 8ê avdarê roja navneteweyî ya jina, pîroz dîkin, şahî, semîner û civînan li dardixînin, ev roj ji bo tevahiya jinan rojêke dîrokî ye, simbola raperîn û berxwedana jina ye, kar û xebata jina, ji bo bidestxistina mafên civakî ber bi çav dike, pîrsa wan li pêş dixîne û rêça xebatê ji wan re belû dike.

Jinên kurd jî li welat û li dervey welat bi salaye ku wek rêxistin vê rojê pîroz dîkin û li ser pîrsa jina bi awakî giştî radiwestin, semîner û konfiransan amade dîkin, li ser mafê jina bihevge gengeşe dîkin, azariya jinên kurd gelek diware, eger mêrên kurd carekê bindestin jinên Kurd du cara bindestin, civaka me ya kurda pîrsa jina hinekî piştguh kiriye, ji ber ku pîrsa netewî ketiye rêza yekemîn, îro roj em gelê kurd bi tevahî bindestin, azariya me gelekî diware êdî jin û mêr bihevge vê azariyê dibînin, kêmasiyên civakê dipijirînin, ji lewra pîrsa jina li paş dimîne, çiqasî jî hin jinên pêşketî û zane ev bar danîne ser milê xwe û bi sala bi vê pîrsê mijûl bûne, bi taybetî li dervey welat ji ber ku pêkarînen jina li derve bêhtirin, lê dîsa jî têr nake ji ber ku guhertin divê ji bingehe bête kirin û civat bi tevahî bi vê pîrsê mijûl bibe, pîrsa jina ne tenê pîrseke siyasiye, lê belê pîrseke civakî û aboriye ji lewra divê ev pîrs têkeve rojê xweyê rêxistinên kurda yê siyasi bi awakî firehtir.

Bê guman kêşeyên me yê siyasi jî bandora xwe li ser vê pîrsê dike û hinekî dûr dixîne, lê bi hevge emê van astengan derbasbikin. Iro roj şoreşek li dare, gelê sûrî bi tevahî daye berxwe, jin û mêr bi hevge cengeke derûnî derbas dîkin, rewşa welat bi tevahî diware, bobelatên mezin çêdibin, em bi hevge ku gelê me van rojên diwar êdî derbasbikin, jin jî para xwe ji azadî û serbestiyê bistînin.

Bela roja 8ê avdarê soza jinên kurd be di xebateke nûjen de bo welatekî azad û civateke rihet ku her kes karibe tede armanc û daxwazên xwe pêşve bibe be ku astengên civakî sinoran ji karê wan re deyne.

Bijî 8ê avdarê simbola raperîn û serxwebûnê. pîroz be ji jinên cîhanê re ev roj, silav ji jinên welat re bi tevahî, hevîdarim ku jina kurd di berxwedana xwe de serfiraz û serkeftî be, azadî ji gelê me re li tevahiya sûrî.

Welatê xwe nas bike:

Mêrdîn



Mêrdîn (bi tirkî: *Mardin*) bajarekî Bakurê Kurdistanê ku îro dikeve Komara Tirkiyeyê. Bajarê Mêrdînê ji başûrê xwe ve bi Rojavayê Kurdistanê, ji rojhilatê xwe ve bi Sêrt û Şirnexê, ji bakurê xwe ve bi Amedê û ji rojavayê xwe ve jî bi Rihayê hatiye pêçan. Hejmara niştecihên wê nêzî 850.000 kesan e. Qezayê bi ser ve ev in: Qoser, Nisêbîn, Midyad, Mehser, Dêrika Çiyayê Mazî, Şemrex, Kerboran **Rûpel (19)**

Hevpeyvîn Pênûsa nû bi dengbêjekî

Civaka Êzdî: Teterê Eliyê Mamed re!



Li goriya dîtina min, gava meriv dîroka xwe ya kevn baş nas neke, meriv nikare dîrokeke nû jî rast baş biafirîne. Lewma jî divê em dengbêjî û wêjeya Kurdî, ya ku bi devkî hebûna dîroka gelê Kurd di nav xwe de didexwanê û parastiye baş nasbikin. Bi dîtina min û mixabin, piraniya zargotina me Êzdiyan ji ber hûnera dengbêjî û **Rûpel (21)**

Hoşeng Broka: KURT û KURMANCÎ

„RASTIYA DAWÎ DEREWÊ!



Ya rast, rastî (bi taybetî rastiya filo sofî-yane) „dawiyan“ nas nake ... Ne „rastiya dawî“ heye, ne jî „dawiya rastiye“. Rastiya dawî, dawiya rastiye ye ... Werîse derwê kin e, lê werîse rastiye tun e ... Dawiya rastiye, destpêka derwê ye ... Keys ji derwê re tê, ku dawî li rastiye tê **Rûpel (5)**

Dr. Ehmed Xelîl

Wergêr: Heyder Omer



Kesayetiya kurdi Lêkolînên civaknasîn



MIROVBENDÎ Û COMERDIYA KESAYETIYA KURD

Êdolojiya dirind e: Di dîroka mirovaniyê de gelek rastiyan êşdar hene, berzîrînen wan ew e, ku birêveçûna mirov di jiyandê de yekeke nakokiyane, her gava li şûnekê bi cih dibe, nakokiya tevayî ya berdeham dibe qedera wî ya herhe, ji neçare tevdi gere, da hewceyên zikê xwe ji xwarin û vexwarinê bi dest xîne, hewceyên xwe yê seksî têr bike, û xwe ji dirindeyan biparêze, her weha mirov tevdi gere, da li gel êkolojiyê li hev bike, û bi mirûzê wê yê bê tebat re li hev were. Ev nakokiya welê tevayî û berdeham jî her tim gav bi gav li gel têkoşîn û ked û azaran hevrê ye. **Rûpel (6)**

Ebdulbaqî Huseynî



Keça Kurd (Emîna Omer Mahmûd)

Nivîskar û helbestvan



Emîna Omer Mahmûd an jî (Keça kurd) wekû hatiye nasîn, yek ji jinên kurdên rojavayî Kurdistanê, ên herî navdare di warê tore û çanda kurdî de, Keça kurd di destpêka xwe de, di navbera (1970-1980) de karekî siyasi mezin kir, paş re dest

Binivîsandina helbestan kir, û herwiha di warê wergerandina ji zimanê erebî bo kurdî sê pirtûk wergerandin, dido ji wan ên mêrê wê (Mihemedê Mele Ehmed) bûn, ku kirin zimanê kurdî digel ku hîn nedabûn cape **Rûpel (9)**

Dr. Têmûrê Hesên (Hasanyan)

Çend gotin derbarê

„FERHENG A ŞIROVEKIRINA ABORIYÊ“ de



Hizira çêkirina ferhenga şirovekirin aboriyê a bi zimanê kurdî (kurmançî), hê destpêka salên 2000an li ba min pêşda hat, Lê karê amadekirina ferhengê, ev 6-7 salin ku hatiye destpêkirin. Pêdiviya çêkirina ferhengeke weha, bi hindek sebebên ve tê şirovekirin, Yekemîn, hetanî niha bi kurmançî tu ferhenga şirovekirina aboriyê nîne, daku kategorî yan têgihên aboriyê, rave bike. Duyemîn, her çiqasî jî welatê kurdan hatiye parçekirin **Rûpel (14)**

Dr. Mehmûd Ebas

Pêşeroje Zimanê Kurdî



Gelek lêkolîn li ser zimanê kurdî hatine weşandin, pir ji wan istangiyên di navbera zimanê kulturê de û zeravê li her hermekê şirovekirine, û hin lêkolîn bi gelek rexinê pêwîst hatine belavkirin li ser cîdebûne kûr û fereh di navbera her car zeravê serekane de, bê goman, em bîvin yan nevin ev estangiyê hane, di deme iro de dibine sedemne xûrt di jêvelekirine mîletê kurd de, û bi taybet di navbera hêzên remîvar de, û wê bibine sedmên cîdebûne ferehtir di navbera hermê Kurdistanê de di rojê werê de. **Rûpel (3)**



Dr. Sozdar Mîdî (E. Xelîl)

wergera ji erebî: Mustefa Reşîd

Xeleka Gotaran: Kurd û Îslama Siyasî Xelek 4

Rah û Damarên Ramanên Ayînî li Kurdistanê



Berî Cihûtî, Krîstiyani û Îslametiye neteweya Kurd bi ti awayî ne di tarîtiyeka giyanî û sincî da dijîya; wek ku hin îslamewiyên tuntrew hewldidin rewşa me wisa bidin xuyakirin . Bi vajayî wê, seranserê ax û zemîna Kurdistanê landik û dergûşa kevintirîn û navdartirîn sazûmanên mîtologî û ayînî li Rojhilata Navîn bû. Daku em vê rastiyê bidin xuyakirin, ka em hinekê li rah û damarên ramanên ayînî li Kurdistanê bikolin .

Bergeh û Heyamên Pêşketina Mîtologiya Kurdistanî:

Hemû ol û ayîn - bi destpêkên xwe yê mîtologî va - wek diyardeyên giyanî yê çand û şaristaniya neteweyan tên hejmartin; ew wek şêwe û awayekî derbirîna dîtina wan neteweyan ya hebûnî û gerdûnî ye. Ji hêla din va ev diyarde û ev dîtina wek ayîne û neynika rewşa wan a civakî, siyasî û aborî ye jî. Daku em bi temamî rah û damarên Mîtologiya Kurdistanî têbigihînin, divêt em vegehin serdemaya kevin ya Neolîtîk (*neolithic*), ku 9000 sal b.z. destpêdike. Divêt em vegehin ser rewşa erdnîgariya wê demê ya germiyên û kuntarên çiyayên Zagros û Toros û derdorên wan (landik û dergûşa neteweya Kurd). Ji wan herêm û wan derdoran koça şaristaniyê bi mîtologiyê destpêkir û bi rê ket, û wisa ew di çar heyamên dîrokî ra derbas bû:

1- Heyama Şaristaniya Guzana: Şaristaniya Guzana di heyama kevirî û madenî da (5600 - 4400 b.z.) xuyabû, Ev şaristanî li gor Girê Guzana, ku li nêziya bajarê Kurdan Serê Kaniyê ye hatiye binavkirin. Navê vî girî bi encama siyaseta nijadperest hate erebkirin û bû "Til Helef", Ev şaristaniya Guzana şaristaniyeka gelek petî û hîmî ye, ku wê li piraniya erdnîgariya Kurdistanê şopên xwe hiştine, Di hembêza vê şaristaniyê da hunera çandiniyê, hunera çandin û pirkirina giya, sewse û fêkiyan, xwedîkirina lawir û heywanan, avakirina avahî û xaniyan û çêkirina qermît û bikaranîna wî di gelek warên jiyane da pêkhat û geş bû. Ji hêla din va dîsa ev şaristanî bû ku di hundirê wê da mîtologiyê destpêkir û berî her tiştî xwedawendên heyam û surîştê, xwedawendên dayîkî, bereket û berhemê, awa û şêwazên veşartin û binerdkirina miriyan, baweriya bi hebûna jiyaneke din piştî vê jiyane û hwd. Peydabûn, Hên di wan deman da gava mirovan miriyên xwe vedîştin seriyê wan bi aliyê rojava va dadin û rûyê wan didan aliyê derketina roj û tavê. Her wisa bi miriyan ra hin nawelên wan yê taybet dixistin gorê, bi baweriya ku dibe ji wan ra di jiyana din da pêwîst bibe⁽¹⁾.

2- Heyama Somerî: Ji erdnîgariya şaristaniya Guzana, Somerî ber bi başûrê Mezopotamiya va li dora salên 4000 b.z. daketin û bi xwe ra çand û şaristaniya Çiyayên Zagros (*Çiyayên Kurdistanê*) bi hemû naverokên wê yê ayînî, civakî, siyasî û aborî va anîn warên xwe yê nû. Wan li van warên nû êdî nivîsîn bikaranîn. Ji berma û nivîsên yê li

ser qermît gelek berhem mane, wek nimûne Destana Gilgamêş.

Li van herêman, Someran xanî û perestgehên xwe yê heya sê qatan jî li cihên bilind avakirine (*Avahiye Sêqore*). Dîsa li vir salnameya li gor rojê bikaranîna û *Pantheona Xwedawendan* (*Civata Xwedawendan*) bi ser pereştîya xwedawendê mezin *Anû* û di pey ra

Enlîl û *Engî* bi nav kirine ku ev xwedawend siya xwe li mirovan dikin û jiyana wan bi rê va dibin. Ji şaristaniya Somer wek dînda û neviya şaristaniya Guzana pêkhatên şaristaniyê derbûn û li gel mîtologiya li seranserê Rojavayê Asiyayê belav bû.

Di heyamên piştî wê ra, her gel û neteweyekê li gor çanda xwe êdî têda hin guhartin pêkanîn, Yek ji efsane û çîrokên mîtologiya wê demê çîroka Tofana pêximber Nûhe, Hemû bermayên çanda Somerî, Babilî, Cihûyî, Krîstiyani û Îslamî dibêjin ku ew çiyayê keştiya Nûh li ser daketiye li Kurdistanê ye. Navê wî çiyayî di bermayên Somerî û Babilî da *NÎSÎRe*, Li gor hin lêkolîneran ev çiya "*Çiyayê Pîre-Megron*" e ku li nêziya bajarê Silêmaniyê li başûrê Kurdistanê ye⁽²⁾. Li gor pirtûka *Tewratê* ya Cihûhayn ev çiya "*Çiyayê Agirî*" ye (*Ararat*). Lê di pirtûka, Qur'anê da tê gotin ku "*Çiyayê Cûdî*" ye, Akkadî û Babiliyan navê xwedawendê Somerî "*Ûtû*" (bi kurdî "*Etûn*, *Pêtî*) yanê Roj birine û nav lêkirine "*Şimş*". Xwedawendê Heyam û Suriştê yê Samiyan li Mezopotamiya û Sûriyayê (Heded, Hêded) ji guhartina navê xwedawendê Somerî "*Addaw*, *Adad*" (xwedawendê ku rizq dide) hatiye⁽³⁾.

3- Heyama Kaşî û Horiyan: Ev heyam ji salên 2000 heya 1000 b.z. dirêj dibe. Di wan deman da erdnîgariya Kurdistanê di bin serdariya pêşengên Kurdan ji herdu şopên *Kaşî* û *Horî* (*Hûrî* = *Xorî*) da bû, tevî hukumdariya *Kaşîyan* li Somer û Babil (navenda Îraqa îro). Mîtologiya kurdistanî di wê demê da ber bi pêş ket, Li ba *Kaşîyan* xwedawend "*Xod*, *Xwe Da*" (yê ku xwe bi xwe daye) tê naskirin. Û xwedawendê rojê "*Suriaş*" li ba *Horiyan* "*Ê Sore*" tê gotin û di pey ra li ba pêşiyên Kurdan wek "*Ahora*" bi nav dikin⁽⁴⁾.

Gelek şop û nîşanên wê yekê hene ku çanda gelên kevin yê Îraqa niha (*Akkadî*, *Babilî*, *Aşûrî*, *Kildanî*) û yê herêma Sûriya û Felestîne (*Fînîqî*, *Ken'anî*, *Ibrani*, *Aramî*) bandora xwe ji çanda Somer û şaristaniya *Kaşî-Horî* girtine, bi taybetî jî di warê mîtologiyê da. Tenê wek nimûne em xwedawendê Heyam û Suriştê "*Heded*" bi nav dikin ku ji xwedawendê *Suriştê* yê *Horî* "*Teşşûp*" hatiye, ewê ku hên di bermayên kurdên me yê *Êzîdî* da bi awayê "*Adû*, *Adî*" tê naskirin⁽⁵⁾.

4- Heyama Madan (Mîdiya): Ev heyam ji salên 1100 heya 550 b.z. dirêj dibe. Di vê heyamê da hemû şop û beşên pêşiyên Kurdan di warên çandî, civakî û siyasî da ketin nav hev û bûn yek. Padîşahê Madan yê yekemîn *Deyako*, kurê wî

Ferawurt û neviyê wî *Keyxesro* pêşiyên Kurdan di warên siyasî, çandî û ayînî da heya bi radeyeka mezin kirin yek, û wisa bingehe pêkanîna neteweya neteweya Kurd avakirin. Di dema wan da neteweya Kurd taybetmendiyên xwe yê ji neteweyên din cuda û di nava xwe da hev girtî standin.

Di wan deman da têgihîn û nîşanên mîtologiya kurdistanî di nava tevaya gel da belav bûn û rûniştin.

Di destpêkê da bêhtir li dor ayîna perestina *Rojê digeriya* û di pey ra bi awayê ayîna *Zardeştî* ya yekbûn *Xweda* cih girt .

Ji Mîtologiya ber bi Yekbûna Xweda:

Ramana ayînî kurdistanî di pêşketina xwe da ji sazûmana mîtologiya destpêkî heya bi *Sazûmana Ayînî Yekbûyî* di çar heyaman ra derbas bû, û bi van xweseriyên tê naskirin ku ew jî ev in:

A- Mîthrayî: Li gor xwedawendê rojê yê Ariyên Kevin "*Mithra*", xwedawendê *Hevgirtin û Hevpeymanê*, parêzvanê maf û rêzê, peywanê rastî û wergirê giyanê mirovan piştî mirinê. Xwedawend "*Mithra*" nîşana tav û rojê bû, Ev ayîn ber bi rojhilat va heya bi welatê Hind belav bû û ber bi rojavayê va Rojavayê Asiyayê derbas kir û di salên 60 z. da êdî ket Romayê. Di sedsala 2 ya z. da li seranserê Emperatoriya Romanî belv bû heya ku gihîşt giravên Brîtanîyayê jî⁽⁶⁾.

B- Zorvanî: Li gor xwedawend "*Zorvan*", xwedayê xêr û ronahiyê û xwedayê demê. Di vir da *Ahora-Mezda* (xwedawendê Ronahî û Xêrê) û dijberê wî *Ehrîman* (xwedawendê tarîti û şer) digihînin hev, herdu dibin yek têgihîn û yek xwedawend ku cudahî di navbera wan da namîne û wisa ji du-xwedawendîyê derbas dibe⁽⁷⁾.

C- Mezdayî: Xwedayê cihanê û hemû mirovan. Di vê ayînê da pêwendiyên navbera mirovan û hezên asîmanî gelek aşkera û zelalin, Em wisa bawer dikin ku peydabûna "*Mezdayiyê*" hevaltiya peydabûna ramana siyasî ya yekbûyî li ba pêşiyên Kurdan dike, Bi temamî di wê demê da gava baweriya siyasî-kurdistanî ku kesê Kurd xwe tenê wek endamê êl û eşîrekê didît, êdî vê rewşê derbas dike û xwe wek endamê yekîtiya êl û eşîrên seranserê welat dibîne.

D- Zerdeştî: Padîşahê Madan yê yekem *Diyako* hîmê Padîşahiya Madî li ser bingehe pêşketina ramana siyasî ya yekîtiya êl û hozên Kurdan danî û emperatoriyeke wisa avakir ku karibe welatê Mad û gelên çiyayî ji zor û setema emperatoriya *Aşûrî* rizgar bike (wisa xuyaye ku Kurd nabin yek heyanî zordarî li ser wan pir giran dibe). Li gel vê pêşketina siyasî, sazûmana ayînî ariyanî li ser destê pêximberê Madî *Zerdeşt* bû sazûmaneka yekbûyî bi serpereştîya xwedawendê yekane *MEZDA* û wek "*AHORA MEZDA = HORMEZD*"

hat binavkirin; pêximber *Zerdeşt* hemû rewîştên pîroz lêkirin. Zerdeşt sazûmaneka ayînî, tamam û tevayî danî ku têda rewayî, perestî, rê û şewazên perestina Xweda, rêberiya Xweda li ser zemînê û çarenûsa mirovan li cîhana duwem gişt hene⁽⁸⁾. Cihûyan li Felestîne roxand, Cihû aware bûn û di **Bandora Ramana Ayînî Kurdistanî li ser Herêmên din:**

Di rastiyê da ramana ayînî Kurdistanî, çî bi şewazê Somerî û çî bi şewazê rojperestî ku ji heyama Kaşî destpêdike heya bi Zerdeştîyê, şopên xwe yê pir girîng di ayînen Rojhilata Navîn da bi cih kirine; bi taybetî jî ew ayînen ku ji wan ra "*asîmanî*" dibêjin, wek *Cihûtî*, *Krîstîyanî* û *Îslamîyê*. Helbete emê nikaribin di vê nivîsê da bi berfirehî têkevin nava vê mijarê, ji ber ku ew hewceyî lêkolînen pir fireh û kûre. Em hêvîdarin ku emê ji pey ra van agahdariyên pêwîst tamam bikin. Li vir emê tenê hin nimûneyan bidin:

1- Çîroka Tofana Nûh: Gava padîşahê Kildanî *Neboxez Nesser* bajarê *Ûrşelîm (Quds)* paytextê

sala 598 b.z. şarederî Mêzopotamiya û başûrê Kurdistanê kirin. Wan li wir çîroka pêkhatina gerdûnê, afirandina jiyane û çîroka Tofanê wergirt. Di pey ra têda hin guhartin li gor sazûmana xwe ya ayînî Cihûyî pêkanîn. Ji Tewratê jî ev bermaya Somerî derbas nav Krîstîyanî û Îslamîyê bû.

2- Beranê Qurbanê: Rahên vê xweriska (adeta) ayînî hên li ba Horiyan hebûn. Wê hîngê Rêberê Ayînî sê tilûr (teyr) dianîn, hemû guneh û sûcên gel davêt ser wan û ew dikirin qurban ku wisa seranserê gel ji sûc û gunehan rizgar bibe. Di pey ra ev xwerisk (adet) derbasî Cihûyî bû. Li ba wan Rêberê Ayînî yan nêriyek yan jî gayek dianî, gunehên gel diavêtin ser wî û ew berdida biyabanê. Vê xweriska han di pey ra bi awayê "Beranê Qurbanê" li ba pêximber Ibrahîm hat xuyakirin (wek ku di Tewratê da hatiye) û ji Cihûyîyê êdî derbasî Îslamîyê bû⁽⁹⁾.

3- Iblîs / Şeytan: Berî ku Cihû li başûrê Kurdistanê bi cih bibin, gava *Neboxez Nesser* ew şarederî wir kirin, di bermaya wan da heyberekî wisa şerrûd bi navê (*Îblîs/Şeytan*) ku dijberiya Xweda dike, tinebû. Ev têgih ji Xwedawendê Şer *Ehrîman* ji Zerdeştîyê wergirtin, û bi hin guhartinan derbasî Cihûtî, Krîstîyanî û Îslamîyê bû.

4- Cîhana Din: Berî ku Cihû şarederî başûrê Kurdistanê bibin, di bermaya wan a ayînî da tiştêkî wisa bi maneya "**Cîhana Din**", ku niha di Cihûtî û Îslamîyê da heye, tinebû. Cihûyan ev tişt ji Zerdeştîyê wergirt, ji ber ku têda wêneyekî tamam û dagirtî li ser "*Jiyana Piştî Mirinê*", Rawestina Mirovan ji nû va, Hesab û Pîvana Xêr û Gunehan, Sezadan, Pira Selatê, Bihuş û Dojehê heye.

Ev bû bi kurtahî rêveçûna ramana ayînî Kurdistanî ji demên kevnare da heyânî ketina emperatoriya Madan sala 550 b.z. Ev jî piştrast dike ku Bi vajayî

Kurdistan ne welatekî vala bû ji ayîn û ramanên olî. Bi vajayî wê, ew di hemû warên jiyane da navenda van ramanên bû. Belê, ramanên ayînî li Kurdistanê peyda bûne. Kurdistan herdem warê hêzvana van ramanên bûye, û ji wir şewq û tîna xwe daye hemû ayîn û olên seranserê Rojhilata Navîn.

Jêder:

- 1: Mohamad Payyûmî Mihran: Dîroka Îraqê ya Kevin, rûpel 23.
- 2: Taha Baqir: Destana Gilgamêş, rûpel 141 û serinc 160.
- 3: Samoel Gremer: Ji tabloyên Somer, rûpel 75.
- 4: Arshak Savrastîyan: Kurd û Kurdistan, rûpel 42, Dyakonov: Mîdiya, rûpel 131 - 133.
- 5: Gernot Wilhelm: Horî, rûpel 100. Sabatino Muscati: Şarîstaniyên Samî yê Kevnare, rûpel 258.
- 6: Jefry Bamer: Baweriyên Ayînî li ba Gelan, rûpel 147. Arnold Tuinbi: Kurtahiya Dîrokê, rûpel 2/187
- 7: Samoel Gremer: Efsaneyên Cîhana Kevin, rûpel 313.
- 8: Dyakonov: Mîdiya, rûpel 355, 378. Hamed Abdulqadir: Zerdeşt Pêximberê pçşiyên Îraniyan, rûpel 24. Abdulhamid Zayed: Rojhilata Hemdem, rûpel 653, 655.
- 9: Gernot Wilhelm: Horî, rûpel 133, 134. Fadil Abdulwahid Ali: Ji Somer heya Tewratê, rûpel 154. Pirtûka Pîroz, Dema Kevin, Rêtiya Rastguhên Pêşîn 16, Ayet: 9-11, 21- 22.

Dr. Mehmûd Ebas

mamokurda@gmail.com



Pêşeroje Zimanê Kurdî

Gelek lêkolîn li ser zimanê kurdî hatine weşandin, pir ji wan istangiyên di navbere zimanê kultûrê de û zeravê li her hermekê şirovekirine, û hin lêkolîn bi gelek rexinê pêwîst hatine belavkirin li ser cidebûne kûr û fereh di navbere her car zeravê serekane de, bê goman, em bivin yan nevin ev estengiyê hane, di deme iro de dibine sedemne xûrt di jevbelekirine miletê kurd de, û bi taybet di navbere hêzên remiyar de, û wê bibine sedmên cidebûne ferehtir di navbere hermê Kurdistanê de di rojê werê de.

Iro cidebûneke din tê xuyakirin, di ber nakokiyê di navbera zeravê serkane de, û bi xûrtbûn û nezanî tê avakirin, bê kû rewşenbîr û lêkolvanin ziman li ser bixebitin de çareserîne jêre bibînin.

Cidebûne di navbere zimanê axivtine civakî de ji alîkî ve û zimanê li ser midiye û ê kultûrî ku tê pêkanîn, digihê ware kû pir cara kesên guhdar û xwendevan li axivtine di pirtûke de yan goterne de yan li ser tilvîzîone û kovarne de nagihîjin, ev nayê wê wetayê ku gerek nivîsker yan ji midiye zimanê dev ji pêşketine zimanê kultûrî berdê, ne ave daxwaziyê me!

Her wehe tê gotin, ku ev destpêke paqijkirne zimanê kurdî ye ji axivtîne cide, lê ji alîkî dîve em dibînin ku ev destpêke avakirine zimankê kultûriyê wê cidebê ji zimanê civakê û kolana û mala. Em dûr nabînin ku bibê wek zimanê Arebî .

Yek ji sedmê dîrketine zimanê kultûrî ji rêçe axivtine civakî, ku rewşenbîr û nivîskarên kurd rexnê li ser axivtine civakî kirine karekî neştûmanî, bê ku li ser sedem û sûcan karbikin. Dinava civaka rewşenbîr û remiyaran de welatparêzê hatiye girêdan û beyanî kirin bi kêmbûne axivtîne ne bi kurdî, Axivtine zimanekî bi kultûrî û welatparêzî hemberî hev tê danin!

Paqijkirne ziman di demeke ku binghên paqijkirne ne amadene, û bi vê rêçe wê ev grûp bi bine sûcliyê avakirne zimankê kultûrî hemberî zimankê civakî di nava miletê kurd de.

Ji problême cidebûne navbere zerave de, miletê kurd dikevê nava problêmen navbere cidebûne zimanê kultûrî û civakî de.

Di Kurdistanê de yek milete, yek ziman bû, lê gelek zerav in, û nihe wê bibin dû ziman, dinava her zeravekî de!

Gelo her kes vê problême di bîne, bi taybet rewşenbîr û nivîskarên li ser zimanê kurdî dixebitin?

Gelo wê ev diyalok û zimanê kultûrî wê bi bin zimanine ji hev cide?

Yan wê zimanekî Kurdî giramerî Kurdistanî derkevê ? û wê bibê zimanê kultûrî? û diyalok bimênin zimanê axivtine civakî, heremî?

Em di bînin ku bi demê re, bê karekî resenî ji aliyê hemû hêzê kultûrî û remiyarî ve, wê ev cidebûn ber fereh bibê, deme kû bimênê di bin rexnê ne şaşû ne dichê xwede.

Gereke li ser vê problême giran û kûr û fereh bêxebtandin

Karekî şoreşî jê re divê, ne kêmtir ji karê azadiyê welat




Rewşenbîrê keysebaz

Xinizîya pênuş û keysebazîya rewşenbîran ji xinizîya tivingan dijwartirin... Birîna kêrê rihet dibe, lê ya gotinê rihet nabe....

Nizar Yosif

Zehmetkêş ê de mê

Mihe med Şêxo (1948 – 1989)



Tomargeha Felek wekî hatî naskirin deriyê nanê Mihmed Şêxo û zarokên wî bî. Ez naxwazim gelekî vê mijarê şîrove bikim û li ser rawestim, dijmin mahane jê re di dîtin û çêdikirin, ew û xwedanê wê binçav kiribîn, bi wan kiraran di xwestin jiyane bi rengê tarî li ber çavên wî wêne bikin. Ji ber ku zoriyên rewşa Mihmed Şêxo yê aborî tevî bizavên wî ji bûna zelaliya çavê tavê bi rêya hunerê re ji pişt ewrên reştarî re li ser gelê kurd xuya bibe. Bi mêranî û dilêriyek bê hempa peyama xwe ya hunerî, bi niştiman perwerî bê tirs hildigirt û di weşand. Di bin hemî mercên dijwarî û astengiyên zordestiya dagirkiran de li berxwe dida, bi zîrekî bêy çavşikestin ew peyama dibire serî.

Vêca tirs zordest û mêtinkiran ji wî û peyama wî ya hunerî gelek bî, lewma dorpêçkirina vî kesî ji hemî aliyan ve ji wan re pêwîst bî, heta jiyana wî ya kesayet jî zor didanê. Bi birhên tund û astengiyên ku jê re çêdikirin di xwestin derfetên jiyana bûna wî tahl û bê noş bikin, van tiştan bi çêdikirina dîwaran li dorê û li pêşber, babê Felek netewandin sernimiz nekirin, nikarin peyama wî ya bêhadar jî jê serwinda bikin.

Li ber pêlên ba û bablîsokan ne dihejîya, ji pîroziya peyama hinerê netewî û rakirina wî barî ne reviya, di her gelî û evrazî ve di hilkişîya, di her bînekirinê de li ser rewşekî cuda di xwend û di lorand. Jiyana kesayetî û netewî di yek wêneyê hunerî de di hatin zimên:

Derdan çî ez diljar kirim ey felek

Edî nikar ez bi jimêrim bûn gelek

Barê xêzanî jî li min hîn ne bes

Serda ji pîsan re çî ez bûm henek

Lê herkesên vî hunermendî nas dikin bi taybet xelkên başorê rojava vê tiştê baş dizanên û pêy serwextin .

Çend caran ew kirinê hundirê zindanan? Çend caran penaber bûye? Çend caran koçber kirine? Çend caran rojane di çû li rex hêzên ewlekarî da ku ji wan re bêje ez hîna li Qamişlo me li virim? Çend caran tehin ji wan û ji ne mirovan xwariye û ziyane dîtiye? Her wisa çaxê ku li Îranê penaber di eynî rewşê re derbas bûye .

Lê mixabin caran hinekan di xwestin û di xwazin ji rol û bandora ku M.Şêxo di lehîst kêmbikin, yan jî ziyane bi gihêninê bi mebest yan jî ne bi mebest .

Em car caran di bihîzin di hevpeyvînên bi hunermend B. re (rêza min ji wî û hunerê wî re

heye) ku M. Şêxo bi sedema çapkirin û belav kirina kirina kasêta wî (zinara erebî) hatiye girtin û zindan kirin, heman demê de tomargeha wî tomargeha Felek qedexa biye û şima sor li deriyê wê dane, û xwedanê wê jî avêtin binê girtîgehê.

Pirs jî eve ma gelo di wan çil salên temenê ku derbas kirî de, wî çî rehetî û xweşiya jiyane dîtiye? Çend çax û deman bêy çavdêriya hêzên ewlkaran maye?

Mahane ji hertiştên wî di birin, ma pêdiviya girtina wî bi vê yekê maye .

Ew M.Şêxo dibin cihê wî yê berî çardeh salan ku tede sitem û serma û lêdan xwarî girtîxane ya hêzên ewlekarî (emin el dewle), destê wî û biya yê wî Beha Şêxo bi hevdû ve qeyd dikin û raserî pêpêlokên kûr û xerabe de wan serûbino di avêjin binê zindanê, M.Şêxo di ser wê pêpêloka şikestî û çalika di binde de di lukume di keve, ji birayê xwe Beha re di bêje evan sekbaban hîna ev pêpêloka şikestî çênekirine, ji berî çardeh salan jî dema ku ez girtim û anîm vî cihî dîse wesa bî.

Pirsa min û hezarên ku M.Şêxo nasdikirin heye, ma gelo ew çî stiranbêje yan jî kîjan hunermende di wê demê de di hundirê welêt de bihtir ji M.Şêxo bi stiranên xwe dijmin di tirsand û piştta wî kul di kir û berê miletê xwe dida azadiyê û serfraziyê? Ew di gelek qad û baxan de li ser gotinên bijartî rawestîya ye û lê çêriya ye gelek jê biriye û tihna wî ne şikandine, lê ne westiyaye her dîse jî pêyve hilpirikiye û vekola ye.

M.Şêxo qedexekirin û dîrpêçkirina zimanê kurdî ji hêla dagirkiran ve bi kirarên xwe yê hunerî ne dipejirandin, ji ber pêdiviya jînbûna wê bi her derfetî hewldan didan. Bi gotin û helbestên xweş û bedew teji wate û biwêjkirina wan bi awazên dewlemend meqam rengîn bi rêk û pêk bi dengê rewan di guhên guhdarvanan de datanî. Di bin mercên zehmet re derbas dibî, bi insiyatîfek mêranî ew pirên leq û davikên veşartî derbas dikirin, û xwestekên xwe bi afirênî bi hostayiyek saxlem di berheman de pêk di anîn.



Bandora xweşiya vî welatî, sirûşte û dîmenên deşt û çiyane sihra xwe lê bada bîn mîna bangorekî di ser qadên xwe re di gerandin. Ewî bi amadekariya xwe bi dengê xwe, xwe li welêt û nişteçiyên wî dabî pejirandin, lewma M.Şêxo bi kurdistanê tete naskirin bi netewê alavên wî tene xweyakirin bi niştiman pewrweriyê tete bi navkirin.

Bi kalînen Babê Felek re mirov bi kûrahiya eş û janên xelkên xwe di hise bi gotinên wî re mirov bi noşa xweşiya jiyana netewî pêjindar dibe. Bi hisreta azadiyê ewî dergehkek hunerî mezin li pêşiya gelê xwe vekir, da ku bi heskirin û evîn tere derbasî bexçeyên deşt û çiyayê welêt bibin.

M.Şêxo ji navê kurdistanê û hejêkirina xelkên wê nexşek çêkir, li xwe kir û ew tor li wan jî reşand. Ji tava vî welatî siha xwe ya hunerî bilind rada ser



mirovên wî, ew sihe li ser jan û derdên mirovavî û netewî bi xemgînî û bi şîret di xwîne. û bi merdî di lorîne. Bi dehan a ferînen dewlemend ji kaniva xwe va nemir rijandin, rê li ber guhdarên xwe vekirin, pir hunerhêz û xwedan talentan bi wî rêya xwe dîtin û bi wî pûnijîn, bûye serboriyek navlêdan bi rêz ji xelkê xwe re.

Hoseng Broka
hoshengbroka@hotmail.com

KURT
KURMANCI



„RASTIYA DAWÎ“ DEREW E!

Ya rast, rastî (bi taybetî rastiya filo sofîyane) „dawiyan“ nas nake .

Ne „rastiya dawî“ heye, ne jî „dawiya rastiye“.

Rastiya dawî, dawiya rastiye ye .

Werisê derwê kin e, lê werisê rastiye tun e

Dawiya rastiye, destpêka derwê ye .

Keys ji derwê re tê, ku dawî li rastiye tê .

Ya rast tenê guman e: Rêya rastiye a herî rast, guman e.

Rastiya bê guman, bixwe derweke mezin e.

Ne rastiya heta heta heye, ne jî derewa heta heta .

Kî rastiye bibe dawiye, ew dawiye li rastiye tîne.

Rastî, wekî ramanan, dimeşe, lê derew bi qasî dawiye sekinî ye .

Rastî, bi qasî erdê gurover e, lê derew, bi qasî xaniyekî, çargoşe ye .

Fîlosofên berê, bi taybetî Platon (428/427-348/437 b.z.) û idealistên li pey wî, wisa bawer dikirin ku „rastiye mezin“ tenê li asmanan dijîn. Li gorî idealizmê (Idealismus) û filozofên wê, tenê „asmanên mezin“ hêjayî „rastiye mezin“ in.

Lê ji Aristo (384-322 b.z.) û pê de, rastî û baweriya „filozofiyane“ bi wê jî, hate guhertinê. Bi mantiqê Aristo re, rastî hino-hino, ji asmanan daket erdê, û ji „aqilê“ Xwedê derbasî aqilê mirovan bû. Aristo berûvajî filozofên berî xwe, bawer dikir, ku „rastî bi mirovan re, li ser erdê, dijîn“ . Wate ne rastî bê mirov dibe, ne jî mirov bê rastî. Rastî ne ew e, ku li asmanan difire, belê ew e, ku li ser erdê dimeşe. Rastî ew e, ku ji mirov heta bi mirov e.

Bi „Genealogiya“ Nietzsche (1844-1900) re, rastî derbasî gumantirîn û herweha aloztirîn qonaxa xwe bû. Hemî „rastiye“ di destên Xwedê de, li ser destên Nietzsche, yeko yeko, hatin xwarê. Xwedê bixwe jî, li ser destên Nietzsche, di „rastiya“ xwe de hate xwerê. A rasttir, „rastiya“ Xwedê bi ser serê wî de, herifî û hate xwarê.

Di filozofiya modern de, mirov dikare Pirtûka Nietzsche a bi sernavê „genealogiya sincan“ (zur Genealogie der Moral, 1887), wek destpêka „rastiyeke nuh“ (yan jî rastiyeke modern), li qelem bide. Bi vê „genealogyê“ re, „Xwedê mir“ û hemî „rastiye wî“ bûn ciyên guman, lêpirsîn, lêkolan, şirovekirin û gengeşkirinê.

Nietzsche, bi gotina rexnegirê Fransî Emile Faguet (1847-1916) yek ji mezin tirîn wefadarên rastiye bû, Rastiya Nietzsche ew bû, ku wî çu rastî nasnedikirin (Fünf Vorreden zu fünf ungeschriebenen Büchern: über das Pathos der Wahrheit, 1872 & über Wahrheit und Lüge im außermoralischen Sinn, 1872), Nietzsche wek filozofekî rastiye, rastî di sînoran de, nas nedikir. „Rastiya“ wî, ne rastiyeke sînardar û rasterast, belê rastiyeke bê sînor û gurover bû.

Fîlosofê Fransî Gaston Bachelard (1884-1962) jî, rastî di guman û şaşiyê de, nas kir (rastiya zanistî şaşiyê, lê hatiye sererastkirinê). Lê rastiya Nietzsche, ji vê rastiya Bachelard jî wêdetir bû, Wî rastî ne tenê wek „şaşiyê sererastkirî“, belê wek „xeyalê“, ku nayê zefkirinê, li qelem da: „Rastî xeyal in“ / „Die Wahrheiten sind Illusionen“ (über Wahrheit und Lüge im außermoralischen Sinn, 1872).

Rastî, li gorî filozofiya Nietzsche, gerra heta heta a li dûv xeyalê ye: Rastî xeyal e, xeyal jî jixwe mehal e.

Mirov, li gorî Nietzsche, di bûneweriya xwe de, wek „heywanekî sivîl“, ji „rastiyan“ hez nake, lewre yan ew xwe di ser wan re çeng dike, yan jî ew wan marjînal dike û di ser guhên xwe re davêje:

Ev mirovê „rastî-nehez“ yan jî „dij-rastî“, du caran rastiye bi xeyalê dinixumîne û vedişêre; carekê bi aqilê xwe, ya din jî bi zimanê xwe. Mirovê ku ciyê basê ye, baznade nav rastiye, belê di ber re, di ser re, xwe çeng dike, yan jî ji ber bazdide.

Belkî ji ber vê rastiya bûneweriya mirovê „xeyaldost“ e, ku rastî ne şêrîn, lê tahl e; ne nêzik, lê dûr e; ne yek lê pirr e; ne xweşik lê kirêt e; ne sivik, lê giran e; ne sipî, lê belek e, ne zû lê dereng e; ne realîte lê xeyal e; ne jîwar lê arezû û xewn e; ne berdest lê hêvî ye.

Ne ji rastiye bawer bikin, ku ew dê dawiye li derwê bîne, ne jî ji derwê bawer bikin, ku ew dê dawiye li rastiye bîne.

Ne rastî dawiya derwê ye, ne jî derew dawiya rastiye ye .

Nebûna derwê, nebûna rastiye ye .

Nemana derwê, nemana rastiye ye .

Dawiya rastiye, destpêka derwê ye .

„Rastiya dawî“, derew e .

„Rastiya rastiye“, dereweke mezin e .

Beyar Robarî



Çima hin welatên Ereban, Fedêralî dibin û Sûriya NA?

Birastî gava mirov guhdariya rêkberiya (opozisy-ona) Sûrî, herdû beşan: Hemhengiya Niştîmanîya Surî birêberiya Ahmed Al-Cerbe û Saziya Ahengiya Niştîmanî birêberiya Hesên Abdul-Azîm û rêjîma Ased ya nijadperest û kujdar dike, seyr û metmayî dimîne.

Bitaybetî axiftin li ser mafê gelê Kurd li Rojavayê Kudistanê têkîrin û daxwaza fedêraliyê ji hela Kurdan ve .

Li gor piraniyê Ereban û herwisa Tirk û Farisan, ji maffî her netew û kêmneta wekî heye serbixwe bijî û çarenûsa xwe bixwe hilbijêre, lê bes tenê Kurd nabe wa mafa hebe!!

Bala xwe bidin dewleta Êmerat ya fedêralî, ji heft mîrşînan pêktê û hemî erebin û îslamin û zimanê wan yeke, tev wê jî welatek bi sistemek navendî avanekirin û her mîrşînekê jî wan mîrşînan parleman û hukmet û polis û al bûdcetek xwe cûda heye û karûbarê mîrşînê biserê xwe birêvedibin. Û hukmeta fedêral ji heft mîran pêktê û Şêx Xelîfa serokê dewletê ye . Jiber kû mîrşîna wî ji hemû mîrşînan mezintir û delementire, Ew ji sala 1971 yekan de ta roja hîro bêderd û kul bihevî dijîn û ti asteng li pêşîya wan derneket. Û wek em hemû dizanin û dibînin Êmerat welat pêşketî û geşepêdane li ser asta navnetewî .

Mînakek din ji welatên ereban Yemen. Yemen wek hûn hemî dizanin du dewletbûn û gor yek miletin û sala 1990'î bûn yek dewlet .

Û yekîtiya Yemenê birêkûpêkî birêve neçû û şerê navxwe derket holê û piştî şoreşê yemeniyên başûrî Yemenê aşkere daxwaza serxwebûnê kirin. Lê wek em zanin kongira diyalogê dinavbera yemeniyên de, berî heftakê biryar da kû Yemen bi dewletek fedêralî be û ji şeş herêman pêktê.

Ê gelo çima erebên Yemen û Êmerat, dibe dewletek fedêralî avabikin û gor yek netewekin û ji maffî Kurdan wek netewek serbixwe û cûda, tune daxwaza fedêraliyê bikin û mafê xweyî netewî û destûrî bistînin û biparêzin û bi aştiyane li gel Ereban bijîn??!!

Hin Ereban dibêjin em ditirsin Kurd, sibede daxwaza serxwebûnê bikin û Sûriyê perçebikin, A dibe Kurd piştî demekê va daxwazê bikin, çî li Sûriyê an li perçyên dinê Kudistanê. Ew jibîrdikin an dixwazin jibîrbikin, kû ev jî maffî kurdane. Ma kê gotî dive gelê Kurd herdem di bin destên netewên dindê bijî!!!

Li gor zagona navnetewî, ji maffî her netewekî heye serbixwe bijî û welatê wî hebe. Ev mafê çarenûsî zagona navedewletî rê dide her netewekî û diparêze .

Pêwîste hemû layenên rêkberiya (opozisyona) Sûrî û rêjîmê ve, aqilekî xwe ji ezmûneya Êmerat, Êraqê, Almaniya, Kanada û Siwîsra rakin û sîdakê jê bibînin.

Hengî Sûrî kanin biserkefin û ji va rewşa tede xelasbin û derkevin. Herwisa divê bizanibin bê çareserkirina pîrsa gelê Kurd li Rojavayê Kudistanê, kêşe û aloziya Sûriyê bidawî nabe.

Dr. Ehmed Xelîl

Wergêr: Heyder Omer



Kesayetiya kurdî Lêkolînên civaknasîn

Xelex - 13

MIROVBENDÎ Û COMERDIYA KESAYETIYA KURD



Êdolojiya dirind e:

Di dîroka mirovaniyê de gelek rastiyên eşdar hene, berztirînen wan ew e, ku birêveçûna mirov di jiyânê de yekeke nakokiyên e, her gava li şûnekê bi cih dibe, nakokiya tevayî ya berdewam dibe qedera wî ya herhe, ji neçare tevdigere, da hewceyên zikê xwe ji xwarin û vexwarinê bi dest xîne, hewceyên xwe yên seksî têr bike, û xwe ji dirindeyan biparêze, her weha mirov tevdigere, da li gel êkolojiyê li hev bike, û bi mirûzê wê yê bê tebat re li hev were. Ev nakokiya welê tevayî û berdewam jî her tim gav bi gav li gel têkoşîn û ked û azaran hevrê ye.

Xwezî ev sergêr tenê bi nakokiya hebûnê bihata sînorkirin, belê bi ser de jî pergala civakî eniya mirov dide hember awayekî nakokiyê ye din, ew jî nakokiya li ser erdnîgariyê ye, ku mebest jê destdanîna ser de vera herî pir xwarin û vexwarin e, ya ji bo xweparastinê hêja ye, xwedî hêditirîn mirûz û kêmtirîn dijayetî ye, ev mebest gewherê vî cûreyê nakokiyê ye.

Dema berbanga dîrokê hejmara mirovan hindik bû, û erdnîgariyê jî karîbû pêdiviyên wan pêk bîne, bi ser de jî pergala tevehî çanda (yek ji bo hemiyên û hemî ji bo yekî) afirandibû, pêre jî nakokî hindik bûn û badora wan kêmbû.

Lê gava mirov pir bûn, û komel bûn êl, û zevî û her pêdiviyên abora zevî, mîna pişeyên alîkar, hatin afirandin, û (zêdebûna berkar) û abora bazirganî diyar bûn, û (hizra destdanîna ser her tiştî) derkete holê, vê gavê rêbaza (yek ji bo hemiyên û hemî ji bo yekî) ji hev ket, û rêbaza (hemî ji bo yekî) pêşberî wê rabû, û ew ji şûna wê ya destlatdar di wijdana tevayî (komel) de têveda, pêre jî nakokî di hundir her civakê de tûjtir û hêzdartir bû, û her êlekê hewl da xwe, ku ya din ji ser riya xwe, bi awayê cînosaydê, an qewitandinê an koletiyê, ji pêş xwe têvede.

Û bi diyarbûna şaristanyê re di derdora çemên mezin de (Yang tisî, Xanc, Dicle û ferta, Nîl) û bi pêkhatina gelan û bajarên mezin re nakokî di hundir her civakê de gur bûn, û riya dijayetiya organîze û bi zagon standin, paşê jî bi ser civakên derdorê de herikî, û hizrên împeratorî derketin holê, û çand û polîtîkên dagîrkirinê jê de peyda bûn, û dewlet û mîrnîşînê sitemkar û kotekar diyar bûn, û ji bo dagîrkirina erdnîgariya gelên din, û dastanîna ser sermiyana wan, bi her awayî tevgeriyan.

Hizra împeratorî, wek ku nayê veşartin, di gewherê xwe de li ser tunekirina kesên din ra dibe, û wan kesana her tim wek dijmin, ne wek hevpişe, dibîne, û bi ser de jî sîbera êdolocîk ya ji bo pirojeya wê hêja ye, pêk tîne, heye (belkî) ew sîber ayînî (olî) be, û heye jî çêkirî be, û cemawer, çî bi dilê wan, û çî bi kotekiyê û zorê, dikşîne bin wê sîberê, mejiyê wan dişû, bi giyana dijminatîyê dadigire, û ji bo ku bidin ser gelên din amade dike, da erdnîgariya wan, tev xêr û bêr û rûçikên wê yên erdnîgarî polîtîkî bistînin, û gelan ji lêvegerên wan yên çandî û polîtîkî bê par bihêlin, ji ber ku lêvegerên gelan seriyê wan yê ramanbîr û wijdana wan ya zindî ye. Hizra împeratorî bi vî awayî pê de dihere, zorê li gelan dike, nasnameya wan dipişêfe, vîna wan pûç dike, ta wan dike çete û

û dûvik û berdest û kole. Belê... Di serdema hizrên împeratorî de bingeha nakokiyê hate guhertin, ji ber ku nema mirov bi lawir û hovan re rû bi rû dibe, ew lawirên, ku eger nîçira xwe girtin, heya careke din birçî nebin, venagerin hêrişê, û nema civak, tenê ji bo ku ji erdnîgariyê were bêparkirin, dibine armancên hêriş û dijminatîyê, belê vê gavê mirovanî bi dirindeyên êdolocîk yên rikdar re rû bi rû dibe, ew dirindeyên, ku bi ristên pîrgirêkî, çî nimûne bin û çî helwest bin, yên ku dijminatîyê zagon dikan, hatine perwerde kirin; ew ristên ku di bi saya pilankerên bê hempa û bi rêvebirîya zanayên behaneçêker, dijminatîyê bilind dinirxînin, û xwînrijînê pîroz dikan, û hêza şervaniya zorkar pêk tînin, û alaveke cengawer e bê dilovanî, dadimizirînin.

Belê... Ev yeka di birêveçûna nakokiyên de guhertineke diramatîkî ye mezin bû, lewre jî tiştê xweristî ew bû, ku li hember vê yekê, ristên nirxên gelên lawaz û zorbar jî bi kûranî werin guhertin, û lehengî û cangorî jî gewretirîn nirxên, ku pêwîstiya dîrokî diva kiribûn, ev her du nirx rêbazên giyanî bûn, ku gelên lawaz afirandin, da pê li pêşberî êdolociyên dirinde bi derkevin, û xweyîtiya xwe pê ji koletiyê û pişaftinê û wêrankirinê biparêzin.

Gelo, kî ne ewên pêşî, ku nirxên lehengiyê û cangoriyê di civakan de diyar û bercezt kirine (gewde kirine)? Ewana entilcênsiyayên resen in, belê... Entilcênsiya gelan, di gorepana dîrokê de, bi wêrekî derdikevin pêş hêzên dagîrkeran, çî bi serkevin çî na, ji ber ku, wek çawa metelokeke kurdî dibêje, (Rim di çewalan hil nayên), û wek çawa yekeke din dibêje, (Berf li sere tepelan / çiyên dibare). Tiştê giring ew e, ku entilcênsiya gelan her tim wek ku ew ew e, dimîne, ev yeka qedera wê ya dîrokî ye, û ji ber ew wusa ye, di di hişyariya komelî de dibe nimûneyên bilind, ku nîşên din hêz û vîna jê werdîgirin, da birêveçûna têkoşînê bidomînin.

Rûdawên çiyê:

Eger em bi awayê lezok li dîroka kurdî, ji pênc hezar sal û vir de, vegerin, ev lêveger dê rastiyeke ronak bide pêş me; ew jî ew e, ku hizra kurdî, bi gelemperî, ne yekeke împeratorî dagîrkerî ye, pêre jî kesên din tune nake, û ji behreya afirandina êdolociyên dirinde bê par e.

Ne tenê wusa, belê bi ser de jî, ev hizra wan pîrcaran pîrcaran hilgîrên xwe ber bi xwetunekirina ji bo kesên din de têve dide, bi ser ku Kurd, mîna pir gelên din, pîrcar bûbûne qurbana hizrên împertorî dagîrkerî, û nîçirên didanên êdolociyên dirind e. Me berê di rûpel û birên vê lêkolînê de, gelek nimûneyên vê yekê ber pêş kiribûn.

Bi gotineke din. Kurd neçareyî nakokiya dijwar bûbûn, da li dijî pirojeyên dagîrkirina hova e ya zorkar derkevin; ew pirojeyên ku hêzdartirînen çekên êdolocîk û cengewrî bi dest xistbûn, ew pirojeyên ku serkêşên wan bi bindestkirina

erdnîgariya kurdî, talankirina sermiyana kurdî, kedxwerina karînen mirovê kurd, û berdestkirina wî, da ji hêz bikeve, qayîl nedibûn, belê bi ser de jî, bi awayê rikdar, hewl didane xwe, da mirovê Kurd ji bîriya wî ya tevayî (komel) bê par bikin, û davan bidin pêş wî, da ji rehan de hilkin, ji nasnameyê vala bikin, bi nasnameyên havî dagirin, û (Kurdê pişaftî) çê kin.

Pisîkolojiya çiyê, di derya wê nakokiya sawdar de, parêzerê Kurd bû, tevî hin neyênîyan jî, ew li pêşberî êdolociyên dirinde, bi der ket. Belê... çiya di hişyariya tevayî ya mirovê Kurd de ra bû, û di wijdanên, ku bi ronîya tava Ahoramezda hatine şûştin, de bilind bû, û di viyanên, ku bi hişkiya latên Zagros û Agirî û Toros hatine perwedekirin, de bû ejdeha, û bi ronakiya bê hempa di kesayetiya entilcênsiya kurdî ya paqij re diyar bû, ewê entilcênsiyayê bi carekê nepejirand, ku ala radestkirinê, li pêş pirojeyên nizimkirinê û pişaftinê hilde, belê bi hêzdariya bê hempa pêşberî wan pirojeyan derket, û helwestên payebilind ên nemir di dîroka kurdî de, û sermiyaneke lehengî ya bi xwebêjeyên rûbirûtî û cangoriyê dagirîti ye, ji bo nîşan, bi şûn xwe de hêst.

Agahiyên ber fireh yên lehengiya pêşiyên Kurd beriya Îslamê, di destên me de peyda nabin, ji ber ku bi piranî dîroka wan hate sextekirin û hilweşandin û wendakirin, pêre jî tenê piçekî biçûk jê gihaye me, ew piçê biçûk jî di nav nivîsên împeratorên, ku dijminên kurd bûn, de belav bûne, bi çawaniya dilxawstina wan hatiyê nivîsîn. Ewana jî miqate bûn, ku serkrftinên xwe bipesinin û her tim bidin xuyakirin, ku ew serkeftî bûn, û rûçik û salixên kirêt û xêrnexwaz bi Kurd ve bizeliqînin, lewre jî carekê digotin, Kurd marên çiya ne, carekê digotin Kurd qijik in, û caran jî digotin, Kurd pîrcemok in, di şikeftan de dijîn, li pêş şahan û qiralan xwe ber didin ser çogan, piyên wan radimûsin, û bacê didine wan(1).

Lê ka li ser cûre û awayên pêşberiyê, ku pêşiyên Kurd li hember talanên împeratorî diyar kirine çî hatiye nivîsîn ? Çî li ser bervedêriya wan ya bê hempa ji bo welatê xwe hatiye nivîsîn? Çî li ser berxwedana wan li hember talankeran hatiye nivîsîn? Hema ne tiştê jî . Tiştê li vir tê pîrskirin ew e, eger vîna niştimanperwerî li ba pêşiyê Kurd neba, ma wê çawa karîbana li hember leşkêrên Akkad, Babil, Aşor û Hissiyên berxwe bidana? Eger ne çavbiçîk bana û vîna rûbirûtîyê û cangoriya neba, ma wê biryara berxwedanê bigirtana ? Ji hêla din de, çima qiralên Akkad, Babil û Aşoriyan ewqas li ser dubarekirina talankirina welatê pêşiyên Kurd daxifin ? Ma wateya vê yekê ne ew e, ku serkeftinên wan ne ewqas giran bûn, û pêşiyên kurd jî sernizmî û xweradestkirin nepejirandin, û her tim di çiyayên xwe yên parêzer de di nav şer û cengan de bûn?.

Tevî şikestina dewleta Med sala (550 b. z) jî, nirxên lehengiyên û cangoriyê di kesayetiya Kurd de rehên kûr berda bûn. Eger ne wusa be, ma çawa berxwedana Gotayê medî li hember Farisan di serdema Qembîz di sala (522 b. z) de wê bête

Têgihêştin ?(2). Çawa berxwedana rêberên Med; Firawurt, Heyzdane û Çeytiran Texme li hember Qiralê Faris Dara yê yekem sala (521 b. z) wê werin têgihêştin?(3). Û şoreşên, ku Kurd di serdemên îslamî de pê rabûne, dê çawa werin têgihêştin ? Ewan şoreşan ji serdema Omer Bin El-Xettab de dest pê kir, û di serdemên Umewiyan û Ebbasiyan de jî dom kirin, û ne Biweyhiyên Deylem, ne Silcoqên Tirk, ne şahên Sefewî û ne jî siltanên Osmaniyan, nikarin giyana têkoşînê û vîna rûbirûtiyê di hişyariya teva (komel) ya Kurd de bikuştana (4). Em dê niha hin helwestên lehengî, çi kevin û çi jî nû, berpêş bikin.

Helwestên hêzê û rûbirûtiyê:

* Sala (657 k / 1259 z) serdarê Mongol; Holako ji Ezirbeycanê de bi der ket, û Kurdistan talan kir, gelek Kurd li Xelat û çiyayên Hekarê kuştin, heya gîha Amedê û Cezîra Botan, û kurê xwe Yeşmot jî şand ku Farqînê dorpêç bike. Deverên bakurê Mûsilê jî, ji hêla erdnîgarî/polîtîkî de, deriyê herî stratejîk bû ji bo dagîrkirina welatên Şamê, gava ji Farqînê de nêzik bûn, şandek şandin ba qiral El-Kamêl El-Eyyobî, eger xwe radest bike, dê gelek hêviyan jê re pêk bînin, lê wî ev yeka nepejirand û got: *“Ez bi gotinên we yê hingivîn nayême xapandin, û ez ji leşkerê Mongol jî natirsim, ezê heya mirinê şûrê xwe bigrim û lêxim”*(5).

El-Melêk El-Kamêl rabû, giyana hêzê bi gelê xwe de ber da, û got: *“Ez çekûsiyê nakim, ezê zêr û ziv û her tiştê di mexezan de heye bidim we û her kesek hewcedarê çî be, bi ya Xweda, ez ne mîna Mustesêm (Xelifeyê Bexdê) koleyê dînar û dirhema (pere) me, ewê ku bi sedema çekûsiya xwe, serê xwe û Bexda jî da”*(6). Pêre jî hemî niştevanên bajêr bi ya qeralê xwe kirin, û berxwe dan, û lehengiya bê hempa li hember Mongola dane xuyakirin, dorpêçkirina bajêr jî demek pir dom kir, ta ku xwarin û vexwarin, bi dawî hat, û xelkê ji neçare goştê mirî, kûçik, pisîk û mişkan xwarin, û mirnişînên din jî nehatin hawara Farqînê, loma jî kete destên Mongolan.

Mongolan El-Melêk El-Kamêl radest kirin, û birin ba Holako yê ji wî gelekî kîndar bû, ew zor êşand, û paşê jî ferman da, ku wî perçe perçe bikin, her ku peçak ji gwedê wî dikirin, dixistên devê wî, heya ku mir(7).

* Basîl Nîkîtîn dibêje: *“Di dema hêrişê Hafîz Başa de, Begekî Kurd, ku hîn sî sal ji temenê xwe derbas nekiribû, û gelekî ciwan bû, hate dîlkin, gelek tişt jê re pêşkêş kirin, da hejmar û şûnên şervanên Kurd ji wan re diyar bike, lê gîş nepejirandin, û her digote wan: Ez begekî kurd im, naxwazim bibim serokê miletekî din. Hemî awayên kotekiyê, li dirêjiya du rojan, bi kêrî wan nebû, her ku lê didan, ewî hêdî hêdî qelûna xwe dikşand, Hafîz başa roja sêyem ew xiste beroşeke (sîtil) zeyta qelî, ew jî wusa çavbiçik ma heya jiyana xwe ji dest da”*(8).

* Şêx Seîdê Palo di 75 saliya xwe de şoreşa sala (1925 z) bi rê ve bir, carekê ji caran, gurûpek leşkerên Tirk xwe di nav dehlekê de, li ba çiyayê Pîreşînê veşart, ku rê li ber şoreşgeran bigire, gava şoreşger nêzik bûn, leşkêrên Tirk ji nişka ve agir bi ser wan de ber dan, hinek cangorî bûn, û hinek jî birîndar bûn, û yê pêşî vejeriyan, û tevlihevî kete nav wan. Hesen Hişyar dibêje: *“Wê hingê, gava Şêx Seîd gîha cî, û tiştê bûye dît, gote me: Çi bi we hatiye?! Ma hûn di ber xwe ve narin, hûn ji hember Mehmedîkan (nasnavê leşkerê tirk e) bi şûn de vedigerin?! Ji ser hespê xwe peya bû, tiving ji milên perwerdekarê hespan; ku yekekî çerhes bû,*

bir, berik bi gewdeyê xwe yê lawaz ve girêdan, şaşika xwe li newqa xwe gerand, û ber bi şûna leşkerên Tirk de çû. Gava şoreşgeran ev dîmen û helwesta Şêxî dîtîn, bi coş bûn, û weke şêran, û bi mêrainya yekta ber bi pêş de çûn, gelek leşker kuştin, û yê mayîn jî dîl kirin”(9).

* Di şoreşa sala (1925 z) de, Qasim Axa (Kurdê Zaze bû) birîndar bû, û dîl hate girtin, serleşkerê Tirk Elî Heyder bû, ewî ava qelî bi ser Qesim Axa de dikir, didan û neynûkên dest û piyên wî bi kelpedanê hil dikirin, xekek hesnî, bi êgir germ û sor dikir, û datan ser sîngê wî, û tinazî pê dikir, digotê: *“Çi bi te hat Qaso”?* Qasim Axa lê vedigeran: *“Heydo, ev kirên te ne yê mirova ne, belê yê bêjiya ne, ev rewşa ku tê de me, heye (belkî) were serê her mêrê rasteqî. Êdî ka çî awa û alavên kotekiyê hene, hemiyana bi kar bîne”.* Paşê li qantirekê siwar kirin û li gundan gerandin, gava ji mirinê ve nêzik bû, ji ser piştê qantirê danîn, û Elî Heyder ferman da leşkeran, ku wî kevir bikin, ta ku koma keviran li ser wî lod bû, lê wî jî her tim sixêf ji Elî heyder û serokê wî Mistefa Kemal re digotin”(10).

* Piştî têkçûna şoreşa sala (1925 z) Tirkan gelek şoreşger dane ber dadgeha serxwebûnê (îstîqlal) li Amedê, bervedêr (abokat) Mihemd Efendî jî di nav wan de bû, ewî nepejirand, ku bervedêriya xwe bi zimanê tirkî, belê bi zimanê kurdî pêşkêş bike, û lehengî û xweragirtina yekta di dadgehê de diyar kir. Dadgehê biryara sêdarkirina wî girt, ewî li ser textê sêdarkirinê bang kir û got: (bi jî Kurdistan), pêre jî leşkerên Tirk dane ser wî, gewdeyê wî bi sîngiyan, beriya sêdarkirinê, perçe perçe kirin(11).

* Piştî têkçûna şoreşa sala (1925 z) serdarê şoreşê; Şêx Seîd hate dîlkin, ew dane ber dadgeha serxwebûnê li Amedê, civata dawî bi vî awayî derbas bû:

Pirs: Şêxê rêzdar, tu dikarî li xwe mukur netê, ku te dest bi vê şoreşê kirî yî?

Bersiv: Çima û ji bo çî ezê bêjim: Na? ez jî wek hemî kesên, ku berê pê ra bûne, û wê pê ra bin jî me, ez wek hemî serdarên Kurda, bi vê şoresê ra bûm.

P. Mebesta te ji buhêrekê û dûhatuwê çî ye?

B. Mebesta min ew e, ku hinek ji berî min ji bo van mafan ra bûn, û hinekên din jî wê ra bin, ta ku bi dest dixin, vê lomê hûn min li vir dibînin.

P. Ji ber ku tu Şêxekî navsalî, û zanayekî misilmanî, gelo xwînrijîna misilmanan destûrî ye (rast e)?

B. Hûn li mafên me mukur natên, çima hûn mertala ol hildigirin? Kurd mafên xwe yê polîtîkî û mirovan e dixwazin, hûn jî wan cînosayd û ser jêkirinê teva (komel) dikin. Em ji bo bervedêriya xwe şer dikin, lê hûn wek dagîrkeran şer dikin.

P. Çima hin hevalên te li tawana ser wan mukur natên?

B. Heye (belkî) ewana ji we ditirsin, û li mafên xwe yê rewa mukur natên, lê divê mirov ji dadgeha dîrokê û gel bitirse.

P. Çima te û hevalên te, we bi awayên dîplomat, mafên xwe nexwastin?

B. Leşkerên me neçûn Anadolê, lê we leşkerên xwe bi ser me de şandin, we serjêkirin bi kar anî, zarok û jin kuştin, we di peymanê Lozanê de awanbazî bi me û bi mafên me kir, vê lomê me

weha dît, ku maf nayêne dan, lê têne standin.

P. Bersivên te didine xuyakirin, ku ji bo kirên kuştinê û tawanan tu neyî poşmanî?

B. Kesên aza ji riya serbilindî û rûmetê poşman nebûne û venegerîne, ku ez jî poşman bibin û jê vegerim.

Biryara dadgehê: Li gor mukurhatinên we, biryara dadgehê ew e, ku tu û (48) hevalên te yê tawanbar, werin sêdarkirin, tiştê, ku hûn pê diramîn û mijûl dibûn; ango serxwebûna Kurd û Kurdistanê, hûn dê li ser sêdarê, gava kendir li qirikên we geriya, bibînin.

Şêx Seîd: Eger hûn niha me sêdar bikin û bikujin, hûn dikarin, lê divê hûn baş zanibin, ku hûn nikarin miletekî bi tevayî sêdrar bikin, û riyê li pêş doza wî bigirin. Ev xwîna me dê ala azadiyê bixemilîne. Bi jî lehengên Kurd(12).

* Piştî şikestina komara Mehabad sala (1947 z) Mela Mistefa Barzanî biryar girt, ku here Sovyetistanê, hevalên xwe (500 şervan) civand, û gote wan: *„Gelî biraderan, ez ber bi carenûsa nepenî de diherim, nizanim, ez dê ji biçûbûna, lê ji sermê, lê bi berikeke dijminan bimirim, li gor rewşa me, mirin nêziktirin texmîn e, Xweda ji dijminan hêzdartir û mezintir e, min jî xwe avête bextê wî û rûbirûtiyê pejirand. Her kesê, ku nikare xwe ragire, dikare vegere“.* Kesek ji nav refê hevalan bi der neket, û hemiyana jî yekdeng bersiv dan, ku wê pêre bimînin, û mirinê di ser jiyane re bigirin(13).

* Piştî derbasbûna Sovyetistanê, gava gîha Azerbeycanê, berpîrsiyarê Azerî; Cefer Baqerov hewl da xwe, ku Mela Mistefa Barzanî bixe bin destlata xwe, Baqerov jî li ba şalyarê kar û barê hundir yê serdema Stalîn, bi rûmet bû. Carekê Baqerofî gef û gur dane Mela Mistefa, da pêşniyarên wî bipejirîne, eger neke, wê encam ne baş bin, Mela Mistefa gote wî: *„Hevalê Baqerov, em nehatine vir, da ku tu gef û guran bidî me, eger em ji gef û guran bitirsîyana, te ez li vir nedidîtim, em hatin Sovyetistanê da em dengê gelê sitambar; ew jî gelê Kurdistanê ye, bi gelên Sovyetistanê bidin bihêstin, rûmeta xwe û ya gelê xwe biparêzin. Tikaya min ew e, ku zanibî em ti caran serên xwe ji gef û guran re danînin, û bi carekê em napejirînin, ku bibin destekê gelekî, ku ji gelê me ne çêtir e, tevî ew gela, wek çawa gelê Azerbeycanê, dost û birayê me be jî. Em gelê serbixwe ne, ne parek ji gelê Azerbeycanê ne, em wendakirina kesayetiya Kurd napejirînin“*(14).

Nimûneyên qurbanîyê û cangoriyê:

* Di 27ê meha pûşberê sala (1925 z) de destlata Tirkan Şêx Seîd û (48) hevalên wî ji serdarên şoreşê sêdar kirin. Gelo ewana çî helwest li ser textê ser textê sêdarê diyar kirin? Hesen Hişyar bi bir tîne, ku pêşî Elî Can, bê ku rûdawên tirsê û tevliheviyê lê xuya bibin, diyar bû, helbesteke coşan e, ya Mela yê Cizîrî xwend, paşê jî serheng Mihemed Xelîl Xeto; serdarê hêla Farto, tev simbelên xwe yê sawdar, diyar bû, gava gîha kêlek girtiyan, got: *„Ey gelî birayan, ez bi vê kira, ku niha bervê diçin gelek bextewr im, ji mirinê natirsim, tiştê ku me kir, ji bo rûmetê û gel û welat bû, di van kêlikên dîrokî de, em dê bigihên hevalên , ku beriya me cangorî bûne, vaye ez kolosê xwe radestî we dikim, wek emanetekê li ba we dihêlim, ew zîmbola Kurd û rûmeta wan e, tirsî min ew e, ku ji serê min bikeve bin sêdarê, û*

leşkerên Tirkên pêlêkin" (15).

Paşê Şêx Seîd diyar bû, gava dît, ku hevalên girtî şîndar in, got: „Ey gelî biraderên xwoşewîst, divê hûn zanibin, ku hûn hemî, biçûk û mezinên we, pîroz in, gelê me bi mirina me namîre, lê dê rîya azadî û serxwebûnê veke, divê hûn careke din zanibin û bawer bikin, ku dara azadiyê bi xwîna me tête avdan, em û hemî têkoşer û leheng ji vê xaka rewader ketin, û dê ji me re bimîne, rehên me tê de ne, û hûn, di pey me re, ji bo gelê me palpişt û bingeh in" (16).

Destlata Tirk (49) sêdar li pehnavê sêdarkirinê amade kiribûn, efser û leşker civiya bûn, li wî dîmenî sêr dikirin, gurûpa muzûka leşkerî jî surûda netewa Tirk distirand, general Mirsal başa li ser kursiyê rûniştibû, û Şêx Seîd jî, berbenkîrî li kêlekê bû. Bendên wî vekirin û gotê: Vaye ji te re ev pênuş, tu çi dixwazî binivîs, da wek bîranîneke payedar li ba min bimîne.

Şêx Seîd lê veregeran û gotê: Gotina te ne rast e, tu bîranîneke ji min naxwazî, belê tu dixwazî zanibî, ka ez li hember kênîra sêdarê jêhatî me yan na? Û destên min dikarin di vê pergale de binivîsin yan na?. Lê belê kesê, ku şoreşekê bi rê ve dibe, her tim nîrên wusa di bîriya wî de ne, û pergale wusa jî her tim li ber çawa ne.

Şêx Seîd pênuş girt û nivîsî: “Dilên sitemkaran û dagîrkeran reş e, heş û wijdana wan ji sinçan û mirovaniyê bê par in, bila hûn bizanibin, ku hûn nikarin her û her li hember daxwazên gelê min ra bin, û hûn dê sitemê li gelê xwe jî bikin, gava tola van kirên we were hildan. Ê me, me serdemê nû ji gelê xwe re ragihand” (17).

* Piştî têkçûna şoreşa bakurê Kurdistanê sala (1936-1938 z), û piştî dadgeheke formolî serkêşê şoreşê; Seyyid Rîza, kurên wî û hin serok-êlên Kurd hatin sêdarkirin. Beriya ku Seyyid Rîza hilkişe ser textê sêdarê, kire qîrî û got: “Ez gihame heftê û pênc salan, vaye di vî temenî de tev li cangoriyên Kurdistanê dibim, bivê nevé xortên kurd dê tola me hilînin. Bijî netewa Kurd, bijî Kurdistan” (18).

* Li Rohilatê Kurdistanê, di 22ê çileyê paşîn de sala (1946 z) komara Mehabad ra bû, û di heman salê de, meha çileyê pêşîn, bû qurbana berjewendiyên politîk yê Sovyetistan û Îngilîzayê û Emerîkayê û şikest, serokê wê pêşewa Qazî Mihemed nexwast bireve, destlata Îranê biryara sêdarkirina wî girt, û berbangar roja 31ê adara sala (1947 z) ew birin ser textê sêdarkirinê. Li pêş stûnê sêdarê kire qîrîn û got: “Hûn dikarin min sêdar bikin, lê belê her Kurdek Qazî Mihemed e, çi kurdek vê sitemê ji bîr nake” (19).

* Di 18ê pûşbera sala (1947 z) hin şoreşgerên kurd di girtîgeha Bexdê de hatin sêdarkirin.

Efser Mistefa Xoşnav jî di nav wan de bû, ewî berî sêdarkirinê got: Ey sêdarkarên sitemkar, gotina min bigihênin serokên xwe, ev xwîna me wenda nabe, kurên gelê min yê sax li jiyana dimînin, dizanin çawa tola me hilînin, mebejin, ku hûn min bi stûnên sêdarê ditirsînin, ev biryara sitemkarê dê min hilde asta lehengên gelê min, yê cangorî, û hûn nikarin bizanibin, ka ez çiqas bextewer im, ku jiyana xwe ji bo bextewerî û azadiya gelê xwe didim” (20).

Ji bo kesên din:

Heye (belkî) ew belgeyên jorîn bidine xuyakirin, ku lehengî û giyana cangewerî ya Kurd tenê ji bo

Kurda bûn, lê rastî berevajî vê yekê ye.

Di dîroka roavayê Asiyayê de gelek belge hene, diçespînin, ku giyana cangewerî ya Kurd di gelek helwestên ku li gel şoreşên Kurd ne têkildar bûn, rû dane. Ez dê li vir tenê du belgeyan; yek ji dîroka kevn e û ya din ji dîroka nû ye, berbiçav bikim:

* Belgeya yekem, Ibin El-Esîr, ji ber bûyerên sala (558 k / 1163 z) werdigire, ewî jî di hêrişê, ku Ewropîyan (xaçeperstan) ji nişka ve dabûn ser leşkergeha siltan Nûr El-Dîn El-Zenkî, li nêzîk bajarê Himsê yê Sûriyê, de rû daye. Wê hingê, ne ji lehengiya siwarekî Kurd ba, siltan dê bihata kuştin. Ibin El-Esîr dibêje: “Di vê salê de Nûr El-Dîn Mehmûd Bin El-Zenkî li jêr keleha Kurd, ji ber Ewropîyan reviya, ev bûyer bi navê El-Buqeyet tê naskirin. Sedema vê yekê jî ew bû, ku Nûr El-Dîn leşkerê xwe da ser hev, û kete nav welatê (deverên) Ewropîyan, û li jêr keleha Kurd, li cihekî navê wî El-Buqeyet e, li jêr keleha Kurd, ew dorpêç kir, û xwast berê xwe bide Terablîsê û wê jî dorpêç bike, gava ku xelk nîvro di bin konên xwe de bûn, dîtî ku xaçên xaçeperstan ji nişka ve ji paş çiyayê ku keleh li ser e, de bi derketin, çimkê xaçeperst li hev civiya bûn, û li hev kiribûn, ku ji nişkav ve bi roj bidin ser misilmanan, ji ber ku ewana bawer nakin, kes di wê demê de bide ser wan.....heya ewana nêzîkî misilmanan nebûn, misilman bi wan haydar nebûn, lê gava nêzîk bûn, û misilmanan ew dîtî û tev geruyan, ku wan bi şûn de vegehin, lê nikaribûn. Wê hingê kesek şandin ba Nûr El-Dîn, da wî bi vê yekê haydar bikin, lê xaçeperstan bi zor da ser wan, ewan jî nikaribûn, û vegehiyan leşkergeha misilmanan, û xaçeperstan dida pey wan, hemî pev re gihan leşkerê El-Nûrî. Ji ber nebûna derfetê, misilmanan nikaribûn xwe bigihênin hespan û çekan, xaçeperst gihan wan û gelek kes kuştin û dîkîrin.... û ber bi konê Nûr El-Dîn de çûn, ew jî li hespê xwe siwar bûbû, ku baz de, lê bi lez siwar bûbû, û hesp jî hîn bengkirî bû, hema kesekî Kurd peya bû, û bendên hesp biriyar, Nûr El-Dîn çû felatê, û ew siwarê kurd jî hate kuştin. Paşê Nûr El-Dîn zar û zîçên wî bi awayê berdewam perû kirin” (21).

Gelo, ma ev helwesta wî siwarê Kurd ne balkêş e? Wê hingê hemî kesên Nûr El-Dîn û parêzerên wî jî tev bi xwe mijûl bûn, ji kuştinê reviyar, lê wî siwarê Kurd xwe da ber kuştinê, giyana xwe kire qurbana siltanê. Ma ewî nizanibû, ku eger ji ser hespê xwe peya bibe, dê were kuştin? Belê... dizanibû, lê nikaribû nirxên cangoriyê, ku di kesayetiyê wî de reh kûr berdane, bi paş guhên xwe de bavêtan.

* Belgeya duwem jî ew e, ku generalê firansî Kleber, li Qahîreyê sala (1800 z) bi destên Silêmanê Helebî hate kuştin. Silêman kurê Mihemed Emîn ji gundê Kokanê ye, ev gund li Devera Efrînê (Çiyayê Kurmênc) dikeve. Bi paşnavê (El-Helebî) navdar bûye, ji ber li bajarê Helebê mezin bûye, bavê wî bazirganiya zeytê dikir. Di dema nakokiyên Îngilîzayê û Firansayê de ji bo dagîrkirina Rohilatê, Napoleon Bonaparte sala (1798 z) Misir dagîr kir, û sala (1800 z) general Kleber xiste şûna xwe û vegehiya Firansayê.

Destladdariya welatên Şamê û Misirê wê hingê di dest dewleta Osmanîyan de bû, ewê jî da ser Misirê, da Firansiyar jê bi derxîne, lê nikaribû xwe li hember Kleber ragirta, Paşayê dewleta Osmanî ferman da waliyên welatê Şamê, da Kleber bikujin,

ewana jî ev yeka xistin destên Silêman El-Helebî, yê ku sê salan li zangowa El-Ezher xwendibû, û du caran jî hec kiribû. Silêman çû Qahîreyê, û Kleber di baxçeyê seraya wî de kuşt, ew jî hate girtin, û biryara kuştina wî bi xazûqê hate girtin, lê piştî ku destê wî yê rastê were sotin, û paşê jî ji perendeyan re were hêştin. Biryara kuştina wî roja 17ê pûşbera sala (1800 z) qediya, û ew jî wê hingê bîst û çar salî bû (22).


Çawaniya, ku kesên din nîçira Kurd dikirin, ji bo pirojeyên xwe bi wan pêk bînin, ne kar û barê vê lêkolîna me ye, belê lêkolîneke taybet jê re divê. Tiştê giring ew e, ku em bizanibin, waliyên Osmanîyan ji hêla têgihêştina kesayetiyê Kurd de şareza bûn, û zanibûn, ku eger kesê Kurdê bawermendê hizrekê be, bi awayê çosa bê hempa xwe dide kêlek wê ramanê, û amade ye ku xwîn û giyana xwe di ber de bide, vê lomê xortekî din ji deverên împêretoriya fireh bala wan nekişand, belê ewana xortê Kurd vebjart, ewê ku li El-Ezher bi hizra olî hatiye têrkirin, û berî bîst û çar saliyê du caran ji bo hecê çûye Mekkeyê. Ma wê çawa xwe nede pêş, piştî ku amadebûna ji bo cangoriya şingirtî û çosa ayînî Ezherî di kesayetiyê xwe tev li hev kirin?

Jêder û çavkanî:

- (1) Fadil Ebdil Wahêd Elî: Ji Somer ta Tewratê / Mîn Somer îla El-Tewrat, rû 101-103. Mihemed Beyyomî Mehran: Dîroka Îraqê ya Kevin / Tarîx El-Îraq El-Qedîm, rû 348. Harî Sagîz: Gewrebûna Aşor / Ezemet Aşor, rû 176.
- (2) Hêrodt: Dîroka (Tarîx) Hêrodot, rû 249, 253, 254.
- (3) Eyakonov: Med, rû 407, 410, 440.
- (4) Ibin Xeldon: Dîroka (Tarîx) Ibin Xeldon 4/982, 5/67, 5/ 430, 6/418, 729. Ibin El-Esîr: Dîroka tewaw / El-Kamêl fî El-Tarîx, 5/331-333. Hesên Şimêsanî: Bajarê (Medînet) Mardîn, rû 76. Husên Qasim El-Ezîz: Babekî /El-Babekîyye, rû 146, 308.
- (5) El-Hezanî: Komkarê dîrokan (Camêi El-Tewarîx), 1/319-320.
- (6) El-Hemezanî: Jêdera berê, 1/320.
- (7) El-Hemezanî: Jêdera berê, 1/321-324.
- (8) Basîl Nîkîtîn: Kurd, rû 140. Biner: Mînoriskî, Kurd, rû 65.
- (9) Hesên Hîşyar: Bîranînen şervanekî, rû 4.
- (10) Zinar Sîlopî: Ji bo Kurdistan / Fî sebîl Kurdistan, rû 115. Hesên Hîşyar: Jêdera berê, rû 6.
- (11) Zinar Sîlopî: Jêdera berê, rû 72, 120-122.
- (12) Hesên Hîşyar: Jêdera berê, rû 7. Biner: Zinar Sîlopî: Jêdera berê, rû 123.
- (13) Mesûd Barzanî: Barzanî û tevgera rizgarîxwaza kurdî (El-Barzanî we El-Hereke El-Teherruriyye El-Kurdiyye), 1/245.
- (14) Mesûd Barzanî: Jêdera berê, 1/261.
- (15) Hesên Hîşyar: Jêdera berê, rû 6.
- (16) Jêder û rûpela berê.
- (17) Jêder û rûpela berê.
- (18) Zinar Sîlopî: Jêdera berê, rû 208.
- (19) Zinar Sîlopî: Jêdera berê, rû 248. Mesûd Barzanî: Jêdera berê, 1/226.
- (20) Zinar Sîlopî: Jêdera berê, rû 249.
- (21) Ibin El-Esîr: Jêdera berê, 11/294-295.
- (22) El-Cebertî: Dîroka susretên bermayîyan di jînenîgariyan û nûçeyan de (Tarîx ecayêbe El-Asar we El-Exbar), 2/358 – 390. El-Zîrekî: Ferhenga zanayan (Mucem El-Elam), 3/133.

Ebdulbaqî Huseynî

zanin88@hotmail.com

Ji ferhenga jinên kurd (xeleka 7)**Keça Kurd (Emîna Omer Mahmûd)****Nivîskar û helbestvan**

Emîna Omer Mehmûd an jî (Keça kurd) wekû hatiye nasîn, yek ji jinên kurdên rojavayî Kurdistanê, ên herî navdare di warê tore û çanda kurdî de, Keça kurd di destpêka xwe de, di navbera (1970-1980) de karekî siyasî mezin kir, paş re dest binivîsandina helbestan kir, û herwiha di warê wergerandina ji zimanê erebî bo kurdî sê pirtûk wergerandin, dido ji wan ên mêrê wê (Mihemedê Mele Ehmed) bûn, ku kirin zimanê kurdî digel ku hîn nedabûn çapê (destnivîsbûn).

Keça Kurd di sala 1975 şîkir (zewicî) û pênc zarok ji mêrê xwe Mihemedê Mele Ehmed anîn, û li Qamişlo diman, lê jiber sedemin dijar ji alî rêjîma Sûrî, neçar man, ku ji welat koçbikin û berên xwe bidin Europa, dawî li Elmaniya di sala 1987 de bi cîbûn.

Kuretjiyana Keça kurd ji roja ji dayikbûnê ta ku ji welat koçkir Europa, ewê bi destê xwe ji min re nivîsandbû, da ku ez di pirtûka xwe de a binavê (Ferhenga jina kurd) belavbikim. Lijêr hûnê çîroka Keça Kurd nasbikin, ligel pirtûkên ku belvîkirine .

Lê berî wê hez dikim bêjim, ku piştî koçkir Elmaniya lebata wê hin caran di kongerên rewşenbîran de û herwiha di kongerên siyasî medaran de hebû, malperek wêyî internêtê jî hebû lê ana nemaye, hin helbest û gotar di destpêka sala 2000 de di malperên kurdî de belavdikirin, lê vê dawiyê û bi taybet piştî mirina mêrê wê, bêdeng ma. bi hêviya ku tenderûstiya wê baş be, û vegere dana xweyî toreyî.

Jiyana Keça Kurd:

Ji berî ez ji diya xwe re çêbibim, sê zarokên diya min hebûn (du kur û keçek), yek li peyê di mirin, vêca dema ez çêbûm, dê û bavê min gelek hez ji min kirin, nemaze bavê min, ewî min di hembêza xwe de xwedî kir.

Bavê min xwendevanê Quranê bû, ji lewra hîn ez çar salî bûm, li ser destên wî ez hînî xwendina Quranê bûm û eva ha li ber çavên mirovên gund gelek mezin bû, ji lewra ez bibûm çîroka civatên wan, wan, û destpêkirin pîrekên gundê (Xerbe

çuhûwa) xewnên ku li ser min didîtin ji xalê min mele Silêman re digotin, û yek ji wan xewnan digotin; pîrekekê dîtîye, "ku ez di derfeyekî ve derbasî gora pêxember bûme, û wî, ango pêxember tîfkiyê ser zimanê min", û li gor bîr û baweriyên gundiya, ku ev rastîyeke û tozîk li ser nîne û vê yekê hiştîye ez weha jîr û jêhatî bim.

Li ser mûsiqa xewnên pîrekan, şevêkê ez di xew ve çûm û li ser çengê xewnekê siwar dibûm û min dît, ku ez li esmanê herî bilind û bi penca xwe ez hewrên sipî dixum . Sipêdê min ji dê û bavê xwe re xewna xwe got û wan jî ji xalê min re got. Xalê min li gora zanîna melatîya xwe a wê serdemê şîrûvekîr û digot, ku nav û dengê min bilind û belav dibe, an jî kurekî qenc û hêja ji min re çêdibe.

Li nêzîk sala 1950an bavê min mala me guheste (Girkê Xelo), ta sala 1956 me ji wir jî barkir, li encamê şer û dubendîya ku li gund hebû,.. em çûne gundê (A'brê), li wê çaxê du xuh û du birayên min hebûn jî û dîsa şêraniya min di ser ya hemiyar re bû, û bavê min hej min dîkir û gelekî guh dida min, nemaze piştî ku di civata xortên dîmuqrat re xebatîr û hişê wî li ser kêşa wî vebû û bibû mirîdê rêça welatperwerî ye.

Bavê min gelek jê re mereq bû, ku ez biçim dibistanê, mixabin ku dibistan li gund nebû, û çaxa ku bavê min birayê min (Emran) rêkir gundê (Tokil) da ku li dibistanê bixwêne, dilê wî li ser min diçiqçiqî, lê ji ber ku ez keçik bûm ez rênêkirim.

Birayê min Emran derbasî polê çaran bû, ji nû gundiyan kara dibistanê kirin, û li payîza 1961an jorek ji bo dibistanê avakirin û mamostayek ji gundê (Tel Şeîrê) anîn û li hevhatin, ku ders bide zarokên gund û li havîna peyre serê zarokê du teneke genim bidinê.

Dema dibistan vebû ez û birayê xwe Emran her yek ji me tenekeyek ligel xwe bir ji bo em li ser rûnin. Dema ku mamosta jîrbûna min dît, ez jî li rex Emranê bira danîm, min jî polê çara xwend, û ji wî gundî em çar yan jî pêncbûn yên ku me polê çara dixwend û ez ya jîr bûm di nav wan de.

Li gundê (A'brê) û li hemî deverên di tevgereke nehîni xurt hebû, lê min tiştêk jê nedizanî, ta ku ez hînî xwedina kurdî bûm li ser destê kurxalê min (Derwêşê mele Silêman) .

Di biçûkaniya xwe de min gelek hez çîrokan dîkir û ji dilbijokê xwendina çîroka Mem û Zîna (Nûredîn), min xwest ez bi kurdî bixwênim, lê gava ez hînbûm min hez helbesta kurdî kir û li gundê (Abrê) min li destpêkê bavê xwe fêrkir û paşê gundiyan Abrê ji wan kesan E'lêwîyê Silo, Helîma Cemîl, Kirhê Saliho, ku evên ha li temenê bavê min bûn, û li bîra min tê ku carekê min şeqamek (zileh) li Kirho da, ji ber ku ders nezanî bixwêne.

Her şev di civata bavê xwe de min helbestên Cegerxwîn û yên Hezîn min dixwendin . Sala 1957an li navbera gundê (Abrê û Alaqosê) ji rexê

(Tolik) ve Newroza pêşî me kir û li wê rûniştinê de bavê min ji civatê xwest ku sûndbixun ji rêça xebatê xwe nedin paş, û di vê Newrozê de ku ya pêşî bû jî, pîreka kurd havpişkî têdekir û ji wan Diya min (Helîma Cemîl), ez û herdû xuhên min ku em biçûkbûn û her di wê Newrozê de carekî min bi gotina helbestan ahenga wan xweşdikir, ji ber ku ji min pêve kes helbest nedizanîn û li xwendina kurdî ne serbestbûn.

Dema ez û birayê xwe Emran em gihane polê heftan bavê min mal guheste bajarê Qamişlo, û ji nû ez gurbûme xebatê û di nav bajarê Qamişlo de şev û roj ez digeram û tevgera min tenha ji bo hişyarkirina pîreka kurd bû... Ji ber ku ez li gelek malan digereham û ewan ez di rêya xebatê de naskiribûm, ji lewra ji min re digotin Kecika kurd û paşê ez bûm (Keça Kurd).

Li Qamişlo min serpereştîya Newroza pîrekê dîkir û li bîra min tê; salek di serdaba (Mihemedê Eliyê Ūnis) de me Newroz çêkir û dema ez li ser dîroka Eleqemşê peyivîm û paşê helbestek ya hezîn ku li ser Eleqemşê bû, bi awazek xemgîn min got, hemî pîrekên ku li wirbûn, girîn.

Sala 1970 li kongirê niştîmanî yê ku li Kurdistanê Başûr li ser kurdên Sûriyê çêbû ez amade bûm .

Li sala 1971 min bekelorya sitand û paşê ez çûme bajarê Silêmanîyê û li zangoya wê min beşê ziman û toreya kurdî xwend, û ez di xwendina xwe de pêşketîbûm û ji ber jîrbûna min serokê beşê kurdî ku Dr. Kemal Fuad bû, soz dabû min ku di rêka Yekîtiya Sovyêt de ezê dektora bixwênim. Min polê sisêyan dixwend, li sala 1974an roja 11 avdarê me ji Silêmanî bazda, piştî ku tanqan (dibaban) zangoya Silêmanî dagîrkirin .

Li Cuwrta ligel yekîtiya afretanî Kurdistan ez rûniştim, meha avdarê hemû bi berfû baran derbasbû, û li encamê vê barana xurt xanîyek bi ser çend kesan de ket û du mamosta dibin de mirin Destpêka nîsanê bi şev û dibin baranê de em ji Cuwarta derketin sih-cil mirov bihtirê wan zarok û pîrekbûn û çend pêşmergeyên çekdar jî ligel me hebûn,.. piştî şev û rojek em gihane Nawet, li wir jî çend rojek em man, paşê ez û çend pîrek bi siwarî sê pêşmergan bi mere ber bi Qeladizê em çûn. Rêyek sext û hemî çiya, heft sa'etan (demjimêran) li ser piştî dewarê di nav çemekî re em diçûn, li bîr min tê li nav wî çemî ligel D.K .Fuad û hevalên wî, em pêrgî hev hatin, û paşê bi hev re li gundek û her li yek mal em bûne mêvan. Ev gundê ha li nav serê çiya bû, xelkê gund ji me re gotin ku tucar bajar nedîtine .

Li bîr min tê em di nav pez re hilkişiyane jor û dema em rûniştin û bi hev re axivîn û bi navê dektor meb akir, deng bi gund ket û çend ne xwesek ji Dektorên mer anîn, bi rastî helwestek



Dijwar bû, lê ji mecbûrî ve her yek li nav çeltikê xwe gereha çend core berikên zikêşê yan serêşê bi wan dan û xwe ji wan riz garkirin .

Em gihan Qeledizê çend rojek ez li wê nivistim ta roja 24 nîsanê ku ji êvarê de firoke hatibû , çend carek weha bi nivzî di ser bajêr ve diçûn û dih atin.

Sipêdê ji berî rojhelat ez ji bajêr derketim, lê em ji bajêr dûr neketibûn, dengê teqîn berdûmanê ket guhê mede, li vê rêbwarê jî dektor Kemal Fûad û çend kesên di ligel min bûn.

Dempîv heşt û nîv bi dema ku em gihane nav Pirdan û ji nû min jiyana metirsî dît, di hemberî tarîşevêk tirsînak û dilkovan de li derya firmêskan de ez noqbibûm, di vê berdûmanê de gelek şehîd bûn, û ji şehîdan sê hevalên min yên ku bi min re dixwendin, û ta saxim ez hevalên xwe (Azad, Heme Salih û Hîwa) jibîr nakim. Ez li Derbend li mala Mihemedê Kejê dimam, û vî mirovê hêja gelek ji min hez dikir û ji keça xwe bihtir guh dida min û ez bi wan re çûm Îranê, li kongeha Şino de û hinek li Xanê jî em man, wê dema ku ez li Derbend bûm çûn û hatina min li mala hêja Hejar û Sebrî Botanî jî bû, herweha Êzga dengê Kurdistan peywendî bi min re kirin û çend car bi Xelefê Zêbarî re ez çûm avahiya êzgê û çend gotarek bi zimanê kurdî tê de xwend û cara pêşî weku li bîra min tê kurê Enwer Elmaî ez di êzgê de pêşkêşkirim û dibê ku çend malîkek ji helbestek ya wî bû cara pêşî min xwend.

Meha yazdehan ji sala 1974, ez ji Gelala derketim û min biryardabû ku ez vegerim Sûriyê, li Sersing li mala Hiznîyê Haco em bûne mêvan û şevêk ez li wê derê nivistim û roja dî em gihane sînore Tirkîya li nêzik Zaxo, lê ji berî ez bigehim Sersingê şevêk li nav pêşmerge de li sînore anya şer em bi pêşmerge re weha rûniştî bê xew ez mam û min guhdarî çîrokên lehengî û bergirîya wan dikir û çiqas civata wan bi min xweş û şêrîn bû.

Şevêk li nêzik Amêdîyê di kavoliya gundekî bê pirgal û birçî de em bûne mêvan, û gelek bi dijwarî şîveke bê nan ji mer peydakirin û ji gotinên xwedîyê malê ku berpirsiyarê gundbû di hate xuyakirin ku ji beriya mehekê ve wan ardê nan nedîtine û nexwarine.

Em gihane ser sînore Tirkî ji Zaxo nedûrbû, li mala berpirsiyarê deverê em bûne mêvan û ewî gelek ji min re xweşkir û qedir da min û gazind ji Mele Mistefayê Hilêliyê kir, ji ber ku Mele Mistefa û hevalên li Nawpirdan xwe ji min dizîbûn da ez bi wan re nebim heval (bîr li wê kiribûn ku ez nekarim dijwariya rê hilgirim), şevêk sînore Îraq û Tirkîye me birî û di ser ava mezin re û li ser derfa em derbasbûn, Mele Mistefayê Hilêliyê, Ehmedê Hisên hevalê Mele Mistefa, ji Kurdistana Tirkîbû, Ebdilwehabê biraziyê Mihemedê Kejê û pismamek wan ji Şingalê, li pey rêberêk dido em birêketin.

Di nav çiya re û li ser rêçek teng re em diçûn û ez bi gavin sivik û li li pêşya Mele Mistefa bi sed gavî em diçûn û li ser kevira em dirûniştin, vêca Ehmedê Hisên mirovekî henekçî û xeber xweşbû, dostanîyek xurt li navbera min û wî de çêbû, digot; Birazî ezê Mele Mistefa bi gorî te bikim, kula mezin ku ew bi te re nedehat,...

Ber destê sibêhê bû em gihane nêzik deşta Silûpya,

li şikevtekê em rûniştin, û rêberê me çû gund û piştî bihekî pîrekekê taştê ji me re anî, birastî ew care pêşbû ez wê xwarinê dixum, ji ard û av û rûn çêkiribûn.

Em gihane rêyek û li terembêlekê em siwarbûn, em çûne Silopya, li malekê me bihna xwe vekir û paşê em li terembêlê siwarbûn di Cizîra Botan re em derbasbûn û me berê xwe da Nisêbinê . Dema em ji Silopya derketin û ji min re gotin ku di Cizîrê ve em diçin, ez gelek dilxweşbûm, û yekser bi asmanê Mem û Zîna Ehmedê Xanî ve bilindbûm û di nav xweşiya Cizîra wê serdef de windabûm, lê sed mixabin ku ti pê neçû bi dîwarê sahîkî rastîyê ve ez şemitim û bi ser xemên xwe de ketim,... xwezî min ev Cizîr nedîtiba mistek ji tehlîşka bîndestî bû min vexwar û bi dilekî şikestî dîwarên nivzî Cizîrê di nav toza terembêlê de bi şûn xwe de me hiştin.

Şevêk em li Nisêbinê nivistin û roja peyre roj nîv ro, me di nav bûmba re sînore Sûriyê birî .

Li sala 1984an dema darbesta seydayê Cegerxwîn gîha bajarê Qamişlo û ew xwe pêşandana mezin û ew dengê migrefon û dengê marşa xort û keçan, bi tîrêjên rojê serbestî re xwe berdane derûnê min ji kokê ez rahejam û her li nav ahenga pêşwazî de, li ser tevna helbestek seretayî û gelek sokar, ji bo seyda min li nav meyjê xwe diçin û ji wê rojê ve ez helbest dinivîsim û di warê wergerandinê de jî ez kardikim û berhemên min çend pirtûkin.

Berhemên Keça Kurd:

1. **Çîrokne helbijarî (Ezîz Nesîn).** Keça Kurd ew ji zimanê erebî wergerandiye zîamnê kurdî, pirtûk heft çîrokên kurt digel sê pêşgotinan himbêz dike, Pêşgotina yekê derbarî dîroka zimanê kurdî ye, û herdu pêşgotinên di derbarî jiyana Ezîz Nesîn in. ev pirtûk di sala 1990 li Beyrûtê hatiye çapkirin, û ji 102 rûpelan têhev.

2. **Xoybûn (Mihemedê Mele Ehmed).** Keça Kurd ev pirtûk ji zimanê erebî wergerandiye zîamnê kurdî, û di sala 1993an de hatiye çapkirin. Ev pirtûk ji weşanên Kovara Zanîna (jimar 7) ku li Qamişlo (Rojavayî Kurdistan) belavdibû, Pirtûk dîrokîye, çêla damezrandina komela Xoybûn dike, ku di nav salên (1927-1946) de pêkhat .

3. **Pêwendiyên Kurd û Ermenîyan (Mihemedê Mele Ehmed).** Keça Kurd ev pirtûk jî ji zimanê erebî wergerandiye zîamnê kurdî, û di sala 1994an de li Şamê hatiye çapkirin, Ev pirtûk ji weşanên Kovara Zanîna (jimar 8) ku li Qamişlo (Rojavayî Kurdistan) belavdibû. Pirtûk dîrokîye, çêla peywendiyên di navbera kurd û Ermenan de, di dawîya sedsala nozdan de, dema ku Komela Xoybûn bi alîkariya Partiya Taşnaqê çêbû, Ev pirtûk hîn erebiya wê li çapê neketiye.

4. **Qesara min,** berhevoeke helbestiye, dora 21 helbestê himbêz dike, hin ji wan helbestan nûjenin, û hin kilasîkin, pirtûk di sala 1996an de li Beyrûtê, Libnanê hatiye çapkirin.


5. **Kopê qurbanî,** berhevoeke helbestiye, dora 19 helbestan himbêz dike, hemî ji helbestên aza ne, Pirtûk di sala 1996an de li Beyrûtê, Libnanê hatiye çapkirin.

Eve ligel bi dehên gotaran û çîrokên ku di kovarên kurdî de belavdikir, mîna berhemên wê di kovara Gurzek Gul û Kovara Zanîna de,...

Di warê zîman de jî du nivîsandinê wê hene..lê hîn li çapê nedane.

1. **Nêr û Mê di kurdî de**

2. **Bingehê gotina kurdî.**



Sala 1971,... Şanoyek hate pêşkêşkirin ji bo lihevhatina Avdarê

Ezîz ê Cewo

“AWIREK JI DERVA”

PÊVA JOYÊN ROJHILATA NAVÎN Û
PIRSGIRÊKA KURDÎ BI ÇAVÊ ZANYARÊ RÛS- Xelek (2)

Lê hê di Silopîyê da, her çiqas wî berî sînora ala Kurdistanê hebû, leşkerên ser sînora ên tirk (dibe ku ji tirsê cezayê hebsê) digotin, ku hîç Kurdistanek jî nîne...

...Dem hatye guhartin, û îro gelek îdêya fêdêrasyonê tirk û kurdan govtûgo dikin. Pêwendiyên di navbera kurd û tirkan da, ji herdu alîyan va jî, ewçendî ne xweşbînî bûn, ku hê çend sal berê tenê hinekên “ronîbûyî” dikaribûn di derbarê vê da bi dengê bilind biaxivin. Helbet, ew rûpel hê nahatye wergerandin: dema di Meclîsa Tirkîyayê da parlamenterên kurd daxuyanîyan bi zimanê kurdî didin, ên tirk wisa didin xuyan, ku ew “zimanê nenas” ténagihîjin. Lê Leyla Zana di dema xwe da ji bo gaveke wisa bi girtina deh salan hate cezakirin û dema dirêj di hebsê da ma... Rewş tê guhartin. Kurdîstana Tirkîyayê hêdî, lê êdî demê xwe yê rastîn ê kurdî werdigire. Tenê bobelîskeke siyasî dikare vê pêvajoyê paşva vegeîne.

Kurdên hemû parçeyên Kurdîstana dîrokî bi aktîvî hevkarîyê dikin. Hersê parçeyên xaka Kurdistanê, yên ku piştî tîkçûna desthilatdarîya akkoyûnlûyan û peyra jî tîkçûna sefewîyan a di şerê Çaldîranê da (sala 1514-an, sala 2014-an dê 500 slên wê tujî dibin) ketine bin desthilatdarîya osmanîyan, lê naha jî di nav dewletên cuda da ne, jinûva berbi hev dilivin, ji ber ku ew herêm bi awayekî dinê nikare pêşbikeve, eger rêyên xwe yên çûnûhatinê, yên ku demekê parçeyekî Rêya hevirmuş a mezin bûne, ji nûva venekin. Hemû Kurdistan, a ku îro pîvanên xwe yên nevt û gazê werdigire, ew di sêrî da tranzîta nevtê û gazê ye, tranzîta cîguhastina baran e ji welatên dinê, ji ber ku di wê rêyê ra ji Asîya Navîn û Çîna dûr û derez derbirina eşîyan berbi bazara cihanî va dikişê...

Kurd ketine rewşeke wisa, ku divê ji bo xwe rêyekê hilbijêrin. Ewana bi dehsalan, hema-hema di tevahîya dewra XX da ji bo serxwebûna xwe şerkirine, helbet ji bo wê demê ew rêyê rast bû (wê demê ew wisa bû), ji bo jîyanê hêja tenê ew rê hebû. Lê naha rewş hatye guhartin... Stîla jîyanê hatye guhartin, nivşên nû digihîjin, çanda rojavayî diherike Kurdistanê, ya ku êdî bûye beşekî govêka global a cihanê. Bi xwezayî xakên dinê yên Kurdîstana dîrokî dîsa bi jîyana berê ya bêpergal û

kevneşopî dijîn, ya ku ji jîyana Kurdîstana Îraqê pir cuda dibe... Cudahî hene, û divê mirov çavê xwe li ser wan negire.

Pirs dertê olê: divê mirov çî bike? Bi vê serxweş bibe, hemû derfetên xwe, yên ku çarenûsê dane, dayne ser masê, ji bo ku bi hêz û hewldanan rewşê di parçeyên dinê yên Kurdistanê da biguhêre, an bi serê xwe bi pêşva here, bi wê hîvîyê, ku pirsgirêkên parçeyên dinê yên Kurdistanê dê bi rêya dîrokî ya xwezayî û bi alîkarîya Hewlêrê ya bi pîvan çareser bibin? Ev ne pirsêke abstrakt e, evê êdî pirsê konkret datînin: Mesûd Barzanî divê di Dîyarbekirê da, ya ku bi hinek wateyan va xakeke “bi siyasî bîyanî” ye, bi axavtin derê pêş?

Ma ne, di heman demê da gelek kurdên Tirkîyayê tenê ji bo wê, ku wan bi kurdî axivî ne, di hebsan da ne, heya eger ew ji bo wê hatibin girtin, ku mafên xwe yên axavtina bi kurdî bi çek parastibin jî, lê partîya ku derdorê sîh salî tîkoşîna çekdarî meşandîye, neçar e, çîyayên Qendîlê biterikîne (?!– E. C.). Mesûd Barzanî çî bi dest dixê, çî winda dike, dema bi serekwezîrê Tirkîyayê ra di Dîyarbekirê da bi axavtin dertê pêşya gel? Ev hilbijartin e.

Ma ne, mirov dikare pirsê bi şêwazekî dinê dayne: rêya nevtê avabike, bi vekirî Erdoxan rexne neke, yan Erdoxan rexne bike û derfeta avakirina rêya nevtê ya kurdî winda bike, ya ku dê-fakto berbi serbxweşîya êkonomîk a Kurdistanê va dibe? Çawa bike, kîjan destî bibire?

Di dema xwe da Lênîn... ji bo ku desthilatdarîya sovêtî xwe bigire û ser pêyan bimîne, nekeve, manêvre kir, tiştên nebînayî û bêhempa pêk anîn (dibe ku, bi hêza “weke hesin berk”): Aştîya Brêstê pêk anî, bi destê dijmin va beşekî pir berfireh ê xakên Rûsîyayê berda. Bandora encamên wan di pîrsa Rûsîyayê û Ûkraînayê da em hê jî, heya roja îroyîn hîs dikin; sazîkirina Komara Rojhilata Dûr (bi armanca tamponê), ya ku divê xakên Rûsîyayê yên bingehîn ji Japonîyayê biparastana. Eva gavana ji hêla gelek siyasîmederan va bêwate tînin. Heya naha, dema êdî aştî heye, ne ku ji bo gavên weha, heya ji bo ramanên weha, gotinên bi zarkî an ên di întêrnêta da, di Rûsîyayê da dê zûtîrekê bi qanûnî wek sûc bê dîtin...

Lê di Kurdîstana Îraqê da, ji bo wê, ger mirov bibêje, ku wê bi taktîkî û stratêjî bêhtir rast bûya, eger her parçeyekî Kurdistanê bi rêya xwe da biçûna, hê bi qanûnî ne gunehkarî ye, her çiqas, ez bi bawer im, hinek kurdên sergerm dê qanûna di derbarê wê da hema îro bicîh banyana. Em bibêjin, derencamên Aştîya Brêstê wê demê çî jî hebûne, ewê piraniya Rûsîyayê rizgar kirye. Bi gotinek a dinê, dîroka çareseriyên siyasî didin

xuyan, ku mirov ji bo xatirê rizgarkirina tevahîya giştî, dikare dest ji beşekî wê berde jî.

Lê heya, eger di Hewlêrê da biryar bihata girtana, ku pêwîst e hemû derfetên bikarbinin, ku Kurdistanê bigihînin hev, wê demê dîrok (=piraktîka pêwendiyên navnetewî ya êro) ne ku tenê destûrê nade, ku hinek ji nû va bi destê zorê împêratorîyan saz bikin, lê wisa jî beşên welatekî yên bi êtnîkî yek bigihînin hev. Hewlêr nikare Dîyarbekirê bigihîne xwe, lê, wek ku rewş dide xuyanê, ew heya nikare rayê xwe li serokên Rojavayê Kurdistanê jî ferz bike, yên ku di tengasîyê da ne. Mirov dikare di vê rewşê da çî bike?

Eger li ser rêvebirîya Kurdîstana Îraqê siyasî mederekî weke Ocalan bûya, rewş dibe ku cuda bûya. Wê demê wê Hewlêrê bicêribanda û heya rayê xwe li “ewên li ser ya xwe” ferz bikira... Helbet, eger Mesûd Barzanî ji vir û pêva jî rêya çareserîkirina pirsgirêkên Kurdistanê di nava çarçevê berjewendiyên Rojhilata Navîn da “berjewendiyên wê yên herêmî” bişopîne, lê ne ku tîkoşînê ji bo “berjewendiyên kurdan ên giştî bimeşîne, di çavê kurdên beşên Kurdistanê yên derî Îraqê da dê ji wî siyasîmederî ra bide der, ê ku berjewendiyên kurdan ên giştî dide ser plana yekem. Heyf, kîjan rê çî encaman jî tîne, bila bîne, ewê wisa be. Êdî naha tîra xwe kurd hene, bi bingehîn jî li derveyî welêt ..., yên ku dibêjin, ku Mesûd Barzanî her tenê serokê Kurdîstana Başûr e, lê Abdullah Ocalan serokê hemû kurdan e. Ew wana li dijberî hev datînin, her çiqas ew du destên bedenekê ne. Lê dîrok biryara xwe, ne ku bi gotinên mirovan dide, lê bi karên rayedaran. Serokê serkevtî ew e, yê ku gelê xwe dihêvîne, ji bo pêşkevtinê rê li ber wî vedike, ji bo xurtbûna wî mercan diafirîne. Li ser wê rêyê mirov dikare rê û rêbazên cuda bikar bîne, hê kesekî biryar nedaye bibêje, ku mafên gel ên serhildanê nînin, lê hinek tişt her di hinek mercan da dikarin baş bin.

Her tişt di dema xwe da. Ka gelo îro çî dem e, ewê jî her kurd û serokên wan dikarin bibêjin.

Ji dûrva tê xuyanê, ku di rewşa navnetewî ya îroyîn da Kurdistan bi giştî bi rêyên aştyane dikare zêdetirîn mafan destbixe. Serok û rêberên her parçeyekî Kurdistanê di parçeyê xwe da dikarin bigihîjin gelek tiştan, her yek di warê xwe da, li ku ji wan her yekî va dîyar e, ka mirov dikare çî manêvre bike, ji çî dest bikişîne û bi çî rîsk bike, ew çiqasî dikare hêvîya xwe bide ser piştgirîya kurdên herêma xwe. Hevkrîya serokên parçeyên Kurdistanê yên cuda, divê wan bi hêz bike, ne ku barê wan giran bike. Ji Hewlêrê an ji Îmraliyê rewşa Qamuşlûyê cuda tê xuyanê, û herdu dîtin jî ji ya rastîn cuda dibin. Û ewlehîya hîç kesekî jî nîne, ku wê şaşîyan neke, lê

serkevtina îro gelek daran dikare bibe sedema tîkçûna sibehê. Û kesek nikare bibêje, ku yê hanê ne rast e. Lezkirina koordînekirina ji demê zûtir û bêpîvan a gavavêtinên parçeyên Kurdistanê yêncuda, avakirina biryargeheke navendî ya tevgera kurdî, her çiqas jî “înternatsîonalîzma kurdî” ya weha bi siyasî kardar bê xuyan, ji bo dîtina ya sereke, û ji wê jî bêhtir, dîtina serokekî giştî yê tevgera netewî, - ew hemû îro dikare tenê zîyanê bigihîne karê kurdan, nehêle, ku ew derê li ser wê astê, ya ku êdî di pêşeroja nêzik da wê wî karî pêkbîne û kurdan bi xwe wisa bihêz bike, ku kesek nikaribe wana tîk bibe”.

* * *

...Li ser pêwendiyên Tirkîyayê û Başûrê Kurdistanê, aliyên wan pêwendîyan ên erênî û neyînî, ewleyî û rîskên wan, pîrsgirêka kurdî û Erdoxan...

Di gotara xwe ya “Kurd di siyaseta Erdoxan da û rîskên tirkî yê Kurdistanê Îraqê” da Makarênko balê dikişîne ser van pêwendîyan û li ser eger, pêrspektîv û rîskên wan pêwendîyan radiweste:

“...Îro Tirkîya ji bo Kurdistanê Îraqê di nav tîkîliyên nevt û gazê yê Bexdayê ra wisa jî paş-enîya lojîstîkî û pencereyek e berbi cîhanê va ye, ji ber ku her tişt, yan hema-hema her tişt, li ser Tirkîyayê ra tê vir...

Ya terefê Tirkîyayê, ez dibêjim, berjewendiyên wan ên girîng ên matêriyalî hene, helbet, ew bêhtir yêndemdirêj in. Ew hêviyên wan ên li ser kan û rêsûrsên Kurdistanê yêncuda finansî ne, yêncuda li ser “neftedollarên” wê, yêncuda ku dê roj bi roj bikevin xizmeta pêşkevtinên Kurdistanê. Û li vir jî qunîyên nevtê yêncuda nû vedibin û dikevin kar.

Di nav pêwendiyên di navbera Hewlêrê û Bexdayê da dema rastiyê dê wê demê pêra digihîje, dema hilberîna nevtê di Kurdistanê da weke para Kurdistanê ya di byûcêya fêdêral da bibe. Ev jî ji hemû dahatînyên ji fîrotana nevtê Îraqê divê berevbibe. Ev yak jî dikare êdî piştî du salan pêk bê. Dibe ku wê demê jî Hewlêrê gavekê jî berbi xweserîya êkonomîkî ya ji navenda fêdêral va bavêje. Ew jî êdî naha dê-faktu heye. Ji ber hinek egeran ev hê xweserîya tam nîne: yek ji wan sedeman jî ew e, ku Kurdistan di fîrotana nevtê da ne serbixwe ye, ew ji navê Îraqê wê difroşe. Lê ew rewş wisa demek a dirêj nikare bidome: ew war divê ji bin destê Bexdayê bê deranîn. Ya here baş, dê hatînyên ji gumrikê ji wê ra bimînin.

Her çiqas êksporta neftê mezin bibe jî, dê nikaribin hemû hatînyên ji fîrotana wê bikin nav pêşveçûna Kurdistanê: herêm biçûk e. Êdî naha ji bo wê tîkoşînek diçe, ka ew dirav dê li ku bîne parastin. Eger ew navgîn di bankên Tirkîyayê da bîncuda parastin, ewê bikaribe bibe bîncuda fîransî ji bo serdema nû ya pêşveçûna darayî ya Tirkîyayê, dibe ku wisa jî ji bo berfirehkirina bandora wê di cîhana tirkî da. Heşmendîya împêratorî ya nêo-osmanî, îslamî yan tîstekî dinê – xercne mezin dixwaze. Û ewê wana ji ku bîne, eger çavkanîyên dewlemendîya xwezayî, “ya bê heq” tunebin. Girîngîya pêwendiyên bi Kurdistanê Îraqê ra ji bo Tirkîyayê êdî îro tê hîskirin, piştî salekê-duyan ewê êdî bi prînsîpî li ser asteke dinê be.

Berjewendiyên kurdên Îraqê ne zêde mezin in. Di sêrî da divê ew bikaribin, di tîkoşîna li dijî şarezahî û zîrekîya navendîkar a Nûrî El-Malîkî da xwe ragirin, heya wê demê berxwe bidin, ta sazîya dewletê ya fêdêral, ew a ku ji hêla Mîrtîyên Ereban ên Yekgirtî va êdî hatye pejirandin, di Îraqê da jî bê naskirin. Evê bibûya çareserîya pîrsgirêkê ya îdealî, û bi wê pêwendiyên bi Tirkîyayê ra wê bijartebûna xwe ya bi rîsk wîncuda bikira. Pîrsgirêk di wê da ye, ku mirov nikare tê derxe, ka ewê kengê pêk bê.

Mirov di derbarê pêkanebûna wan hêviyan da gelek tiştan dikare piştî hilbijartinên Parlamênta Îraqê yêncuda sala 2014-an bibêje, mirov divê benda vê demê bimîne, û di vê rewşê da jî pencereya hewastandinê ya rîal tenê Tirkîya ye. Helbet mirov dikare hêvi bike, ku, dibe ku, bikaribe fêdêratsîona tirk û kurdan pêk bê, lê bi vê ra wisa jî, kurdê di wê da parçeyê asta duyemîn bin. Ev jî dîtinek a pêşerojê ya cuda ye, bi bîngêncuda jî ji ber pêwendiyên di navbera kurdan bi xwe da.

Ji ber wê jî, vê demê hewce nake, ku mirov li ser wê bi cidî biaxive. Ji bo kurdên Îraqê ya ku şûna Tirkîyayê bigire, ew bi xwe dîsa Îraq e, ya ku dikaribû bibûya fêdêratsîona rîal. Ew fêdêratsîon, a ku di destûra bîngêncuda a sala 2005-an da hatye pejirandin, û kurdan jî dê bikaribûna tavîyên (mewzîyên) girîng êncuda êkonomîkî di Îraqê da bigirtana... Lê Destûra bîngêncuda vê demê tenê li ser kaxezê dimîne.

Îro pêwendiyên tirk û kurdan, yêncuda ku alternatîva xwe nîncuda, ji bo herdu terefan jî bi rîsk in. Kurdistanê Îraqê roj bi roj di warê êkonomîkê da giranîya xwe mezin dike, ji hêla ewlekariya êkonomîkî va bêhtir bi egerên derva va tê girêdan. Êdî jizûva divê Hewlêrê pîrs danya, ka heya kîjan astê, bêyî ku ji bo pêwendiyên êkonomîkî garantîyên xurt hebin, ewê bikeve nava stîla jîyanê ya nû. Ma ne, eger ew tîk here, û “pencereya tirkî” ji ber hinek sedeman bê girtin, heya eger ew ji bo demek a kurt be jî, ewê Kurdistanê bike xewa hingorê.

Garantîya ast û cûreyên naha ya pêwendîyan, yêncuda ku bi şewazî gelekî ji pêwendiyên bi herêmeke weletekî dinê ra zêdetir in, tenê serekwezîr Erdoxan bi xwe ye. Lê rewşa wî bi xwe di welêt da ewqasî jî bi hêvi nîncuda, ji bo ku mirov bikaribe tenê li ser bîngêncuda wê pêkerê (faktor) siyaseteke girîng avabike. Wisa jî Komara Tirkîyayê bi saya hewldanên wî zû tê guhartin, bi biryar ji rêdûr dikeve, ya ku Kemal Atatürk dabû pêşya wê. Heya pîrs ne di wê da ye, ku îslam di Komarê da dibe xwedî giranîyek a mezin û girîng, a ku, bi rastî, êdî bengizê (dême) Tirkîya îroyîncuda diguhêre.

Ya sereke di wê da ye, ku paradoksa siyasî, ya ku piştî bisînorkirina desthilatdariya leşkeran derket holê û rê li pêşya AKP vekir û ew anî ser text, bi zû derbaz dibe û dibe roja bihurî. Ew ne bê tîkoşîncuda diçe. Wek ku hem krîzîsa Parka Gezî, hem jî ew skandala bertîlxurîyê ya astên here bilind didin xuyan, ku hemû li dijî Erdoxan bi xwe ye, û ewê nikaribe wisa hêsan wan bitemirîne.

Bi sedemên cuda otoratîzma serekwezîr roj bi roj

bilindtir dibe, ew jî wê demê, dema ew dixwaze bibe serekkomar. Ji bo ku hem jî bi dê-yûrê desthilatdariya kesî ya sîyasî bike destê xwe, ya ku divê desthilatdariya serekkomar di komara serekkomarî da bide wî. Lêbelê ewê ji bo Erdoxan her tenê wê demê watedar be, dema ew bibe serekkomar. Û dengê kurdên Tirkîyayê hema ji bo vê wî pêwîst in, yêncuda ku dema hilbijartinên meclîsê yêncuda derbazbûyî jî alîkarî dan wî, û ewî pîranîya dengêncuda stand.

Lê ew desteka ji aliyê wan herêman va ye, yêncuda ku ji hêla sotsîalî va paşdamayî ne. Ji hêla sîyasî va ew naskirina faktora kurdî ye, ne ku bi rêya “ewropîkirina” Tirkîyayê va (mafên mirov, mafên kêmanîyan, dêmokrasî), lê bi rêya “osmanîkirina” wê va (naskirina beşên civakê yêncuda çînî û herêmî), û ev jî hîç jî hema tişt nîncuda. Rewşa heşmendîya girseya hilbijêncuda a kurdan di Tirkîyayê da wisa ye, ku ewê deng bide hêza desthilatdar, eger ew hem kurdan, hem jî berjewendiyên wan nas bike. Erdoxan jî di Dîyarbekîrê da daxuyand, ku ew amede ye, wê yekê pêk bîne.

Qey bêjî, naskirina kurdan wek parçeyekî Tirkîyayê, bê guman, pêşkevtin e, lê ew rêyek e, ya ku dibe cîyekî, ji ku wê da ew xitimî ye, ji ber ku sazîya Tirkîyayê ya sîyasî ya giştî bi xwe dê heya wê demê pîr kevnûbê. Erdoxan hewl dide desteka kurdan bigire, ji ber ku çanda wan a sîyasî wê hê demeke dirêj nebe beşê girîng ê opozîtsîona libêral a Tirkîyayê. Girseya kurdên ku piştîgirîya PKK-a otoîtar dikin (ew partî dikare êdî çawa be, eger sîh sal e, ku şerê çekdarî dimeşîne) îro li Erdoxan pêwîst in, ji bo ku ew xwe wek parazvanê mafên wan êncuda netewî bide xuyan û di hilbijartinan da serbikeve (pîrs di wê da ye, ka xwetêgihîştina kurdan a netewî çiqasî li ser ya olî ra ye, ya ku êdî di Kurdistanê Îraqê da derket pêşya wan). Ev pîrseke pîr girîng e. Bi dengên kurdan Erdoxan dikare serbikeve, lê paşê wê sîstema rêvebirîya sîyasî wisa sade bike, ku di welêt da hemû desthilatdarî di destê serekdewlet da bicive, ya rast, ewê rastedêr bikeve destê Erdoxan.

Helbet, şewazên sîstêmên sîyasî yêncuda otorîter ji bo hinek serdeman baş in, lê dîyar e, ku ji bo Tirkîyayê êdî ew dem derbaz bûye, dema di destpêkê da xurtbûna êkonomîkî ji dêmokrasîyê û çawanîya jîyanê pêştir bû, û ew bi paşva, berbi pîlana duyem hatin defdan. Ji vê bêhtir, vegera berbi otoratîzma demên berê, dijwar ku tişteki di ser xurtbûna êkonomîkî ya Tirkîyayê da zêde bike, ji ber ku pîvanên xurtbûna êkonomîkî hatine guhartin: mirov dikre li dijî terefên ne baş êncuda globalkirinê berxwe bide, tenê eger anegorî wê bikeve nava wê pêvajoyê, lê ew jî azadîyên sîyasî û ji bo danîncuda darayî hewayeke hêja dixwaze. Ev hemû jî dijberî wê rê ye, ya ku Erdoxan berê Tirkîyayê didê.

Lê eger Erdoxan bigihîje ya xwe, di hilbijartinên têncuda serbikeve, ewê bide xuyan, ku mirov dikare wek serokê welateki ji bo 10 – 15 salan ewlehîya xwe bi wî bîne, û evê, bê guman, hev girtina tirk û kurdan xurttir bike û amadebûncuda û xwestina Hewlêrê ya ji bo hevhatina bi erebên xwe yêncuda

“îraqî” ra lewztir bike”.

Li vir mirov çî dikare bibêje?

Nirxandinên Makarênko di van gotarên wî da pir balkêş û bi naveroka xwe va dewlemend in. Lêbelê hinek tişt hene, ku pêdivîya wan bi ronîkirinê hene.

Di sêrî da divê bê gotin, ku ji bo me kurdan, ne tenê herêmeke nivserbixwe, lê heya navçeyeke xwedî statûsekê jî hebûya, emê pê dilşad û serbilind bûna. Me hemûyan dê bigota, ku bi millîonan kurdên me sedê salan ewqas zorî û tengasî dîtine, ewqasî hatine zêrandin, qet na, bila ew hinekî bêhna azadîyê bikişînin... Lê naha, mala Xwedê ava, herêmeke berfireh azad e, û ew herêm jî ji ber dewlemendîyên wê yê xwezayî, di cihanê da çavê hemûyan li ser wê ye, ew bi dewletên serbixwe ra gavan diavêje... Ev hemû pir başe, baş e, ku hebûna ji nevtê tê, ne ku tenê têra pêdivîyên Herêmê dike, lê wisa jî pir zêde ye... Û eger van derfetên finansî yê zêde di bankên Tirkîyayê da cîh dikin, ên ku, wek ku Makarênko dinivîse,

“...ewê bikaribe bibe bingeha finansî ji bo serdema nû ya pêşvaçûna darayî ya Tirkîyayê, dibe ku wisa jî ji bo berfirehkirina bandora wê di cihana tirkî da. Heşmendîya împêratorî ya nêo-osmanî, îslamî yan tiştêkî dinê – xercne mezin dixwaze. Û ewê wana ji ku bîne, eger çavkanîya dewlemendîya xwezayî, “ya bê heq” tunebe.” – Ango, çî dertê holê, ew hebûn, a ku ji xaka Kurdistanê dertê û hebûna gelê kurd e, wê bikeve xizmeta dagerkerê parçeyê herî mezin ê Kurdistanê, ji bo ku ew desthîdarîya xwe ya dagirkerî li ser wê bihêztir bike?! Lê, eger em van hemûya bînin ber dîmenê rewşa kurdê Rojava ya îroyîn?

Helbet, ev pirsan jî pirsne hirêtorîk in, em hêvîdar in, ku rêvebirîya Herêmê jî ji bo wan bersîvên xwe hene!

Ya dinê, ya ku, dibe ku ji vê pirsê kêmtir girîng nîbe jî (eger ji vê girîngtir jî nîbe)! Îro beşekî mezin ê Başûrê Kurdistanê: bajarên Xaneqînê, Mandalîyê û Badrayê bi navçeyên kurdên êzdî va û herêmên Kêrkûkê û Mûsilê bi fermî derî sînoren Herêma Kurdistanê mane. Û, heya em bi

dewlemendîya ku ji erdê Kurdistanê dertê, şa dibin, di derbarê pêşkevîtinên Hewlêrê, Silêmanîyê û bajarên dinê serxweş dibin, Nûrî El-Malîkî çekan ne ku tenê ji Dewletê Yekbûyî yê Amêrikayê (DYA) dikire, lê, her weha, ji Rûsîyayê jî, wek ku Seddem Huseyn di dema xwe da – ji Yekîtîya Sovêtê...

Gelo tehlûkeya xapandina kurdan a wê demê (1970 - 1974) xwe dubare nake? Lê, eger hêzên navnetewî yê hevpeyman (=DYA) pirs van herêman bi zanebûn wisa nivhero, bê çareserî dihêlin, ku sedema destêwerdana Îraqê hertim hebe, wek pirsas Îzraîl û Felestînê; û gelê kurd jî, wek gelê cihû dikin rehîne û wana bi şerekî bê dawî yê ji bo “çareserîkirina” wan pirsîrêkan va mijûl dikin...Û ya dawîyê; dema mirov van pirsên li jêrê di nav çarçevêya wan nirxandinên balkêş da dxwîne, dibîne, ku ew hîç ne anegorî tîmayê ne, wek tşteki lê hatibe zêdekirin. Fermo, ka, binihêrin: “Êdî naha têra xwe kurd hene, bi bingehîn jî li derveyî welêt ..., yê ku dibêjin, ku Mesûd Barzanî her tenê serokê Kurdistana Başûr e, lê Abdullah Ocalan serokê hemû kurdan e. Ew wana li dijberî hev datînin, her çiqas ew du destên bedenêkê ne. Lê dîrok biryara xwe, ne ku bi gotinên mirovan dide, lê bi karên rayedaran” an “Hewlêr nikre Dîyarbekirê bigihîne xwe, lê, wek ku rewş dide xuyanê, ew heya nikare rayê xwe li serokên Rojavayê Kurdistanê jî ferz bike, yê ku di tengasîyê da ne. Mirov dikare di vê rewşê da çî bike? ” – Vadîm Makarênko dipirse û bi xwe jî bersîvê dide: “Eger li ser rêvebirîya Kurdistana Îraqê siyasetmederekî weke Ocalan bûya, rewş dibe ku cuda bûya. Wê demê wê Hewlêrê bicêribanda û heya rayê xwe li “ewên li ser ya xwe” ferz bikira...” – Bi rastî jî, binihêrin, ev pirsana hîç ne di çîh da ne û ne mîna stîla wî ya nivîsînê ne...Lê, dîsa jî, er çî jî hebe, divê di sêrî da bêgotin, hîç hewce jî nake, ku Ocalan rayê xwe li wan ferz bike, ji ber ku ji xwe ew gel wî rêberê xwe dibîne û têkoşîna ji bo mafên xwe jî di rêya wî da dimeşîne, ji ber ku ew pêşkevîtinên ku îro di Bakûr û Rojavayê Kurdistanê da pêk hatine, hemû jî encama têkoşîna gelê kurd a 35 salan e, destkevîtyên Tevgera azadîxwaz a Gelê kurd û rêberê wê birêz Abdullah Ocalan e...

Ya dinê: rêz û hurmeta min bi her rêberêkî kurd ra

heye. Min di gotarek a xwe ya berî vê da (http://www.amidakurd.net/qunciknivis/xizmeta_hir%C3%A7_%C3%AA1) nêrîna xwe ya hember pirsas serokatîya netewî anye zimên. Lê divê bê gotin, her çiqas jî ev pirsas jorê pirsêke abstrak te, lê nikeribû pêk bihata, ji ber ku di rewşa heyî da Herêma Kurdistanê ya Başûr dê-fakto azad e, û birêz Mesûd Barzanî jî îro serokê vê herêmê ye, lê birêz Ocalan bi komployeke navnetewî hatye girtin û ev êdî 15 sal in, di nav çar dîwarên hebsa Îmralîyê da ye... Ji ber wê jî mirov dikaribû li vir pirs bi awayekî dinê danya: “Eger hêzên hevpeyman (=yên DYA) wek rêjîma Îraqê, ya Tirkîyayê jî birûxandina, di navbera xaka Bakûrê Kurdistanê û Tirkîyayê da parallêlek bikişandana, ew ji êrîşên dijmin biparastana, û birêz Ocalan jî azad bûya, wê demê mirov dikaribû bipirsîya, ka gelo Ocalan dê ji bo parçeyên dinê yê Kurdistanê çî bikira?” Lê, wek ku tê xuyanê rewş ne wisa ye... Û, ji ber wê jî ev pirs ne pêkan e...

Wekî dinê? Wekî dinê, xwendevanê bi xwe bixwîne û gelek tiştan ji bo xw ji nûva watedar bike...

Cavkanî:

Вадим Макаренко, “Стратегические направления "Юг" и "Запад", или где у России сейчас "мягкое подбрюшье"?”

http://kurdistan.ru/2013/12/13/articles-20232_Strategicheskie_napravleniya_YUg_i_Zapad_ili_gde_u_Rossii_seychas_myagkoe_podbryu_she.html

Вадим Макаренко, “Оджалан и Барзани: два лидера – двух этапов курдского возрождения к свету новой жизни”

http://kurdistan.ru/2013/12/19/articles-20282_Odzhalan_i_Barzani.html

Вадим Макаренко, “Курды в политике Эрдогана и турецкие риски Иракского Курдистана”

http://kurdistan.ru/2013/12/25/articles-20330_Kurdy_v_politike_Erdogana_i_tureckie_riski_Irakskogo_Kurdistana.html

Hunermend E K R E M SÎTÎ



Aborînas û Hiqûqnas: Dr. Têmûrê Hesên (Hasanyan)

Çend gotin derbarê

„FERHENGGA ŞIROVEKIRINA ABORIYÊ“ de



Hizira çêkirina ferhenga şirovekirin aboriyê a bi zimanê kurdî (kurmançî), hê destpêka salên 2000an li ba min pêşda hat, Lê karê amadekirina ferhengê, ev 6-7 salin ku hatiye destpêkirin. Pêdiviya çêkirina ferhengê weha, bi hindek sebebên ve tê şirovekirin, Yekemîn, hetanî niha bi kurmançî tu ferhenga şirovekirina aboriyê nîne, daku kategorî yan têgihên aboriyê, rave bike. Duyemîn, her çiqasî jî welatê kurdan hatiye parçekirin, lê ew di nav pergala aboriya cihanê a heyî de, cih digirin û dixwazin têkiliyên xwe bi zimanê xwe, nav bikin. Sêyemîn, raste zimanê me di qada çand û wêjeyê de pêşkêşî, lê ew di qada zanistê de şûnda maye û dema niha, di wextê çarekirina pirsgirêkên pergala aboriyê de, peyvên wisa bikar tên, yê ku wateya wan ji civakê re, ne zelal in. Hevûna ferhenga şirovekirina aboriyê, herwisa jî bi wê yekê ve girêdayî, ku ew bibe yek ji hîmên lîteratûra aboriyê û axaftina zimanê aboriyê.

Di vê pirtûkê de, ferhenga Kurdî-Ingilîzî, Ingilîzî-Kurdî û Şirovekirina bi kurdî, cih digire .

Piştî hazirbûn û çapbûna ferhengê, ez hêvîdar im ku wê kêrî we bê, Beşeke biçûk ji wê ferhengê, ez pêşkêşî xwendevanan dikim.

Aborî (economy) pergala hilberîn û belavkirinê, ya ku daxwazên civakê ên maddî, têr dike, Ew dikare bi parçeyên cuda ve were rêzkirin: wek sektorên berfireh (mînak, çandinî, pîşesazî) yan li gor şaxên wê (mînak, pîşesaziya derxistina neftê) û hwd.

Aboriya bazara serbest (free market economy) pergala aborî, wextê hikûmeta welêt têkilî nav karê karsazîtiyan, nabe.

Aboriya bazarê (market economy) aboriya ku li wir, pirsên wek „çî“, „çawa“ û „ji bo kê“ ên derbarê belavkirina resûrsan, bi daxwaz û pêşkêşa bazarê a heyî ve, tên çarekirin. Di aboriya rêxistinkirî a şeweya navborî de, hevkarî bi armanca zêdekirina qezencê, berheman dikire, hilberînê pêk tîne û berhemên xwe pêşkêş dike .

Lê malbat jî, bi dahatinên xwe ên berdest ve, daxwaza berheman di bazarê de, dixemilîne . Bi hevtêkilîbûna pêşkêşa hevkarîyan û daxwaza malbatan ve jî, biha û çendaniya berheman tê biryarkirin .

Aboriya serbest (free economy) aboriya ku bêyî têkilîbûna hikûmetê, bihayê berheman û dahatin ji aliyê hêzên bazarê ve, tên biryarkirin. Kargehên heyî ên di aboriya weha de, bitaybetî zêde yê arizî ne û sektora gelemperî jî, pirr hindik e .

Aborîzanî (economics) zaniyariya civakî, ya ku rewayîtiyên pêşveçûna aboriya welêt a derbarê makroaborîzanîyê (yanê, derbarê berheman, dahatinan, asta bihayan, bazirganiya derve, mijûlbûnê yan guherbarên din) û mikroaborîzanîyê (yanê, derbarê yekanên aboriyê ên cihê, sinca

Mezêxer û saziyên karsaz û herwisa jî hevban dorbûna wan), şirove dike

Aborîpîvan (econometrics) şaxê aborîzanîyê, ya ku diyardeyên aborî bi rêya dahûrandina ragehînen jimarzanîyê ve (mînak, hêza kedê, sermayeyên darayî, dahata netewî, mezaxtin), şirove dike, Ew ji bo pêşbînkirina aboriyê, tê bikaranîn Asta bêkariyê (unemployment rate) di nav hejmara hêza kedê a giştî de, hejmara kesên bêxebat bi selefan.

Asta xwezayî a bêkariyê (natural rate of unemployment) ew asta bêkariyê, ya ku anegorî rewşa aboriya welêt a aram e. Yanê, bêkariya ku anegorî potensiyala hilberîna aboriya welêt e. Asta bêkariyê di wextê mijûlbûna tam de, wek asta „xwezayî“ tê binavkirin.

Di çarçoveya vê asta bêkariyê de, înfilyon û hêzên ku mûçeyan jêr yan jor dajon, wisa hevsengkirîne ku înfilyon nayê guhartin .

Hizira bêkariya xwezayî, diçespîne ku tu pêngavên hikûmetê nikarin bêkariyê ji vê asta xwezayî, kêmtir bikin.

Bac (tax) dayînbariya mecbûrî û bêveger, ya ku kesên rastîn û hiqûqî di dema destnîşankirî de, bi divê armanca têrkirina hewcedariyên welêt û civakê, wan ji budceya hikûmetê yan heremê re, bidin. Yanê, baca ku hikûmet ji mal yan xizmetkariyan (baca nerasterast) û ji heyî yan dahatiya kes û hevkarîyan (baca rasterast), werdigire. Armancên bacdariyê weha ne: a) darayîkirina (fînansekirina) mesrefên hikûmetê, b) saxlemkirina wekheviya civakê a bi rêya nûvebelavkirina dahatiyan û samanan ve, c) rêzikîkirina asta mesrefên giştî a di aboriyê de, ç) parastina hilberînerên welatî ji hewirdeyê a di bazara hundirîn de.

Baca dahatê (income tax) baca rasterast, ya ku ji dahata kesên (mînak, mûçe, para qezencê, kirê), tê wergirtin û ji budceya dewletê re, tê dayîn. Ew bac, ji bo ewlekirina hatiniyên budceyê, nûvebelavkirina dahatê di nav komên gel ên cuda de û pêkanîna siyaseta bacdariyê, tê rasterêkirin. Baca dahatê, bitaybetî rasteka baca girbûnxwaz ve, tê wergirtin û çiqasî dahata kesî mezin be, ewqasî rêjeya bacê bilind e. Rêjeya bilindtirîn a baca dahatê di hindek welatan de, ji 30 selefî bilindtir e.

Baca girbûnxwaz (progressive tax – baca birade a zêdebar) baca ku rêjeya wê bi girbûna dahata nesafî ve, gir dibe, Ji baca girbûnxwaz a herî belavbûyî, baca dahatê ye . Herwisa jî dayînen dabînkirina gelêrî, baca mîratgiriyê û hindek caran jî baca qezenca hevkarîyan, dikevin di nav rêza bacên girbûnxwaz de. Bacdariya weha, bi rêgeza behremendiya perdayîne (hêza peredayîne) ve, tê hîmdarkirin .

Baca nîrxê lêzêdebûyî (value added tax/ VAT) baca nerasterast, ya ku ji nîrxê lêzêdebûyî a mal û

Xizmetkariyan, tê wergirtin, Hikûmet, wê bacê wek alava wergirtina destkevtê û siyaseta bacdariyê, bikar tîne. Baca nîrxê lêzêdebûyî, bi xeteke cihê ve li ser bihayê firotina berheman, tê zêdekirin û ji aliyê kirîgeran ve, tê dayîn . Ew di welatên cihanê ên cuda de, bi selefên cuda ve tê hesabkirin (mînak, li Almanyayê, ew ji bo hindek berheman 7% û ji bo yê din jî 19% e).

Balans (balans – hevseng a) (amadekirina budceyê a wisa, wextê dahat û mesref yeksan in, b) hesabkirina komperyan a wisa, ya ku herdu aliyên hesêb, hevseng dik in.

Balansa bazirganiyê (balance of trade) ferqa nîrxê malên maddî ên hinardekirî û hawirdekirî di hindek wext yan salekê de, Balansa bazirganiyê, beşek ji ya balansa dayînen welêt e. Ew, bazirganiya nedîtbar di nav xwe de, hemêz nake.

Bank (bank – diravgeh) înstîtûta aboriyê a taybet yan dezgeha sazkar, ya ku bi kirdariyên darayî ve, mijûl e. Ew, van fûnksiyonên sereke pêk tîne: qebûlkirina spardeyan, dayîna krediyên, transfera pereyan, kirîn û firotina kaxezên binîrx, karên dabînkirinê û karên şîretdariyê. Diravgehên pirr cure, hene: diravgehên karsaz, bazirganiyê, veberhênanê, paşrojmentiyê (sexbêriyê), îpotekî û hwd. Hemû diravgeh, merî dikare bêje ku heman kirdariyan, pêk tînin .

Banka Cîhanê (World Bank) ew di konferansa Breton Vucî de (sala 1944) hatiyê damezrandin û sala 1946, dest bi xebata xwe kiriye. Endamên wê bankê, divê herwisa jî endamê Fonda diravan a navneteweyî (ÎMF) bin .

Li wir, civata kargêran wek dezgeha herî bilind tê dîtin û her welatek, nûnerê xwe lê heye . Mafê dengdanê a her welatekî bi rêjeya wane ÎMF ve, girêdayî ye, Xebatên wê ên operatîv ji aliyê civata 20 kargêran ve, tê rêvebirin. Pênc welatên xwedî para mezin, her yek kargêrêkî pêşniyar dike û 15 kargêrên din jî ji welatên mayî tên hilbijartin (bi maweya du salan ve) . Baka Cîhanê ji bo pêşveçûna aboriya dewletan, wek cavkaniya giring a darayîkirinê ye. Armanca wê ewe ku bi rêya dayîna krediyên û şîretkariyan ve, alîkariya pêşveçûna aboriya welatan, bike .

Bazar (market) pergala pevguhartinê nîrxan, ya ku li wir, kirîger û firosyarê berheman rastî hev tên. Ew wek qada şerê karsazîtiyan e û şensê her hevkarîyekê bi pozîsyona wî a rasertiya rikeber ve, girêdayî ye.

Bazara serbest (free market) bazara berheman, kaxezên binîrx yan diravên biyanî, ya ku hikûmet têkilî nav karê wan, nabe û bihayê berheman jî bi pêwendiya pêşkêş û daxwaza bazarê ve, tê biryarkirin.

Bazirganî (commerce, trade) tevgera kirîn û firotina berheman, ya bi armanca wergirtina

qezencê, Qezenca bazirganiyê bi baca dahatê û baca qezencê ve, tê bacdarîkirin .

-3-

Bazirganiya serbest (free trade) hinarde û hawirdeya berhemana a di navbera welatan de, wextê sînorkirinê wê ên wek baca gumrikê, rêjeya parê û hwd, tune ne. Bi wê ve, halxwaşiya aboriya welatan, bilîn dibe û herwisa jî di cîhanê de, jêrîstina bihayê berhemana pêşda tê.

Berhem (output, product) a) mal yan xizmetkarî, ya ku hevkarî bikaranîna derametan ve, hildibrîne, b) navê giştî a mal û xizmetkariyên aboriyê, Berhemên amade (malên amade) ew in, yên ku ji aliyê mezêxeran ve, tên kirin. Lê berhemên navbeyn (malên hilberînê), ji aliyê hilberîneran ve tên kirin û wek deramet ji bo hilberîna mal yan xizmetkariyan, têne bikaranîn.

Berpirsiyar (accountable) kesê ku divê şirove bike, ka çi qewimiyê û kê ji bo wî tiştî, berpirsiyare.

Bêkarî (unemployment) ew para gelhe a karpêk, ya ku naxebite yan jî nemijûl e. Yanê, bikaranîna parçekî a hêza xebatkarên heyî di welêt de. Bêkarî di mercên aboriya bazarê de, wek derencama tevgera pêşkêş û daxwaza hêza kedê, pêşda tê, Ew bi selefana, hember hêza kedê a giştî tê pîvandî. Encamên bêkariyê ên aborî û civakî, weha ne: a) kurtbûna dahata neteweyîye nesafî pêşda tê, b) belavbûna newekhev a têçûnên bêkariyê di nav komên civakê de pêşda tê, c) xebatkar, hêdî hêdî wesfdariya xwe, winda dikin. Rêkûpêkkirina mijûlbûnê û herwisa jî a bêkariyê, dikare bi sê rêyan ve, bê pêkanîn: a) çêkirina ciyê karên nû û jinûve wesfdarkirina kadroyan, b) xemilandina bazara kar a nerm û rêkkirina pêwendiyên kar a qanûnî, c) ewlekariya civakî a bêkaran. Cureyên bingehîn ên bêkariyê, weha ne: bêkariya veşartî, bêkariya çerxdar, bêkariya demsalî, bêkariya karguhêrî (friksonal) û bêkariya binyatî.

Biha (price) nîrxê yekana mal yan xizmetkariyê bi pereyan, ya ku kirîger bona kirîna mal, ji firoşyar re dide. Bihayê mal, bitaybetî aliyê firoşyar (hilberîner) ve û ser hîmê têçûnên giştî ên hilberîn û firotinê, tê destnîşankirin, Di wextê destnîşankirina bihayana de, herwisa jî marjîna (radeya) qezencê li ber çav tê girtin. Lêbelê, bihayê mal hindêk caran li gor pêşkêş û daxwazê yan jî di wextê heracê de, tê guhartin, Ew bi sebeba sînorbûna budceya kirîger, dikare bibe faktora girîng a biryardana kirînan.

Civaknasiya kar (sociology of work) şaxê civaknasiyê, ya ku fikir, sinc û pêwendiya xebatkarên tevgera hilberînê, bi çend parçeyan ve, şirove dike (mînak, ji bo xebatkarê tekekesî, koma xebatkarana, temamiya saziyê). Ew di salên 1930 de pêşda hatiye û balkêşiyêke taybet dide ser pêwendiyên xebatkar û kardêran.

Civîna giştî a salane (annual general meeting/ AGM) civîna pardaran a salane, ya ku li gor qanûnê, divê hevkarî pêk bîne, Ew civîn, derfeta nîrxandina hesabdayînen salane, hilbijartina kardêran û destnîşankirina para qezencê ji pardaran re, dide. Li gor hewcedariyan, herwisa jî dikare civîna giştî a awarte were pêkanîn.

Civîna maseya girover (round table conference) danûstandina li dor maseya girover, wextê bi wê ve tê nîşandan, ku hemû aliyên beşdarî civînê, statûya wane wekhev, heye .

Çavdêrî (control) ew pêvajoya ku pêkanîna tevgera saziyê a plankirî, ewleh dike. Ew, yek ji fûnksiyonên rêvebirina saziyê ye û dîdevaniya kirdarîtiyên wê, hemêz dike. Mînak, çavdêriya mesrefan, dikare dîdevaniya rêzkirî a nîşanderên anegor û hevberkirina wane li tev nîşanderên budceyê, hemêz bike .

Çavkanî (source – jêder, kanîgeh) ciyê ku tiştê jê tê wergirtin .

Çerx (cycle) maweya ku di wextê wê de, tiştê ji rewşa xwe ye destpêkê, dûr dikeve û pişre, vedigere heman cihî .

Çerxa hesaban (accounting period) maweya ku dikeve navbera du hesabdayînen darayîye peyhevhatî, Li gor rêznameya hevkarîyan û daxwaza dezgehên bacdariyê, bitaybetî ew mawe wek salekê tê qebûlkirin û piştî temambûna wê, divê gotara salane û hesabdayîna salane bêne pêşkêşkirin. Lêbelê, hevkarî li gor hewcetîyan, herwisa jî dikare mehê yan hefteyê carekî, hesabdayîn qezenc û zerarê yan balansa hesabdariyê amade bike .

Çewtî (defect, defective work) berhema amade yan jî nîvamade, ya ku di encama nêrînê de, ji ber sebeba neanegorbûna standardê, nehatiye qebûlkirin. Çewtiya berhemana, dikare di wextê keda qalîteya nîzm, çavdêriya sist, madeyên bêqalîte yan jî parastin û bikaranîna ne rast a makîneyan de, pêşda bê.

-4-

„Çî“, „Çawa“ û „Ji bo kê“ (what, how and for whom) sê pirsên sereke ên rêxistinkirina aboriyê: pîrsa „Çî“ nîşan dide, ka dewlet bi resûrsên xwe ye sînorkirî ve ji her berhemêke potensiyal, çiqasî dikare hilberîne. Pîrsa „Çawa“, hilbijartina teknolojiyan e, wextê her berhemek bi wê ve, dikare were hilberandin. „Ji bo kê“, pîrsa belavkirina mal û xizmetkariyên mezaxtinê, yên di nav endamên civakê de. Ev her sê pirsên aboriyê, hevbendkirî ne û aliyên cuda ên heman pêvajoyê, nîşan didin .

Dabînkirin (insurance) rêzika pêwendiyên aborî, ya ku piştgiriya berjewendiyê kesa yan hevkarîyan, dike, Yanê, ew mecalê ku kesa û hevkarîyan ji zerarên darayî, diparêze. Fondên dabînkirinê ji aliyê kes yan hevkarîyên dabînkirî ve, tên dagirtin, Di pêvajoya dabînkirinê de, divê herî kêma dualî yan kes beşdar bin: a) hevkarîya dabînkirinê (dabînkariya), ya ku çêkirin û bikaranîna wan fondên anegor ve, mijûl e, b) dabînkirî dabînkirî (dabîndar), yê/ya ku gor peymanê dabînkirinê, pereyan ji wê fondê re, dide. Herwisa jî kesê sêyemîn dikare ji bo standina cirmên dabînkirinê, beşdar be. Objektên (berkarên) dabînkirinê weha ne: dizî yan zerara heyînen şexisî û karsazîti (wek dabînkirina giştî), mirin yan zerarên bedenî (dabînkirina jiyane), Kes yan hevkarîya dabînkirî (dabîndar), hember prîma (bihayê) dabînkirinê, nixêva dabînkirinê di çarçoveya

Çarçoveya çêbûna rûdanê de, werdigire .

Dahat (income – hatin) 1. zêdebûna heyînan yan kêmbûna lixwegirtinê (deynên) hevkarîyê, yên ku di encama tevgera aboriya asayî de, pêşda tên û sermayeyên hevkarîyê ên xwemalî, mezin dikin. Dahat, hemû destkevtinên ji firotina berhemana yan pêkanîna xizmetkariyan, para qezencê, royaltiyê (diravê belgeya keşfê) û hwd di nav xwe de, hildigire; 2. pereyên ku kes yan hevkarî bi şeweya mûçe, kirê, sîd, sîmsariye (heqê navbeynkariyê), heqê xizmetkariyê, qezencê, diravbexşînê, sîda bêkariyê û karkenariyê, werdigirin.

Danasîn (advertisement – reklam) nasandina mal yan xizmetkariyan, ya ku sazî bi rêya dezgehên ragehandinê ve, pêk tîne, Yanê, ew alava ku firoşyar bi alîkariya wê ve, firotina mal û xizmetkariyan berfireh dike.

Deflasyon (deflation – biha ketin, diravkerkirin) ketina asta bihayana bi giştî (berovajîya înflyasyonê), wextê îndeksa bihayana ji yek, biçûktir e. Deflasyon, wek berovajîya înflyasyonê ye û bi daketina lez a bihayana ve, tê naskirin, Di çarçoveya deflasyonê de, ew kesên ku mal embarkirine, zerarê divînin û dikevin di nav rewşa rûtbûnê de, lê yên ku pere danehev, qezenc dikin.

Depresyon (depression – ketin) rewşa aboriyê, wextê ew bi asta nîzma hilberînê, bêkariya bilind, pîvana biçûk a veberhênanê û ketina bihayana ve, tê rêkirin. Depresyon, yek ji qonaxa çerxdariya karsazîtiyê ye.

Destengî (insolvency) rewşa kesî yan hevkarîyê, wextê lixwegirtinê (deynên) wî ji nîrxê heyînen wî, zêdetir in . Yanê, ew nikare bi destkevtinên xwe ve (yên ji firotina heyînan), lixwegirtinê lihevciyayî, dade. Gava yekemîn a çarekirina pîrsa destengiyê, razîbûna dilxwazî a di navbera aliyan de ye . Lê di wextê çepbûna wê de, dadgeh dikare kesê desteng, wek wêrbûyî (rûtbûyî) bide naskirin.

Dirav (currency) yekana pereyan, ya ku bona pîvandina mezîniya nîrxê berhemana, tê bikaranîn . Yanê, pereyên metal û kaxez, yên ku amûrên maddî ên pêşkêşa pereyên welêt in. Lêbelê, heyînen din jî, yên pêşkêşa pereyên welêt dixemilînin (mênak, spardeyên diravgehê) , tenê wek nivîsînê hesabdariyê ne.

Diravê biyanî (foreign gurrency, foreign exchange) diravê her welatekî biyanî, ya ku di wî welatê biyanî de, wek mecalê geryana pereyan a qanûnî û hîmê hesabkirinan, tê dîtin . Her welatek dikare diravê biyanî bi diravê welatê xwe ve, bikire û bona bazirganiya derve yan pêkanîna kirdariyên darayî, bikar bîne .

Email (email) nameya ku bi posteya elektronî ve, tê şandin.

Emîsyon (emission, issue – vezikîn, deranîn) deranîn û zêdekirina girseya pereyan yan kaxezên binîrx di nav geryanê de .

Encumana Yekîtiya Ewropayê (Commission of the European Union) dezgeha rêveberîya payebilind a Yekîtiya Ewropayê, ya ku her

Welatekî endam li wir, nûnerê xwe lê heye . Navenda wê jî li Brûkselê ye .

Ewro (euro) diravê qanûnî a Yekîtiya Ewropayê, ya ku di destpêka sala 2002 de, ketiye nav geryanê û ji meha îlonê a sala 2008 ve, li 15 welatên YE de (ji 27 welatan), wek amûrê diravdayînê a qanûnî ye (Almaniya, Awistiriya, Belçîqa, Fînlendiya, Fransa, Holanda, Îrlanda, Îtaliya, Luksembûrg, Malta, Portekîz, Qibris, Sloveniya, Spaniya û Yûnanistan). Danîmarka û Brîtaniya Mezin, rewşa wane taybet heye û dikarin bi xwe biryar bikin, ka li tev ewrosînor bin yan na. Lê ew 10 welatên mayîn (Bulxaristan, Çek, Estoniya, Hûngariya, Letvîya, Lîtvaniya, Poloniya, Romeniya, Slovekiya û Swêd), dikarin li gor demên destnîşankirî derbazî ewrosînor bin. Xêncî van welatên jorîn, herwisa hindêk welatên din jî (Andora, Monako, Montenêgro, San Marîno, Kosovo), ewro wek diravê xwemalî bikar tînin.

Êrîşker (raider) kes yan hevkarîya ku di nav kirîna parkartê hevkarîyên kulek de, pîspor bû ye û armanca wê jî, lêwergirtina hevkarîya kulek e .

Fatûre (invoice – firoşte) hesabê ku pêşniyardêr ji kirîger re, dişîne û li wir, malên pêşniyarkirî, bihayê wan û tibaba giştî a pereyên berdayînê, tîn nîşandan. Fatûre bi taybetî piştî verêkirina mal ji kirîger re tê şandin û kirîger jî, divê pereyan di dema destnîşankirî de, bişîne .

Fêlbazî (fraud) wergirtina qezencê a bi rêya agahdarkirin yan kirdariyên şaş ve. Peymana morkirî a bi rêya fêlbaziyê ve, dikare were betalkirin.

Fînans (finance – darayî, sermayeyên darayî) ew kategoriya aboriyê ye û wan pêwendiyên nîşan dide, yê ku di pêvajoya çêkirina fonda sermayeyên darayî û bikaranîna wan sermayeyan de, pêşda tî. Ew bi wateya xwe ve, pêwendiya aborî ye û bi rêya diravan ve tê nîşandan.

Garantî (guaranty, warranty – misogerî) soza ku bi qanûnî firoşyar ji kirîger re, dide û bi wê ve, ew di wextê sekin yan pûçbûna tiştê nû kirî de, divê belaş nûjen bike yan biguhêre yan jî pereyên wê şûnve vege. Lêbelê, maweya wê sînorkirî ye û ew di maweya destnîşankirî de, tê pêkanîn. Garantî yek ji mecalên serxistina firotina mal e .

Gelhe (population) hejmara giştî a niştecihên welêt yan bajêr di wî wextî de, Ew bi pêwendiya jidayikbûn, mirin û herwisa jî pîvana koçberiya der û hundir ve, girêdayî ye. Hejmara giştî a gelhe, li tev faktorên civakî û aborî, dikare bandorê ser berfirehbûna malên bazarê, bike û ew jî ji bo karsazîtiyan, pîr girîng e.

Globalîzasyon (globalization – cihanîbûn) pêvajoya hemcihanîbûna tiştêkî, wextê gelê cihanê wek civakeke yekbûyî, tev digere, Globalîzasyon, wek derencama kirdariyên hêzên aboriyê , hilberînê, çand û siyasetê ye. Sebebên wê, weha ne: navneteweyîbûna aboriyê, bazara nû (nûverexistinkirina bazara cihanê), teknolojiya nû (satelît, internet), mîgrasyon (koç), post koloniyalizm.

Herac (auction) firotina bi danûstandinên eşkereyî ve, wextê mal yan milkê berfirotinê, ew kes bi dest xwe ve tîne, yê/ya ku bihayê herî bilind pêşniyar dike. Heraca dilxwazî û pêwîstî(yan mecbûrî), heye. Heraca dilxwazî, ji aliyê berhemdêran ve tê rêxistinkirin û armanca wê jî, firotina hê sûdmend

A berhemana e. Lê ya pêwîstî, aliyê dadgehê yan dezgehên dewletê ve tê pêkanîn û armanca wê jî, firotina mal û milkê wan deyndaran e, yê ji aliyê dadgehê ve, wek kesên înfaskirî hatine naskirin. Heraca pêwîstî, herwisa jî ji bo mal yan milkên bêxwedî, malên ku bi mafê mîratgiriye ve derbazî destê hikûmetê bûne, malên ku di gumriksanê de hatine desteserkin û hwd, tê pêkanîn.

Hawirde (import) a) malên ku derveyî welat hatine hilberandin, piştî hatine veguhastin û di bazara hundir welêt de, hatine firotin, Herwisa jî bi wê ve, derkişiyana ji welêt a diravên biyanî, pêşda hatiye, Ew, hawirdeya dîtbar tê binavkirin, b) xizmetkariya ku saziya biyanî, hundir welêt (bankdarî, dabînkirin) yan jî derveyî welêt (bona rêwîyan) ji bo niştecihên wî welatî, pêkaniye û bi wê ve, derkişiyana ji welêt a diravên biyanî pêşda hatiye. Ew, hawirdeya nedîtbar tê binavkirin.

Hêza kedê (labour force) hejmara giştî a mirovên welêt, yê ku bi armanca hilberîna berhemana yan pêkanîna xizmetkariyan, ji aliyê sazî yan hevkarîyan ve tîne kirêgirtin .

Hinarde(export)a) malên ku di welêt de hatine hilberandin, lê cih guhastî welatên din bûne û di bazarên biyanî de hatine firotin. Herwisa bi wê ve jî, diravên biyanî hatine welêt, Ew, hinardeya dîtbar tê binavkirin, b) xizmetkariyên ku di bazara welatê biyanî de (mînak, dabînkirin yan xizmetkariyên diravgehan ên welêt) yan jî hundir welêt bi kesên biyanî re (ji tûrîstan re), pêk tî. Ew hinardeya nedîtbar tê binavkirin.

Îndeks (index – pêrist) pêwendiya mezinayên guherbarekî, yê sala wextî û sala hîmî, Mînak, îndeksa bihayê malên mezêxeriyê, dikare weha were hesabkirin: ji bo sala wextî û sala hîmî, bihayê selika mezêxeriyê a mal yan xizmetkariyan tê biryarkirin û pêwendiya bihayên selika sala wextî û sala hîmî, dibe îndeksa bihayê mezêxeriyê. Di wextê biryarkirina îndekse de, divê pîvana hemcuretiya malên selik sala wextî û sala hîmî, li ber çav were girtin.

Înflasyon (inflation – diravzorî, girbûna bihayan) girbûna berdewam a asta bihayan bi giştî. Înflasyon, tîgehîştineke aborî ye û bi asta bihayên giştî ve, tê destnîşankirî, Mînak, rast nîne ku gotinên wek „înflyasyona gazê“ yan „înflyasyona benzîne“ (yanê, ji bo berhemekê tenê), bî bikaranîn. Înflasyon yan pîvana înflyasyonê, dikare bi alîkariya îndeksa bihayên takfirotinê ve, were biryarkirin û ew jî, guherîna rêjeyî a bihayê selika mezêxer di hindêk wext de, nîşan dide. Înflasyon, dikare weha pêşda bê: wextê hikûmetê welatan, diceribînin ku çetinayên aboriyê bi emîsyonkirina diravan ve, çareser bikin. Lê zêdebûna girseya diravan, hevniixiya newekhev a girseya berhemana çê dike û ew jî, dikare girbûn bihayan, daketina mûçeya rêal û kêmbûna standardên jiyana gelhe, pêşda bîne.

Siyaseta aboriya welatan, bi sebeba tesîra înflyasyonê a nêgatîv (ya ser tevgera aboriyê), balkêşiyêke mezin dine ser şidandina înflyasyonê. Du sebebên bingehîn ên înflyasyonê, hene: a) zêdebûna daxwazê a hember pêşkêşê (înflyasyona daxwazkêş), b) girbûna mesrefan yan tîçûnan, yê derametên hilberînê (înflyasyona tîçûnkêş).

Ya yekemîn, derencama emîsyonkirina pîr zêde a diravên welat e û ew jî, li gor monetaîstan, dikare bi rêya sînorkirina hişk a pêşkêşa pereyan

ve were şidandin. Lê a duyemîn, derencama bilindbûna mûçeyan û mesrefên maddeyên xam e û ew jî, dikare bi sînorkirina bihayan û dahatînan ve ji holê were rakirin.

Kar (employment, job, work – ked, xebat) hêz û jêhatîbûna fizikî (bedenî), hizrî û derûnî a mirovan di nav hilberînê de, Kar yan hêza kedê di nav aboriyê de, yek ji sê faktorên hilberînê ye (li tev erd û sermayeyên karsaz) û bona hilberîna berhemana, tê bikaranîn, Li gor Dibistana kilasîk a aborîzaniyê û aborîzaniya Marksîzmê, kar wek livîndarê bingehîn a pêvajoya hilberînê tê dîtin, Lê aborîzanên Dibistana nêokilasîkiyê, wê tenê wek faktoreke hilberînê, dibînin û herwisa jî li gor wan, nîrxê kar bi pêşkêş û daxwazê ve tê biryarkirin.

Mûçe (pay, wage – destheq) pereyên ku ji bo pêkanîna hindêk xebatan ji xebatkar re, tîne dayîn. Yanê, bihayê karê serfikirî, ya di yekana demê de (demjimêr, roj û hwd), Mûçeya xebatkar bi rêjeya mûçe û maweya kar ve, girêdayî ye û dikare ser hîmê pergala destheqê demjimêrkî yan destheqê encamî, were dayîn.

Nîrx (value) hêjabûn yan nîrxdarbûna mal û heyîne, ya bi pereyan ve, Nîrx bi wî bihayî ve tê pîvandî, ya ku kirîger amade ye ji bo mal yan heyîne, bide. Ew jî bi wê yekê ve girêdayî ye, ka kirîger çî kêrhatinê ji mezaxtin yan hebûna mal, hêvî dike.

Pereyên hazir (cash) pereyên kaxez û metal, yê ku amûrên maddî ên pêşkêşa pereyên welat, temsîl dikin. Lê amûrên din ên pêşkêşa pereyan (mînak, spardeyên diravgehê), tenê wek tomarkirinên hesabdariyê ne. Amûrên darayiyê maddî (mînak, girteka diravgehê), wek pereyên hazir tîne qebûlkin. Ji ber, ew bi hêsanî pereyên kaxez û metal ve, tîne guhartin.

Rêzname (articles of association, constitution) rêzikên nivîskî ên di derbarê tevgera hevkarîyê, yekîtiyê û yê din de, Mînak, rêznameya hevkarîya pardaran, pêwendiyên hundirîn ên hevkarîyê û pardarên wê, destnîşan dike. Şert û mercên rêznameyê, van tiştan hemêz dike: desthelata rêveberan yan kardêran, rêzika vexwendin û pêkanîna civînan, mafê pardaran a di derbarê para qezencê û dengdanê de û rêzikên din.

Yekîtiya Ewropayê (European Union) yekîtiya welatên Ewropayê, ya ku di sala 1957 de û lihevkarîna Romayê ve, çê bû ye (endamên destpêkê: Almaniya, Belçîqa, Fransa, Holanda, Îtaliya û Luksembûrg). Sala 1973, sê welatên din jî tevî YE bûn (Danîmark, Îrlanda û Qiraliyeta yekgirtî a Brîtaniya Mezin) .

Armancên bingehîn ên YE, weha bûn:

Întegirebûna aboriya welatên endam, ewlekirina kişiyana serbest a miovan û sermayeyên darayî di nav welatên endam de, çêkirina bazara serbest û diravê giştî (ewro). Hejmara welatên endam ên YE di sala 2008 de, 27 bûn:

Almaniya, Awistiriya, Belçîqa, Bulxaristan, Çek, Danîmark, Estoniya, Fînlendiya, Fransa, Holanda, Hûngariya, Îrlanda, Îtaliya, Letvîya, Lîtvaniya, Luksembûrg, Malta, Poloniya, Portekîz, Qibris, Qiraliyeta yekgirtî a Brîtaniya Mezin û Îrlandaya Bakur, Romeniya, Slovekiya, Sloveniya, Spaniya, Swêd û Yênanistan.

Dr. Ehmed Xelîl (Sozdar Mîdî)

Çavdêriya zimanî: Mustefa Reşîd

**Ceng û Berjewendî:**

Klawfîtz, ku yek ji navdartirîn pisporên zanista cenga nû ye, di gotineka xwe da dibêje:

"Ceng, nakokiyeka di navbera vînan da ye, ku her aliyek dixwaze vîna xwe li ser aliyê din bi darê zorê bide pejrîrandin"⁽¹⁾.

Helbet ev gotina gelekî di cih da ye, lê ku em hinekî bi kûranîyê da herin, emê bibînin ku berjewendî di paş vînan da rûniştine, ew wan vînan diafirînin û dilivînin. Berê jî bi me ra derbas bûbû, ku berjewendîya herî girîng di dîroka gelan da (Erdnîgarî ye), ango (Cografî ye), çî ji hêla dewlemendî da be (xak, heyam, av, zevî, ajel, maden), an ji hêla ciyopolîtîkî da be (cîwarê strategî yê leşkerî, rêyên bazirganiya cîhanî).

Bi rastî, beşekî mezin ji pîrgirêka kurdan - kevin û nû - cografîya Kurdistanê ye, çî ji aliyê dewlemendiyê da be, an ji aliyê ciyopolîtîkî da be, û li ber ronahiya vê rasteqînê, mirov wê karibe baştir serpêhatiyên tal û dijwar yên ku di dirêjahiya dîrokê da bi serê kurdan da dihatin têbigihîne, û wê baştir sedemên ku êrişvanên ji rojhilatê didan ser rojava, an ji rojava didan ser rojhilatê nasbike, ku bi her awayî hewl didan erdnîgariya kurdan bixin bin desthilatdariya xwe; hema bi kurtî em van êrişvanan (2300 b.z - 1900 z) di ber çavan ra derbas bikin (Akkadî, Babilî, Aşurî, Faris, Aşkan, Girîk, Rom, Ereb, Mengol, Teter, Turk).

Niha, wê baştir be, ku em li ber ronahiya van rasteqînan, pêvejoya pêşiyên kurdan yên Arî-Zagrosî (nişê duwem) bi kurtî pipelînin, ew nişên pêşî evin: Gelê Mennay (Mana), Gelê Xaldî (Xaltî), Gelê Med (Mad).

Gelê Mennay:

Gelê Mennay şaxek ji pêşiyên Kurdan yên Arî ye, ew di destpêka yekemîn hezar salên b.z da li başûrê gola Urmiyê diyar bû, Bajarên **Mehabad**, **Seqiz** û **Şino**, parek ji welatê gelê Mennay bûn. Paytexta wan bajarê **Îzirta** bû, ê ku bi 50 Km dûrî bajarê Seqizê dikeve⁽²⁾.

Li dor sala (714 b.z) şahnişîna Mennay gihiştibû serdema xwe ya zêrîn, desthilata wê ji hêla bakur da digihişt çemê **Aras** (bakurê gola Urmiyê) û ji hêla rojava da, heya çemê **Zabê Mezin** (jorîn) li bakurê **Hewlêrê**, dicû, Bi gotineka din, em dikarin bêjin, ku xaka navbera gola Urmiyê li bakur, û li hêla başûr digihişt gola Zerîbar; li kêlek Merîwanê, û zincîra çiyayên Zagros jî bûbûn kêlekên wê yên rojava⁽³⁾.

Dewleta Mennay ji hêla bakur-rojava da li hember şahnişîna Urarto (Xeldî), û ji hêla rojava da jî li hember şahnişîna Aşur rû bi rû bû, Her yekê ji wan dixwast xaka Mennay bixe bin desthilata xwe, lê tê xuyan ku şahnişîna Aşur pirê caran êrişî xaka Mennay dikir, şahê Aşur **Sergonê Duwem** (722 - 705 b. z) hêşt ku şahê Mennay **Aza** kurê **Îranzo** peymanê hevbandiyê li gel şahnişîna Aşur girêbide. Lê gelê Mennay ew peymanê nepejrîrandin, li dijî

Pêşiyên Me Yên Arî - Zagrosî (Xelex 22)**(Mennay û Xeldî)**

şahê xwe serî hilda û ewa kuştin⁽⁴⁾.

Têkeliyên merivatiyê di navbera gelê Mennay û gelê Med da, hêşt ku rêberê Medan; **Deyako** (Diyako) salên (737 - 719 b. z) xwe bavêje bextê desthilata Mennay, da ku xwe ji destdirêjîyên şahnişîna Aşur biparêze.

Lê piştî serkeftina Medan û şikestina şahnişîna Aşur, Mennay, di navbera salên (590 û 580 b. z) da, bû parek ji împeratoriya Med, û şahnişîna Mennay, ji hêla şaristanî, bajarvanî û aborî da, bû bingeha şaristaniya împeratoriya Med di serdema şeşemîn sedsala b. z d⁽⁵⁾.

Şahnişîna Mennay bi çandin û çêra ajelan - nemaze jî hespan - navdar bû, û çêkirina mêtal li Mennay gelekî pêşketî bû. Lê pêşketina şaristaniya Mennay ne ji vala peyda bûbû, enteleqîsiya Mennay di paş wê pêşketinê da bû, endamên wê enteleqîsiyayê bi paşnavê (Hazano) dihatin nasîn, wateya wê jî (hîlbijêrê komelê) an jî (rêvebirê komelê) ye. Girîngtirîn kar û barê şahnişîniya Mennay li ser milê wan bû, peyva (Hazano) bi xwe rûçikekî peyva (Hozan/Hewzan) ya kurdî ye. Bêguman eva dide xuyan ku hevgirêdana çandî di navbera gelê Mennay û neviyên wan yên Kurd da nehtiye birîn.

Gelê Xeldî (Urarto):

Gelê Xeldî, bi navên (Xaldî / Xaltî) jî tê naskirin, navê wan jî navê xwedayê Xeldî (Aldî) hatiye girtin; wan welatê xwe bi (Biyaynîlî) binav dikirin. Aşuriyan navê (Nairî/Nayrî) li hin deverên welatê Xeldî kirine, ew deverana niha bi navê (Şemdînan) tên naskirin. **Şêx Ubeydulla Nehrî**; reberê şoreşa (1880 z) ji wa deveran bû. Piraniya Xaldiyan di navbera çar golan da dijiyan: Gola **Çîlder**, gola **Wanê**, gola **Urmiyê** û gola **Sîvan**, bajarê **Toşpa** yê ku paytexta wan bû, ew bajar li nêzikî bajarê Wanê dike û di pêra cîwarê gelê Xeldî fireh bû û gihişt çemê Ferêt⁽⁶⁾.

Gelê Xeldî - wek hemî pêşiyên kurdan, û wek neviyên wan yên îro jî - dibû armanca destdirêjîya desthilatên dorê wan, Wê çaxê şahnişîna Aşur desthilatiya herî hêzdar bû, qet nedipejrîrandin ku hêzeka konevanî ya din li Rojavayê Asiyayê peyda bibe; lewra cengên giran di navbera Xaldiyan û Aşuriyan da qewimîn, ew cengan di sê qonaxa ra derbas bûn:

1- Qonaxa Lawaziyê (1275 – 840 b.z):

Di vê qonaxê da desthilata navend li welatê Xaldî tune bû, welat di navbera gelek mîrnişînan da parve bûbû; pirê caran jî hevdiyayê di navbera wan da gur dibû; lewra jî êrişên şahên Aşur - ji **Tukulti Ninurta I** (1233 – 1197 b.z) heya bi **Aşur Nasir Pal II** (883 – 959 b. z) - li welatê Xaldî bi serdiketin⁽⁷⁾.

2 - Qonaxa Hêzdarîyê (840 – 959 b. z):

Di vê qonaxê da, mîrnişînen Xaldiyan bûn yek, şahnişîneka cengewar pêkhat, şah **Serdor** (Serdar) ê **yekem** ev şahnişîna avakir. Di bin serkêşîya wî da,

Xaldiyan ne bes xwe ji desthilata Aşuriyan rêzgar kirin, lê belê êriş li ser êrişê dane ser şahnişîna Aşur, sînorê welatê wan li bakur gihişt serkaniyên Dicle û Ferêt û li başûr beşek ji deverên Aşur (Subartu) xistin bin destlata xwe, û ji çemê Aras li rojhilat heya bakurê Sûriyê li rojava ket bin destê wan⁽⁸⁾.

3 - Qonaxa Têkçûyinê (959 – 612 b. z):

Di vê qonaxê da şahnişîna Aşur careka din bi hêz bû, di sedsala (8 b.z) **Tîglat Pilaser** şahê Aşur da ser welatê Xeldî, raste ku şah **Serdorê duwem** gelekî li berxwe da, lê sala (743 b. z), di cengeka germ da Tîglat Pilaser bi ser ket. Di pêra **Rosayê duwem** ala cengê li dijî Aşur rakir, lê şahê Aşur **Sargonê duwem** - sala (714 b.z) - biserket, bajarê Toşpa dagîr kir û malbata Rosa dîl kirin. Ji xemgînî Rosa bi xençerekê xwe kuşt. Di serdema şahê Xeldî **Serdorê Sêyem** da êrişvanên Skît - ên ku ji bakurê Derya reş êrişî Kurdistanê kiribûn - şahnişîna Xeldî hilweşandin û piştî sala (612 b. z) welatê Xeldî bû beşek ji împeratoriya Med⁽⁹⁾.

Ji hêla kultûr û şaristanî da, zimanê Xaldî ji zimanê horî (xorî) va nêzik bû û gelê Xaldî ji bo çêkirina madenan pêşketî bû. Metiryalên mîna hesin, baqil (baqir), zêr, qurşîn û qelê, ber dest bûn, xencî vê jî, karên hîdrolîkî li Urarto gelekî bi pêş ketibûn, cihokên bin'erd (قنوات) ji bo avdana zeviyê kolandin, yek ji wan cihokan av ji dora gola Wanê bi dirêjahiya 75 Km digihandin zeviyên⁽¹⁰⁾.

Jêder:

- 1 – Mihemed Hesenên Heykel: Salên kelîne (سنوات الغليان), Navenda Ahram, Qahire, 1988, rû 55.
- 2 - Cemal Reşîd: Diyarbûna Kurd di dîrokê de, beş 2, rû 484- 485. Ebdil-Hemîd Zayêd: Rohilata nemir, rû 562.
- 3 – Cemal Reşîd: Jêdera berê, beş 2, rû 486, 500. Ebdil-Hemîd Zayêd: Jêdera berê, rû 578.
- 4 – Diyakonov: Mîdya, rû 199. Ebdil-Hemîd Zayêd: Jêdera berê, rû 578.
- 5 – Cemal Reşîd: Jêdera berê, beş 2, rû 494. Diyakonov: Jêdera berê, rû 143.
- 6 – Cemal Reşîd: Jêdera berê, beş 2, rû 131-134.
- 7 – Cemal Reşîd: Jêdera berê, bes 1, rû 164, beş 2, rû 131, 132.
- 8 – Cemal Reşîd: Jêdera berê, beş 2, rû 125 – 127. Mihemed Beyyûmî Mehran: Dîroka Îraqê ya kevin, rû 372. Cemal Reşîd: Jêdera berê, beş 2, rû 127.
- 9 – Cemal Reşîd: Jêdera berê, beş 2, rû 128, 128 – 129. Mihemed Beyyûmî Mehran: Jêdera berê, rû 419.
- 10 – Wilyêm Langer: Dîroka cîhanê ya fireh, beş 1, rû 87. Bongard – Lîvîn: Li derdora Rohilatê kevin, rû 532. Cemal Reşîd: Jêdera berê, beş 2, rû 122, 131, 139, 141, 163, 164.



Bîranînên Têkoşerekî Kurd

Ehmedê Ebdirehman Axa Kurê Şahîn Axa Şûzî ...

Xelek – 7 –



Dema me reşbeleg xwend, me karê çûnê kir, me 9 peya xwe girêda ji bona çûnê:

Şêx Ebdirehmanê garisî, Ehmedê şûzî, Şeref Sultanê Hesên, Elî yê Qolçî, Elî yê Hemîd, Lawikê Berwarî, û Sê peyayê Ermenî navê serokê wan Azad bû, peyakî zor zana bû, wê bi me re bihata ta sînorê Îranê, ji wir pê de wê derbasî Îranê bibe.

Me xwe bi rext û fişekan pêça, û berê xwe da gundê Dêrika ber avê (ava mezin – dicle), dem jî Çiriya paşî bû, me ji muxtarê gund re got: dema em veşerin, emê nûçeyê te bikin, divê tu çend peya rêkê ber avê da alîkariya me bikin, û me derbaskin milê avê yê dîn bikin.. ji mere gote ser serê min.

Êvarî me li avê xist, bi şev em dimeşîn û bi roj me xwe di nav zeviyanên nêzîkî rê yên vedîşt, bi vî rengî çar roj me derbaskirin ta em gîştin herêmê Xezxêr, berfê des pê kir û rê yên di nav çiya de wê asê bibin, me nikarî em rêya xwe temamkin, em bi şûnde veşeriyên ta em gîştin ber ava mezin rastdoka ber qereqola tirkî nêzîkê meye.

Şêx ebdilrehman gote min, Ehmed tû sobariyê zanî, divê tû herê cem muxtar da çend peyan rêke ji bo arîkariya me bikin, û me derbas bikin, eger em li vir bimînin ta demê sibehê, divê em şer bikin bi leşkerê qereqolê re.. min gote Şêx, ser çava ezê herim û min xwe li avê xist, derbasî rexê dî bûm, wextê ez ji avê derketim, bayê wekû qeşayê li min xiste, ez hatim hejandin ji serma, bi lez min berê xwe da mala muxtar, û min destê xwe li derî xist, dema muxtar derî vekir, mi silav lê kir û min jêre got:

Şêx ebdilrehman silava li te dike û ew bi heşt hevalên xwe li rexê qereqola tirkane, divê tû çend peya bişîni wir da wan ji avê derbaskin,..

Muxtar li min veşerad, gote min: Birazî, eger pêxember bi xwe li ber avê be kes naçê wî ji avê derbas nake,..

Min gotiyê: ezê 20 mecîdiya bidim wan ji bo derbaskirina wan, ..

Li min veşerand: eger tû 100 mecîdî bidê her peyakî tû kes di vê qeşayê de ji mala xwe dernakeve.

Ez bê hêvî veşeriyam çûme ber avê, û careke dîn min li avê da, dema ez gîştim cem hevalên xwe, min ji wan re da xuyakirin kû tû kes bi hewariya meve nayê, û divê em arî hev bikin ji bo derbaskirina avê.

Min 8 tiveng dane ser milê xwe, û ez ketim



avê, û bi dû minre yeke yek Şêx û hevala dane dû min, ma li dor 10 mitra kû ez biğhim kenarê din, ji nişkave ez noqî bin avê bûm, min da sobayê bi xurtî ta nigê min erd girt, û bi lez min av derbaskir, min tiveng ji milî xwe avêtin, û min berê xwe da hevalan, min tû kes ji wan ne dît, noq bibûn bin avê, ji nişkave dîsa xwiya kirin, ez bi lez bi aliyê Şêx de çûm, min bi destê wî girt û kişand, û bi silametî me tevan av derbaskir, me berê xwe da gund mala hecî Reşîd, maleke pir hêjabûn, agir ji mere daran, em piçekê germ bûn, bû demê ber bangê, tayeke sar bi laşê min ve hat, min xwe kire bin lihêfê, hinek peya hatin cem me, yekî ji wan ji Şêx pirsî, kî hûn ji avê derbas kirin,..

Şêx gotiyê ehmedê Şûzî sê cara li avê xist, û em derbas kirin,..

Li Şêx veşerand, û got: pa bi xwedê ew serî ji cî ranake, vêga hinavê wî qetiyane di vê serma wekû qeşa de,..

Min serê xwe ji bin lihêfê derxist, û berê xwe dayê, min got: pa bi xwedê te derew kir, bi izna xwedê tiştêk ji min nayê, û ez ana nizanîm kû min li avê daye yan na,.. heval tev kenîyan.

Piştî nîro şaşan ji me berê xwe dan gundê Baneqesrê, û hersê hevalên me yên ermenî berê xwe dane gundê Hûrîzkê, me xatir ji hev xwest. em li Baneqesrê rûniştin, me nameyek ji xweyîbûnê re, bi tiştê bi mere çêbû nivîsî, û em li baneqesrê rûniştin.

Piştî mehekê bersiva me dan, û di nameyê de gotibûn, çaxê dunya xweş bibe divê dîsa hûn herin ciyê berê, bi namê re hinek

belavok rêkiribûn, me rabû muhra xweyîbûnê ya li cem me li belavoka xist, me şandin da bêne belav kirin.

Sala 1932 di meha Hezîranê de, xweyîbûnê dû name bi hev re ji mere rêkirin, di yekê de gotibûn: Arif beg û Adil beg digel hevalin Ermenî ji Îranê hatine gundê Mixsê, nêzîkî tixûbê Îranê ye, divê hûn herin wan bibînin, da hûn tevde rêya postê çekin di nav parçên Kurdistanê li Sûriye, Tirkiya û Îranê de,.. û nameya din bi zimanê Kurdî û Ermenî hatibû nivîsandin, û muhra xweyîbûnê û partiya taşnaq li ser danîbûn,.. û di binê danîbûn, em gelek spasiya we dikin û yezdanê pak arîkariya we bike.

Me karê çûnê kir, me 9 peya xwe girêdan ji bona çûnê, û me peyak rêkire gundê Hûrîzkê cem Lêvon paşa yê Ermenî, ji bo hersê peyayê xwe rêkê bi mere li gorî di namê de gotibûn.

Piştî çar rojan her sê peyayê Ermenî hatin cem me li Baneqesrê, roja dî bi despêka şibehê re em 12 peya bi rext û tiveng me da rê, û berê xwe me da ava mezin ji bo em derbasî aliyê dî bibin, em gîştin gundê

Rebîhiyê, peyak ji gund qaçaxî dikir, û hinek leşker di qereqola tirkî de nas dikirin, bi pera tişt derbas dikirin, ew ji mere bû rê nas, me 10 mecîdî danê, çû cem qereqolê, piştî bînekê veşeriyê, û em derbas kirin alê dîn ji avê.

Me rêya xwe girte bi meş ta em gîştin gundê Êrs, di gund de dubendî çêbibû, Şêx Ebdilrehman herdû bend li hev anîn û peyayên xwiya di herdû benda de rû yê hev maç kirin; wê rojê em mane li wir ta piştî nimêja Eşayê, me rêya xwe girt û berê xwe da gundê garisa yên Êla Şêx Ebdilrehman têdene.


Em dû roja mane li nav wan, û me rêya xwe bi gundê medresê xiste bi şev, û ji wir em çûne gundê Çoleçemka, ji wir Pênc şevan em dimeşîn û bi rojê me xew dikire di şikeftan de, ta em gîştin gundê Sempanîs, me peyak rêkire cem muxtarê gund, navê wî Şahîn bû, hate cem me.

Şêx jê pirsî gotiyê: ma Arif beg û Adil beg digel hevalên xwe li cem tene? Li Şêx veşerand: belê li cem min bûn, lê ji beriya heftiyekê çûne gundê Arincê cem Osmanê Endelîb muxtarê gund..

..... Dumahî heye.....

Welatê xwe nas bike

Mêrdîn



Mêrdîn (bi tirkî: *Mardin*) bajarekî Bakurê Kurdistanê ku îro dikeve Komara Tirkiyeyê. Bajarekî Mêrdînê ji başûrê xwe ve bi Rojavayê Kurdistanê, ji rojhilatê xwe ve bi Sêrt û Şirnexê, ji bakurê xwe ve bi Amedê û ji rojavayê xwe ve jî bi Rihayê hatiye pêçan. Hejmara niştecihên wê nêzî 850.000 kesan e. Qezayê bi ser ve ev in: Qoser, Nisêbîn, Midyad, Mehsert, Dêrika Çiyayê Mazî, Şemrex, Kerboran, Stewr û Rişmil.

Nav


Di dema persan de navê bajêr "Marde" bû, Di dema, Bîzansiyan de jî "Mardia" bû, Ereban jî navê herêmê kirine "Mardîn", Suryaniyan jî bajêr re gotine "Marde" (kela), Nav bi kurdî Mêrdîn e.

Dîrok

Mêrdînê, *Mardon*, *Mirde* an ku *Marde* yek ji navdartirîn û kevintirîn bajarê Mezopotamyayê ye. Bajar li ser çiyakî ava bûye. Keleha wê ya kevn, hemû rêyên bajêr bi xwe ve girê dide. "Mîrê Kelahan" hatiye gotin ji Keleha Mêrdînê re.

Di dîrokê de gelek qralan xwestiye wê têxe destê xwe, lê Keleha Mêrdînê rê nedaye wan. Bajar li başûrê keleha ava bûye. Xanî li du yên din, bi hevûdu ve hatine girêdan. Kevirên wan yê sipî û zer jî bo avakirinê hatine peyde kirin. Bajar, bi ava xwe ya hênîk û xwezaya xwe ya balkêş bi navdar e. Bakurê wê cihê bexçe û bostana ye.

Di dîrokê de ji bo bidestxistina bajêr şerên giran çêbûne. Berî çêbûna Mesîh, asuriyan û farisan şerên giran kirine. Demekê Romê li vir mane. Bi hatina îslamiyê, di dema Omerê kurê Xetap de, hatine bi ser bajêr ve, bajar kontrol kirine. Kurdan di dema Merwaniyan de bajar bi baştirîn şêwe îdare kiriye. Piştê Artukî li vir bi cî bûne. Bajar, bi aqilmendiya Idrîsê Bedlîsî, di dema Selîmxanê kurê Sultan Beyazîd de ketiye kontrola Osmanliyan.



Erdnîgarî

Bajar di nav paralelên 36° 54' û 37° 47' bakûr û merîdyenên 39° 55' û 42° 41' rojhilat de ye. Sînorên bajêr li bakûr bi Amedê û Êlihê ve, li rojava bi Rihayê ve, li başûr bi Qamişloyê û Amûdê ve û li rojhilat jî bi Culemêrg û Şirnexê ve tê girêdan.

Taybetiyên erda bajêr

Erda herêmê % 52,6 ji çiyay, % 24,6 ji deştan û % 22,8 jî ji platoyan pêk tê. Erda wê 177.200 metre kare ye. Li herêmê genim, ceh, nîsk, nok, pembo, garis û tirî tèn çandin.

Avhewa

Li başûrê herêmê avhewayeke çolî heye, ji lew re jî havînan pir germ û zuha, zivistanan jî sar û li hinek deveran jî hênîk derbas dibe. Dîmenek ji Midyadê.



Cihê erdnîgarî û sînorên bajêr

Kronolojiya bajêr

Berî Zayînê:

- 2000 - 1243, dema Huriyan û Mîtanîyan
- 1243 - 612, dema Asûriyan
- 608 - 550, dema Medan
- 550 - 312, dema Persan
- 331 - 312, dema Mekodonîyan

Piştî Zayînê:

- 197 - 395, dema Romayîyan
- 395 - 640, dema Bîzansiyan
- 640, dema Ereban
- 1202, dema Eyûbiyan
- 1515, dema Osmaniyan
- 1847, serhildana Bedirxanan

Germahî û barîna nîvekî ya mehane ji bo Mêrdînê (1975-2010)

| | Rêb. | Reş. | Ada. | Avr. | Gul. | Pûş. | Tîr. | Gel. | Rez. | Kew. | Ser. | Ber. | | |
|--------------------------|-------|-------|------|------|------|------|------|------|------|------|------|-------|---|-------|
| Bilindtirîn germahî (°C) | 6,1 | 7,4 | 12,0 | 17,6 | 24,1 | 30,8 | 35,2 | 34,8 | 30,3 | 23,1 | 14,5 | 8,1 | Ø | 20,3 |
| Nimztirîn germahî (°C) | 0,6 | 1,3 | 4,8 | 9,8 | 15,1 | 20,1 | 24,6 | 24,5 | 20,6 | 14,6 | 7,7 | 2,6 | Ø | 12,2 |
| Germahî (°C) | 3,1 | 4,1 | 8,2 | 13,7 | 19,7 | 25,8 | 30,0 | 29,6 | 25,2 | 18,5 | 10,7 | 5,2 | Ø | 16,2 |
| Barîn (mm) | 100,6 | 110,7 | 96,1 | 80,5 | 38,4 | 8,3 | 3,3 | 1,2 | 4,1 | 33,3 | 69,8 | 104,2 | Σ | 650,5 |
| Saetên bi tavîk (st/r) | 4,5 | 5,0 | 6,0 | 7,3 | 10,0 | 12,5 | 12,7 | 11,8 | 10,4 | 7,7 | 5,9 | 4,5 | Ø | 8,2 |
| Rojên bi baran (r) | 10,7 | 10,6 | 10,8 | 10,2 | 7,1 | 2,6 | 1,6 | 1,3 | 1,6 | 5,4 | 7,5 | 10,2 | Σ | 79,6 |

Çiyayên herêmê

Çiyayê bilind yê herêmê Cûdî ye (2.114 m). Alam (1.041 m), Ziyaret (1.160 m) û Dibek (1.231 m), Tûrcel û Pozê Bîra.

Deşt, zozan û gelî

Deştên Tilermen Qoser, Merdîn û Nisêbînê. Her sê deşt bi hev re girêdayî û di geliya çemê Xabûrê de ne. Dirêjbûna deştan 35 km û firehbûna wan jî 20 km ye.

Çem û Gol


Çemê herî mezin ku di nav sînorên bajêr de diherike Çemê Dicle ye. Buxur, Zergan, Ava Spî, Reşan, Çaçan û Gumuş jî çemên din yên herêmê ne. Gol li herêmê tune ne. Tenê li ser çemê Buxurê ji ber bendava Buxurê goleke sînî çêbûye.

Babetên heywanan

Herêma ji alî heywanan ve ne dewlemend e, rovî, kîvroşk û balindeyên kovî kewokê teqle ê Mêrdîn di cîhanêde deng dane. Ji sedî pêncî mirovê Mêrdîn Kewoka xwedî dike. Kewêgozel u kevêsusik cihekî girîng digrin di zinarê Mêrdînde. Her cureyê şahilî û bilbîla li ser kelaya Mêrdîn hene. Di sala 1998 de keftariyê ji aliyê neçîrwanên Merdinde hate dîtin û kuştin. Li Dêrka cayemazî cureyekê teyrêbaz heye ku li cîhanêde tenê li çiyayê Dêrikê turcelê pêde dibi.

Gelhe û navçeyên bajêr (2000)

- Mêrdîn (navend) (bi tirkî, Mardin), 108.340
- Kerboran (Dargeçit), 27.611
- Dêrika Çiyayê Mazî (Derik), 55.278
- Qoser (Kızıltepe), 183.475
- Şemrex (Mazîdag), 27.434
- Midyad (Midyat), 128.085
- Nisêbîn (Nusaybin), 103.863
- Mehseret, (Ömerli) 14.584
- Stewr (Savur), 34.402
- Rişmil (Yeşilli), 22.026



Tevayî nifûsa herêmê (tevî gundan) 705.098 e .

Aborî



Dîmenek ji Kolana Yekê ya Mêrdînê, 2010

Binerd

Li herêmê fosfat, çimento û malzemên ji bo tûxla û kiremîdan ji bin erdê dertên.

Cihên turîstîk, dîrokî û gerê

Bajar ji alî xwezayê ve ne pir dewlemend e. Tenê şelala çaxçax ji alî gel ve wek ciyêk seyranê tê bikaranîn. Kela Mêrdînê, mizgeftên bajêr, dêr û dêrên herêmê ji ji alî gel û turîstan ve tînan serlêdan kirin.

Germavên Kerboranê, germav (gurmî av) carna 40° germ dibe û ji bo nexweşiyên çerm û romatizma yê baş e.

Çand û huner

Ol û civak

Mêrdîn ji alî ol û civakê ve bajarekî mozaîk e, Piraniya gelheyê ji misilmanan pêk tê, lê li herêmê xiristîyan û êzîdî jî hene, Misilman ji mezhebên henêfî û şafîyan pêk tê .

Civaka herêmê jî ji kurdan, ereban, suryaniyan û ermeniyan pêk tê . Bajarekî Mêrdîn bi pirçandîbûna xwe tê nasîn . Li wir ereb, kurd, suryanî û ermenî hene. Dêra Zehferanê di sedsala 11, pêve navendî ji petrikên suryaniyan re kiriye, Ji bilî wê, dêrek din bi navê Şehîde Şimûnî heye, Li başurê bajêr dêra Mar Mîxayêl Nasîk, û ya Mar Bitris hatine avakirin.

Li taxa Şemsiye, dêra Meryema ji Erdemê, pir bedew hatiye lêkirin. Dêrên din ev in: Mar Banham, Mar Tuma, Meryem, Mar Afram, Mar Osyo, Şehîd Hurmîz...

Bajarê ziman û ol û çandên cewaz Mêrdînê, ji bo ku cihê xwe di programa Unescoyê ya Mîrasa Cîhanê de bigire, serî li Unescoyê hatibû dayîn.

Unescoyê, piştî lêkolînên xwe serlêdan pejirand, Mêrdînê wek berendam kete rêza cihên parastinê, Piştî ku berendamtî hate pejirandin, belediya bajêr ji bo rêlêgirtina avahiyên bê plan programek ji xwe re çêkir.

Xwarinên herêmê

Li herêmê savar û xwarinên ji savarê bêhtir tînan xwarin, wekî savara bi darçîn û bacanreşkê. Seletiya hinaran, şorbeya mast, ecîn û kutilkên dagirtî (basmat, li herêmê ji yê di nav rûn û hêkan de sorkirî re dibêjin "irok") Rişte û kibe (hûr û rodîyên dagirtî) jî ji alî gel ve tê xwarin. Wekî din mirîşka bi gîjnîyê birajtî, sembîsek (lehmacunê sergirtî), beloh (xwarineke weke qisirê ye), serûpê û hûrê hîşandî jî di nav xwarinên deverê de ne. Li ber xwarinan, dew tê vexwarin. Li herêmê qehweya tal (mirra) jî xwedî cihekî taybet e.

Arxavk, Biraşka goştê kişandî ya Mêrdînê, Boranîka siyaleyê, Darûziyafe, Deverûn, Ecîn, Keledoşiya masiyê, Kilora şilavkî, Kuftetirş, Kutilka bacanreşkê, Kutilka dîlanê, Meftuneya bacanê, Muhamere, Mêlak bi savarê, Parxana Mêrdînê, Qeyxaneya Mêrdînê, Sembîsek, Sênîkufte.

Kincên heremê

Keçên ciwan kefiyên rengîn, yê pîr jî yê spî didin serê xwe, Li hinek deveran wekî li Dêrikê jin kitanên dirêj didin serê xwe. Fîstan herî pir li herêmê tê li xwe kirin.

Goreyên ji hirî û lastîkên reş di lingan de hene, Xemilandineke taybetî jî li herêmê "deq" e. Jin deqên şîn li ser rû yan jî destê xwe dikin, Şalwar û entariyên spî û dirêj cilên zilaman yê heremî ne. Îşlik û êlegên bê yaxe di ser şalwar de tê li xwe kirin. Di serê zilaman de "egal" an jî "çeffî" heye. Şewqe jî carinan tê bikaranîn, Qondere di lingan de heye .




..... Ji wikipedia kurdî

Hevpeyvîna Pênûsa nû bi dengbêjekî civaka Êzdî,

Hevpeyvîn: Kemal Tolan

TETERÊ ELİYÊ MAMED RE!



Dengbêj Teterê Eliyê Mamed û K.Tolan

Li goriya dîtina min, gava meriv dîroka xwe ya kevn baş nas neke, meriv nikare dîrokeke nû jî rast baş biafirîne. Lewma jî divê em dengbêjî û wêjeya Kurdî, ya ku bi devkî hebûna dîroka gelê Kurd di nav xwe de didexwanê û parastîye baş nasbikin. Bi dîtina min û mixabin, pîraniya zargotina me Êzdiyan ji ber hûnera dengbêjî û çîrokbêjên me Êzdiyan ne hatiye nivîsandin û pîraniya dîroka gelê Kurd di singa bav-kalên me yê ku kiras guhastine de jî ketiye bin erda sar. Her weha dagirker û gelek kevnepereştên Kurdistanê jî, hebûna dîroka dengbêjî û çîrokbêjên me Êzdiyan ji bona berjiwendiyên kesayetî û desthilatdariya xwe bi hemd guhastine.

Vêca ji bo hunera dengbêjî, serpêkhatî û zargotina me, ya di singa kurê dengbêjekî Êzdî, yê ku berê di nav herêma Kurdên li derdora Xerza (Misircê, Batman, Qubînê) û deşta Amedê diman de gelekî navdar bû, weka ya gelek bav-kalên me yê ku kiras guhastine winda nebe, ez û birayê xwe Hizer, di roja 25.04.12 de, çune bajarê Friesoythe mala Teterê Eliyê Mamed (Acar). Ez zahf kêfxweşim ku min hêja di sala 2000 de jî çend sitran ji ber dengê Teterê Eliyê Mamed girtibûn û ew hingê di nav pirtûka xwe ya bi navê „Hebûn û Tûnebûna Êzdiyan Tev Romanên Zindî ne, di rûpelen:62-64 û 74 de weşandin Min ev hevpeyvîn li ser casetekî vidio yê tomar kiriye û li goriya îmkânên xwe nivîsandîye. **Ezê ji bo rêzgirtinê û di dewsa rêzdar dengbêj Teterê Eliyê Mamed (Acar) de bibêjimê Xalê Teter.**

Kemal: Xalê Teter beriya her tiştî, ez dixwazim tû xwe bi xwandevevanan bidî nasandin. Ka Teter Acar kî ye, tû ji malbeta kîjan Mirîdayî, Xwedanê binemala we çiyê, zaroktî û jiyana te li kîjan gundan derbasbuye?

Teter: Belê xwarziyê Kemal, ez gelekî memnûn bûm ku hûn îro hatine mêvaniya min û hûn li ser çavan re hatine!

Ez kurê Eliyê Mamed im, ji malbata eşîra Anqosiyân û ji binemala mirîdên Dîwane me. Bav-kalên me, berê li gundê Batranê, yê ku niha hêjî di nav herêma Xerza de, li piştta gundê Zoqê û girêdayî bajarê Misircê (Kurtalan) ye diman. Lewma ji malbata me ra hêjî dibêjin, Batranî.

Li goriya ku ji min ra hatiye gotin û ez texmîn dikim, ez di sala 1938 de li gundê Bazbût (Atbagi)ê, yê ku niha hêjî di nav herêma Qubîn-Batmanê de ye, çê bûme. Dûre mala me heşt salan li gundê Zêwîka Xaço, ev jî nêzikî Bazbutê ye, maye. Ez li gundê Zêwîkê zewicîme û ji virê jî 2 çume xizmeta leşkeriya tirkîyê kiriye. Di vî wextî (1958?)de, ji xeynî mala me, wekî dinê tu malên Êzdiyan li Zêwîka Xaço tûne bûn. Lê hingê, di gundê Zêwîkê de sê-çar malên Xirîstiyanan (ya Apê Îsa, Jinapa Baran û Apê Arakêl) û çend malên Elikiyân hebûn.

Kemal: Xalê Teter, tê bîra te, di wexta zarokatiya te de kîjan gundên Êzdiyan li derdora gundê we hebûn?

Teter: Belê, wextê mala me li Bazbûtê û li Zêwîkê bû, hingê gelek gundên Êzdiyan yê min: Feqîra, Çinêriya, Kevezoya xwarîn û ya jorîn, Gêduk, Dêrik, Şihê, Şimiz, Şahsim û hwd, hebûn. Jiyana me ya li Zêwîkê tev bi cot, paleyî û rençberîyê derbas dibû.

Kemal: X.Teter, tû qet çuyî dibistanê, eger na ji ber çê tû neçuyî ?

Teter: Na, min mektebe ne xwandiye. Ji xwe di dewra me de, me zarokan ji ber cotkarî, rênçberîtiya gundîtiyê û alîkariya debara mala xwe nikarîbû herine dibistana. Hingê, dibistan jî di gelek gundan de tûne bûn.

Kemal: Xalê Teter, piştî ku te xizmeta leşkeriya tirkîyê xilazkir anjî berê hingê, tû qet diçuyî bajarên Tirkan dixebî, sebebê ku çibû anjî tû neçuyî bajarên Tirkan ne xebitî çine?

Teter: Belê, ez ji sala 1973 heta 1979 an gelek caran û hercarê jî sê-çar mehan diçûme Antaliya û Edenê kar dikir.

Kemal: Xalê Teter, gavat tû hafî Almaniya yê, hingê tû çend salî buyî?

Teter: Ez di sala 1979 de hatime Almaniya. Demek ez hingê 41 salî bû me.

Kemal: Xalê Teter, çima û ji ber çê tû hafî Almanya yê?

Teter: Bi Xwedê, di welatê me de gelek tahdeyî û zilm li me Êzdiyan dihatine kirin. Me Êzdiyan nikarîbû di nava Batmanê de bibêjin, em Êzdî ne. Di nav bajarên Tirkan de jî, heta ku me nas ne dikirin, tu dahdeyî li me nedikirin. Lê, wexta ku Kurdan digotene tirkan ev Êzdî ne û ewan pê derdixisten ku em Êzdî ne, êdî kesî ji tirkan jî şixwil (karê) xwe ne dida me.

Mînak:

Carekê, em hinekî Êzdî û Bisilmanên li der û dora Batmanê diman, bihevûdinê ra û bi dû otebusen tijî çûne Edenê kar. Me mehekê bi hevûdinê re karkir, lê berî ku karsaz miaşê me bide me, hinek ji wan Bisilmanên ku em bihevûdinê re hatibûn, çûn gotine karsaz, felankes û felankes Êzdîne û karsaz jî heqê meha me kesên Êzdî ne da me. Em wê mehê, wisa bê pere û birçî hiştin. Me ji tirsra re nikarîbû cardinê herin dahwa perê xwe li karsaz bikin.

Kemal: Xalê Teter, tû dikarî niha hinekî bahsa serpêkhatiyên xwe yê hingê tû hafî Almanya yê bikî û ka hûn hingê bi çî zahmetî dihatine Almaniya yê?

Teter: Gava ez cara yekemîn di sala 1979 de hatime Almaniya rojava (BRD), min hingê çarsalan bê bidestûr li Almanya karkir û dûre ez mecbûrbûm di sala 1983 de vegehiya me Welat. Ez di sala 1985 de cardinê hatime Almanya yê. Hinga em li balefra bajarê Berlîn peya bun, hingê polisên Alman em girtin û dîsa berdan. Lê hinga em hatin di nava Almaniya rojhilat (DDR) de derbasbûn, em cardinê hatine girtin û ewan jî em şandine kampa panaberan ya li bajarê Braunschweig'ê. Em mehekê li vê kampa Braunschweig'ê man. Ji wirê jî em şandinê kampa bajarê Norden (nêzikî Aurich)ê. Gav sê mehên me li Norden qediyân, ez çûme mala keşeyê dera Norden'ê, min jê ra got ku em Êzdî ne. Pîreka min li virê bi tenê ye, kesî ku em wan nasbikin li vî bajarê we tûnin û ez lavan ji te dikim, tû karîbî me bişînî nav çîhekî ku ber û pismamên me lê hene! Xwedê ji wî camêrî gelekî razî be, ewî em şandine vî bajarê Friesoythe. Gava em hatine vî bajarê Friesoythe û me hinek nasên xwe yê min Sediqê rahmetiyê Xalit, Hizêr Tolan û hwd. li virê dîtîn, bîhna me jî hinekî derket û em eva 27 heft salan li vî bajarî ne. Ez li vî bajarî qet ne xebitî me.

Kemal: Xalê Teter, weke ku ez di nav zargotina me de gelek caran dibihîzim, rahmetiyê bavê te jî, berê li bakurê Kurdistanê û bitaybetî jî di nav civaka Êzdiyan li herêma Xaltiyân (dêdore bajarê Batman, Qubînê, Misircê, Sêtertê û hwd.) de dengbêjekî gelekî bi nav û deng buye. Tû dikarî ji me ra bibêjî, ka rahmetiyê bavê te kî ye, Zaroktî, jiyana rahmetî li kîjan gundan derbasbuye û ewî di kîjan sale de kirasguhastîye?

Teter: Bila rahma Xwedê li miriyê xwandevevan, guhdaran û bavê min be jî!

Bavê min Elî kurê Mamed e. Texmîna ku ez dikim, rahmetiyê bavê min di 1903 de li gundê Bazbûtê hatîyê dinê û di sala 1969 de jî çuye ber dilovaniya Xwedê. Mezeli wî li gundê Feqîra, yê ku di nav herêma bajarê Batmanê de ye Raste, di wî wextî de û di herêma me de, dengbêjê ku li tayê rahmetiyê bavê min Eliyê Mamed derketa gelekî kêmbûne. Min didît, gava bavê min ji mal derdiket, carnan jê bi mehan ne dihate nav mala xwe.

Mînak:

Wexta rahmetiyê bavê min, xalê Hesînê Çeto û hwd. li cîmaatê de bihevûdinê re bi gelek sihetan distiran, kesî ne dixwast ji civata wan derkeve.

Dîsa gava bavê min biçuya cem maqûl, axa, begên Kurd, bi taybetî jî tevaya gundên Êzdiyên û zêde jî yên li herêma Diyarbekir hebûn, mala apê Birahîmê Rizgo, dengbêjê wê herêmê, yê mina rahmetiyê Evdilhadî dihatine cem û ewan bi gelek rojan kilam bihevûdinê ra digotin. Bavê min ne tenê di herêma me de navdar bû, ew diçû hemû herêmên Kurdistanê û ewî di herciyê de bêtirs disitra.

Navên hinek dengbêjên ku hingê, navên wan hebûn û niha nave wan têne bîra min ev bûn:

Rahmetiyê bavê min timî digot, Îso yê File yê ku li gundê Zêwîka Xaço dima, gelek kes li ba xwe hînî kilamên folklorê û dawetan Kurdî dikirin. Yanî Îso yê File, Usivê Dengbêj, Hesînê Çeto, Birahîmê, Erebb, Usivê Beso(ewî camerî jî gelek kilamen bavê min digotin ...) û hwd.

Kemal: Xalê Teter gelek kes dibêjin, rahmetiyê bavê te- xalê Elî yê Mamed, bi hûnera xwe gelek sitran li ser buyer, qewimîn, serpehatî, şer, wêranbûn, mêrxasî, evîndariyê û hwd. hûnandîne û ew xwedî taybetmendiyeke gelekî mezin buye. Tû dikarî hinekî bahsa wê hûner û taybetmendiya Xwedê jê raziye bavê xwe bikî?

Teter: Taybetmendiyeke dengbêjiya rahmetiyê bavê min ev bû:

Berî ku bavê min dest bi sitran anjî kilamekê bikira, ewî pêşîn çiroka bûyer, qewimandî, serpehatî, şer, wêranbûn, mêrxasî anjî evîndariya ku sitran ji berê hatiye afirandin, şîrove dikir û dûre hêja sitran anjî kilam bi dengê xwe digot.

Mînakek: **Buyera afirandîna kilama Emînê Ahmed**

Rahmetiyê bavê min digot: Di wê dema ku mahcer hatine herêma Bişêriyê, hingê Tewfîq û Nefîya xwa xwe, tevî êla xwe ve ji welatê Serhedê bi koçberitî hatine gundê Keferzo û xwe li Emînê Ahmed girtine. Nefîya xwa Tewfîq, qîzeke koçer(Bêrtî) buye û ewê dûre dil berdaye Emîn. Lê, haya Emîn ji vî evîndariya Nefîya tune buye . Hinga ez rojekê di nav konên êla Tewfîq de derbas dibûm, min dît Tewfîq hate pêşiya min û ewî ez birime oda Emîn axa(**Emînê Ahmed**). Piştî heftiyekê, hinga ez rabûm werime mala xwe, min li ser rêya pişt mala de dît ku, va jineke li ser devê rêya min sekiniye. Dema ez nêzikê wê bûm, min dît ew Nefîya ye. Min gotê Nefîya, te xêre û tû çidîkî li virê?

Nefîya got: Xalê Elî, bi Xwedê ez li hêviya te me.

Min gotê, xêre ?

Ewê got , xalî Elî, min didît ku tû dihatî mala Emîn û tû dengbêjê Emîn î. Ez ji te lavedikim ku em niha li virê rûnên. Ezê kilamekê ji te ra bibêjim û lavan ji te dikim ku tû vî kilama min li ba Emîn tenê bibêjî!

Min gote Nefîya, keremke û wê rabû ew kilama ku ewê ji bona bavê Şikrî afirandiye ji min re got.

Gava ewê kilama xwe qedand pê ve, min jî hima di cîde û ji ber xwe ve sê çar malik bi ser kilama wê ve zêdekirin .

Nefîya jî got: Xalê Elî, Xwedê ji te gelekî razî be û te niha dilê min gelekî rehet kir.

Dûre Nefîya dest avîte kîsikê di ber xwe de kişand, zêrekî reşatî ji nav derxist, ew kire nava destmalekê û tevî cotek gorên ku wê ji rîs çêkiribûn dane destên min. Got: Ev xelata te ne, lê ez di bextê te deme, tû yê vî kilama min ji Emîn ra bibêjî.

Min jî soz da Nefîya ku, ez tamamiya vî kilama wê li cem Emîn bibêjim û ez çûme male .

Piştî çend rojan, ez cardinê hatme mala Emîn axa . Min dît ku, wa Emîn û Wesîla pêreka xwe li şaneşîna serê qesra xwe rûniştine.

Gava Emîn ez dîtîm, gazî min kir û got Elî were, vêga tiştê di berîka te de heye!

Ez jî çûm li şaneşîna serê qesra wî û li kêleka Emîn rûniştîm .

Wesîla jî, rabû qahweyek ji me ra çêkir û me qahwa xwe vexwar .

Dûre min gote Emîn, bi Xwedê û bi rastî jî tiştê di berîka min de heye, lê dernayê !

Emîn got: Elî, çewa dibe ku tiştê di berîka merivde hebe û dernayê?

Min gote Emîn: Heyran ez çiqas destên xwe davêjimê, lê ew dernayê.

Emîn fahmkir û gote min:De Elî tû niha here malê, ezê dûre dîsa bişînimê dû te

Gava ez sê rojan li malê mam, xeber ji min ra hat û gotin: Emîn gotiye bila Elî ne sekine were cem min.

Ez rabûm û hatim, min dît wa Emîn, hespek ji bo min zînkiriye û gote min: De siwarê ez û tû emê herine Qubînê.

Em li hespan siwarbûn û me berê xwe da Qubînê . Çaxê em gihîştine serê qêrê ku di navbêna gundê Gêdûkê û Qubînê deye, Emîn ji min ra got:

Wa Elî! Tû bidî xatira Xwedê, hinga ku te wê rojê got, tiştê di berîka min de heye, lê dernayê, mahne ya wê çibû?

Min gote Emîn, belê ez dikarim niha wê ji bîrîka xwe derxînim .

Emîn gote min, de keremke wê derîne !

Wela çaxê ku ewî wusa got, min jî gotê, de keremke ka em ji ser pişt hespan peyabên. Gava em peyabûn, min destên xwe kirine kerika guhên xwe û min ev kilama weha jêre got :

HA WER DELAL !

Ha wer delal....Ha wer delal...Ha wer delal, lo ha wer delal..

Bavê Şikrî siwarê sîqal, heyran çiyayê gundê me bilinden, çima lo nizim nabe?,

Kum û keweje Bavê Şikrî siwarê sîqal , heyra keveje lo xwiya nabe.

De hine berfa Helazgerê, Melazgerê deyne ser kezeba xwe, cendê bavê Şikrî lo hênîk nabe

Îro serê sê rojan Tewfîq ji min xeyîdiye, lo bi min ra xebnade

De ha wer delal tû delalî dîno êw....!!

De re ha wer delal....Ha wer delal...Ha wer delal, lo ha wer delal..

Bavê Şikrî siwarê sîqal, heyran bi hafa darî Qolîbabê ronî diketim, dar kevote

Xwezîka serê min û bavê Şikrî li ser nazbalgîk û nepenîka bibuna cote

Cote kewê gozel ji Bîrika Simo derketa, li ser serê min û bavê Şikrî maqûlê Remaniyê lo bihev gote

De ha wer delal tû delalî dîno êw....!!

De re ha wer delal....Ha wer delal...Ha wer delal, Ha wer delal, tû delalî..

Bavê Şikrî heyran, eva serê sê rojan nexweşim,

ez çiqas çavê xwe digerinim lo te li ber serê xwe nabînim.

Dibê bavê Şikrî çuye Kevezzo, Kevezzo, Bazbûtê, Gêdûkê ser demanê,

Ji bo ku bavê Şikrî çend zêran ji zêrê enzel tê de karke,

Şal û şapikê bavê Şikrî herine Hamûda şewitî, vî sibekê pê qeytankin

De ha wer delal, ha wer delal, ha wer delal, tû delalî dîno êw....!!

Lo lo bavê Şikrî, mala te şewitiyo!

Min te divê, çima tû min navê?

Ez di bextê we de me, hûn min bivine Kevezzo xwarî, koçka xwarî, olya jorî û lo olya navîn

Wele, serê min here ber zatûrê, lo ber celadê

Min zêdey bavê Şikrî, maqûlê Remaniyê, kesek navê !

De re ha wer delal...Ha wer delal...Ha wer delal !

Heyran,Hatî ava çemê Bişêriyê,

Min dî qeyikçiyay qeyikên xwe hazirkirine, dane dîv gemiyê

Tev jî dizanin, xortanî xweşe lo bi ezepiyê,

Koçerî xweşe li deşta minalixê, zozaniyê,

Ezê biqefêlim Qurê, Serpirê hafa Zeynaliyê,

Xwezî min bavê Şikrî magûlê Remaniyê,

bi dîtina li Şane Şînê, lo li oliyê !

Ez nizam rebê Alemê ji min re li hev neyne,

ezê sala berî vî salê bivime kelemê çavê Wesîla Xelef, lo bi hewîtiyê

De ha wer delal, ha wer delal, ha wer delal, tû delalî dîno êw....!!

Vêca, gava bavê min kilama xwe xilaz dike, Emîn jê ra dibêje, Elî te ya xwe got, de vêca ez jî niha niyeta xwe ji te ra bibêjim; Raste, Nefîya jineke zahf delal û ji Wesîla pêreka min jî çêtire. Lê feqet, Elî tû bixwe jî dizanî ku, di pêşiya min de Hesoyê Birahîm, Xelîlê Simê, Cemîlê Çeto û Qasê Ozman ev tev axa bûn. Tû dizanî, çima Tewfîq û Nefîya ne çûn xwe li yekî ji wan negirtin û hatin xwe li min girtin?

Vêca, qey ji min ra çêdibe, ez rabim bi qîzeke gundiyê xwe ra bizewicim? Ne ez, mîna bavê wan tême hesabkîrin û ji min ra dest nade....

Jixwe pir kes jî dizanin ku, bavê min(Mamedê Elî) ev kilama di sala 1930 de, li ser daxwaza Nefîya ji bo Eminê Perîxanê ji hiş û ji ber hûnera zanîna xwe hunandiye. Gava bavê min ev gotiye pê ve, hêja li nav gelek civakan û li gelek herêman ku Kurd lê hebûn belabuye. **Duahî Dike**

Can kurd



NIZAR QEBBANÎ (Sûrî ye)
Di riswakirina Seddam Huseyn da
Şergeha U'robotê
Ke nok-girînok bû şergeha kendavê



-2-

Ez bizavê dikim bo resimkirina welatina..
 Bo wan parlemanek ji yasemîne hebe
 û gelekî [netewek] tenik ji yasemîne hebe.
 Qumriyêd wê li ser seriyê min razin
 û azangehên wan di çavêd min da bigirîn..
 Ez bizavê dikim welatina biresimînim,
 ku bi bin dostên helbesta min
 û nakeve di navbera min û gumanên min da
 û tê da leşker di ser eniya min ra nagerin.
 Ez bizavê dikim welatina biresmînin..
 Gava min hozanek helbestê nivisand ew min xilat bike
 û min bi bexşîne, gava çemê dînbûna min bilehe.

-3-

Ez bizava resimkirina bajarekî hezkirinê dikim..
 ku ji hemî girêkan azadkirî be..
 ku tê da mêbûnê serjê nakin..
 û govdeyî bînpê nakin...

-4-

Min bi başûr ve.. Bi bakur ve koçkir..û bê hode..
 Çiku bo qehweya hemî çayxanan, yek tamzarî hebû..
 û bo hemî jinan - gava xwe tazî dikin
 yek bihin hebû..
 û giş mêrên êlê xwarinê nacûn
 û jinan di yek kitekê da dadiqurtînin.

-5-

Ez ji destpêkan da bizavê dikim,
 ku ez wek kesekî nebim..
 Min peyvîna qutîkî [girtî] her dem ne pejirand
 Min perestiya her pûtekî ne pejirand.

-6-

Ez bizavê dikim,
 Ez hemî metnên, min li xwe kirîne, bisotînim
 Çiku hinek helbest gor in,
 û hinek ziman kefen in.
 û min soz da mêjina tev paşîn..
 Lê ez paş derbasbûna demê hatim..

-7-

Ez bizavê dikim, xwe ji bêjeyên xwe bişûm
 û ji nifirîna „Mubteda û xeber" (1)..

xelek 3

û ez toza xwe jî daweşînim
 û ez rûyê xwe bi ava baranê bişûm
 Ez bizavê dikim dev ji deselatiya qûmê berdim..
 Bi xatirê we Qureyş (2)
 Bi xatirê we Kuleyb..
 Bi xatirê we Muder..

-8-

Ez bizavê dikim welatina biresmînim
 Wan -bi mecazî- bi welatên Ereban navdikin
 Têda razanga min ciyê xwe girtiye
 û seriyê min têda cî girtiye
 Da ez cudahiya di navbera welatan û keştiyan da binasim
 Lê belê wan qutîka resmîkirinê ji min birin
 û rê nedan min ez rûyê niştiman biresmînim

-9-

Ez bizavê ji zarotiyê da dikim,
 ku valahiyekê [asîmanekî] ji yasemîne vekim
 û min yekemîn hotêla evîne avakir..
 Di dûroka giş Ereban da..
 ku xweşhatina dildaran bike..
 û min hemî cengên berê ji ortê rakirin..
 Di navbera mêran..û di navbera jinan da..
 û di navbera qumriyan da..
 û ên ku qumriyan serjê dikin..
 û di navbera ruxamê [kevîrê sipî] û ewên,
 ku sipehiya ruxamê birîn dikin..
 Lê belê wan..hotêla min girtin..
 û gotin, ku evîn ne layîqê kevnewariya Ereban e..
 û paqijiya Ereban e..
 û kelepûra Ereban e..
 Heylo çi ecêb e !!

-10-

Ez bizavê dikim dîmenê niştiman bipêjinim?
 Ez ser ji nû ve ciyê xwe di danga [rehmê] dayika xwe da bistînim
 û ez tersî ava demê avjenîne bikim..
 û ez hejîrina, behîvina û hêrûkîna bi dizim,
 û ez wekî çivîkan li pey keştiyan bi bezim
 Ez bizavê dikim, ku bihiştta Eden bipêjinim
 û ezê çawa îcazeyê xwe di nav çemên Eqîqê da derbas bikim..
 û di nav çemên mêst da..

û gava ez hişyar bûm.

Min gevşbûna xewna xwe naskir

-11-

Ez bizavê bi helbestê dikim,

Ewê ku çare lê nabe bi destxînim...

û ez [darên] xurmê biçînim...

Lê hema li welatê min, porê xurmê kurr dikin...

Ez bizavê dikim,

ku hîrhîra hespan bilindtir bibe

Lê xelkê bajêr hîrhîrê kêmbiha di bînin!!

-12-

Ez bizavê dikim -xanima min- ez ji te hezbikim...

Derveyî hemî tiqûsan...

û derveyî hemî metnan...

û derveyî hemî rêbaz û sisteman

Ez bizavê dikim -xanima min- ez ji te hez bikim...

Di her nebedgehekê da,

ku tu çûyîyê.

- Da ez pê bi hoşim-

Gava ez reojekê te hemêz bikim sîngê xwe,

ku ez axa niştiman hemêz dikim...

-13-

Ez bizavê dikim,

Hîn ez î zaro bûm,

ku ez her pirtûkekê bixwênim,

li ser pêxemberên Ereban.

..û li ser hişmendên Ereban..û li ser hozanvanên Ereban...

Lê min ji qesîdena [helbestina] pê ve ne dît,

ku lingê xelîfeyî dialêsin,

Bo mistek birinc...û pêncî Dirhemana (3)...

Heylo çi ecêb e!!

û min ji êlana pê ve ne dît,

ku goştê jinan û xurman ji hev cihê nakine..

Heylo çi ecêb e!!

û min ji rojnamena pê ve ne dît,

ku cilên xwe yê binî ji xwe dikin,

bo her serokekî ji nehanê ve tê.

û bo her serhêzekî, ku di ser laşê gel ra dibore...

û bo her fayîzxurekî,

ku di pençên xwe da zêr dide ser hev...

Heylo çi ecêb e!!

-14-

Ez ji pêncî salî ve

Rewşa Ereban berçav dikim

û wan dixumxumin û baranê nadin

û ewan dikevin cengan û jê dernakevin...

û ewan çermên belaxetê (4) dicûn

û di zikên xwe da nahêrin...

-15-

Ez ji pêncî salî ve bizavê dikim

Welatina biresmînim,

ku - bi mecazî- bi welatên Ereban navdikin.

Min carina bi rengê rehan resimand

û carina min bi rengê xeydê resimand

û gava wênekirin çû serî,

Min ji xwe pirsî:

Heger rojekê mirina Ereban aşkere bikin..

Wê wan di kujan goristanê da veşêrin?

û Kî yê bi ser wan da bigirî?

û bo wan dot [keç] nînin..

û bo wan kur nînin...

û ne jî şîrî li wir heyê

û ne jî kesekî şîriyê bike heyê!!

-16-

Ez bizavê dikim

Ji dema min dest bi nivisandina helbestê xwe kiriye

Ez maweya di navbera min û bavpîrên xwe yê Ereb da bipîvim

Min leşkerin dîtî..û ne ti leşker bûn.

Min fetih [serketin] dîtî..û ne ti fetih bûn.

û ez bi hemî cengan ra gêro [mijûl] bûm, li ser şaşka televîsyonê

û serketinek ji Xwedê da ji me ra tê..li ser şaşka televîsyonê...

-17-

Hey niştê min : Tu kirin zincîrkek tirsandinê

Em li êvarî bi bûyerên wê ra mijûl dibin

Pa emê te çawa bi bînin,

Heger kehrebe [cereyan] birrîn?

-18-

Ez..Paş pêncî salan

Bizavê dikim, ewê min dîtî tomar bikim...

Min gel in dîtî ji wana ye,

Ku merivên Mebahês [polîsên sîvîl] fermanek ji Xwedê ne...

Wek serêşê...û wek sermê...

..û wek birîna reş [cuzamê]...û wek girrîyê...

Min dît, ku Erebîtî li bazara pertalên kevnare hatiye raxistin...

Lê min..Ereb ne dîtî!!...

(1) Mubteda û Xeber ji rêzimanên erebî ne [Mebesta wî giraniyên ji aliyê zimanzanan ve , ku li ber nivîskar tîn dayîn]

(2) Qureys, Kuleyb û Muder êlên Ereban ên di dûrokê da bi nav û deng in.

(3) Dirhem wek pareyên yûnanî Diraxma yê berî derketina Euro..

(4) Belaxet û Fesahet: hêzdariya zimanî ne..Li ba Ereban peyvîn her bi hêz e



Xorşîd Şûzî



GOGÊN AĞIR

Gogin ji agir dihatin gerandin
 Şagirtiyê bê hêlik bi wan dilîstin
 Ewin leşkerên rengîn wekû pûştan
 Derxistina ruh û can karê wan
 Bi feremanên diktatorekî bê ziman
 Bi zoriyê paytexta Şama şerîf daqurpan
 Di kozîdana wîde xwîna millet tê rijan
 Dişîne buhiştta bi sozê derew avakiriye

Şepî digerin... û ... digerin
 Bi sê nîşanên muqeddes sûnd dixwin
 Li ser çengê firokên kuştinê datînin
 Bi jor dikevin diçin nav ewran
 Bi awazên "yekîtiyê" bumba dişînin..

Bi qamçîrên "azadiya" rengîn dipeqin
 Di dojeha "reşbelega sermedî" de
 laşan dipêjin

Bê rûmet bi gogan dilîzin
 Bi jêkirina seriyên şa dibin
 Wekû karwanên qantira rê digrin

Xirakirin û kuştin belav dikin
 Di bin topan de Xanî û mirov dikevin
 Li ser meriv û cîrana têne ruxandin
 Mixabin wêneyin bi êş têne dîtin
 Hêsin zuha diçavan de dinalin

wa bazirganê xwîn mij?
 Ma e ve jîna di pirtûka tede..
 .. hatiye nivisandin?

Di rûpelên wêde şîna dibe..
 .. xwelî û wêran

Bi topên te berebat bûn..
 .. razê malan

Xwe diparêzin bi nalîn û hisbûn
 Zarok ji kefenê xwe derdikevin
 dergûş bûne gorên perçê laşan
 Bihinefişk ketiye kezeba dayikan
 Dinalin li ser windabûna..

.. zarok û malan

Golên xwînê li herderî vedan
 Dilê min dagirt bi lehiya derdan
 Li ser bargiraniya salan Hêsin bariyan
 Çawa dezgeya bê bextiyê hertişt kir talan
 Gogek bê ol nêzikî min hate gerandin
 sergon bûn beşên min bi bazdan..

Ji destê min xwe çen kir pêûsa min..
 Di nav kulê min de hate veşartinin

Ehmed Mustefa



WELATÊ MIN

Navê welatê min kuştin
 Birîn zêde li dil kur kirin
 Dar û merxên me şewitandin
 Gîya û zozanên me çelimisandin

Nanê me ji me dizîn û birin
 Gund û bajarên me ji me estandin
 Yara delal li ber çavan şewitandin
 Êşa dil zêde kirin jîna me wêran kirin

Dunya li ber çavên min reş kirin
 Hêvîyên min ji dil û serî birin
 Mal û dewranin me bin ax kirin
 Welat birin û laşê min bin ard kirin

Dest û lingên me kelepça kirin
 Hepis û zîndan û girtin zêde kirin
 Zeytûn û hinar ji kokan hîikirin
 Maf û Edalet ji welat ra kirin
 2014.2.15

Mhemed şerîf birhik

KOÇBERÎ

Ji neçarî bûne penaberî
 Bê xwedan û mal û der bi derî
 Li serê xwe nekin ax û xwelî
 Bese koçberî
 Baş binêrin li bingehê net ewî
 Bese karê ezeztî û nakokî
 Va xwîna pakrewana hîn difûrî
 Bese koçberî
 Qî li çavê we nemeye bê nahî
 Yan serê we li hev di fitilî
 Win dibin parsek û bê xwedî

Bese koçberî
 Ê kû dih bûn çete û behsî
 Îro bûne rêber û partî
 Dijmin zûde xwercik bi we dizî
 Bese koçberî
 Em koçber bûn bi dayik bûna xwe
 Bi hizret man ji nasnama xwe
 Nikarin ragirin navê welatê xwe
 Bese koçberî
 Hizreta ceger xwîn li bîra xwe bînin
 Derfet hatiya ji destê xwe ne revînin
 Nûjenkrina rihê netwî pêk bînin
 Bese koçberî

Tevna dijmin li we pêçayî biçînin
 Rewşevnbîrya kurdî di sere xwe de biçînin
 Di ava grav de nelîzin da win xwe ne fetsînin
 Bese koçberî
 Cihû bi cihê xwe ve têne grêdan
 Çiya û Kurdistan li me bûne xwedan
 Xwe nefroşin bê buha û arzan
 Bese koçberî
 Zinçîr û sînorê ser singa xwe hilîne
 Axa te zêrî ne gaz û bembû û genmê şêrîne
 Koçberî ji tere ne mizgîne
 Êdî bese koçberî

Bêwar *BARÎ TEYFÛRÎ*



Cegerê me peritand..

Hezar sale vî dujminî cegerê me peritand,
Hebûna me talan kir bir destê me ji hev qetand,
Welatê me kire wêran şûve- rê of tar û mar,
Cîhanêda em koçber bûn man bê ked û bê debar.

Bi sed salan hebûna me bi hovîtî dizî û bir,
Gevir li ser gevir nehîşt ware cindî pir dêran kir,
Biratîya derew sexte hemberî me dîyar dikir,
Bi nave oldarîyêva hemyarîya xemsar dikir .

Dujminê me pir bi kîne pir xaîne bi fend fêle,
Evîndarê bejna xweye lê kurdara tim qatîle,
Gel ê kurd pir xapandîye ber dîrokê tim ditele,
Rû-rûmeta gelê kurd jî înkâr dike ev şetele.

Raperîn hun ey lawên kurd serbilindî bijîn dunê,
Dersa dagirker vêcarê hevra bi din bi yekbûnê,
Dujmin yekser bitewşîn em di nava gola xwînê,
Em jî ji bo jîna welat bibin xemla serxwebûnê....

Bi qurnava resena me dagirker hezîmand xar,
Welatê me parçe kirin serê me jî hertim bû xar,
Vaye îdî dem hat gihîşt rabin ser xwe ey gelê kurd,
Bi zanebûn dagirker em alt bikin bijîn em xurd .
Dîrokêda nave me ma çawa mêrxas, çawa çeleng,
Şer me mera hemberî hov ji bo welat lazîme ceng.
Azadîya welatê me jîyaneke hetevîye
Azadîya welatê me gelê mera silavîye
Azadîya welatê me zulm -zorê ra tim dawîye,
Pêşeroja me kurda ra ronahîya netewîye.....

Azadîya welatê me her kur dîra
Şahîyeke bê hempaye
Ber dîrokê
Ber mirovahîyê serbilindayî kubarîye
Şerefeke gelêrîye
Şerefeke bê dawîye

12. X11. 2008. BÊWAR BARÎ TEYFÛRÎ

Mihemed Hesko



Evîn

Evîn - (1)

Her ku kulilkên hêviyên xwe
di bin asîmanê te de koçber dikim,
Her ku can, hiş û hestên xwe
Li ser rûbera te belavdikim,
Yekîtiya dil û canê xwe pêktînim?

Evîn - (2)

Tu ne can î...
Ne dil î...
Ne bay î!...
Hêjî...hêjî, nikarim sebakê
Yan çirkeyekê, bê te bijîm?

Evîn - (3)

Tu him text î, him bext î,
Dojeh î yan bi heşt î
Em bi destên xwe avadikin?

Evîn - (4)

Tu ne xweda yî...
Ne ro yî...
Ne welatî!...
Kî ne perestvanê te bî?
Gawir e, na ..na,
Teba û lawir e?

Evîn - (5)

Tu reh û sîbera jînê yî,
Bê parên ji te,
Wê di biyabana windabûnê de,
Pêrgî leylandî hovîtiya xwe bi bin,
Û bi roya bê parî ya jînê,
Dê di solên demê de, bikizirin?

Boniye Cegerxwin



JINIM

Jinim kurdim
penaberim
Bê welatim û
bê warim
Bi hestim ez
bi ramanim
Dilsozim
her evîndarim
Rê bazim
tim bi awazim
Pelwazim qet
Ez ne jarim

Xevzanim ez
ne zîvarim
Xwedî dîtin
û biryarim
Di xwazim
sînoran rakim
Ji ber ku timî
bi barim
L' gulistana me
Herdemî
Gulên rengîn
Dicivînim
Li kolana
gulfiroşim
Bi dilxweşî
Digerînim
Dixwazim her demî
Bêjim
Bi serbestî timî
Bankim
Jinim kurdim
Tevde hestim

Xwedî dîrok û
Bi zavim
Ji zûve bi nav
û dengim
Li cîhanê çende
rengim
Bi kedim her ez
Bi karim
dilovanim
Bi kovanim
Xwedî sozim, bi
peymanim
Bi vînim her
Bi samanim
Dixwazim her demî
Bêjim
Bi armanca xwe
ez bankim
Jinim kurdim
Bi welatim
Xwedî war û
Xwedî mafim
Stockholm.09/06/2006

Dildarê Mîdî



Sol û çarox

Çaroxê Gote Solê
Em herdû li nav holê
Ez û tû herdû çermin
Weke hev dî em germin
çima tu tim buhaye ?
bi rûmet li cihaye ?
Sol xweşike, çi rinda
Li çaroxê bersiv da
Got raste wek te çermim
lê ji te ez bi şermim
Ezê bêjim ji tera
Guh bide van xebera
Got : bi holekî cengî
Ez gihome vî rengî
Parçek çerm bûm qusandim
Ji pirçê daweşandim

nûka kirim gemarê
Min ji ber zare zarê
Xeritandim bi kêrê
Ji wê kevez û qelêrê
Min kir qêrîn û hewar
Kesek nebû alîkar
Dame tava havînê
Kes vê êşê nebînê
Dawî rahiştin mêkut
Li ser min bû firt, firt
L' ser min xup xupa şûjin
Hawîrê min kun bi kun
nû nava min hişandin
Hawîrê min şidandin
lê sebra xwe min kişand
ta reng û rû min sitand
ey çaroxê Xuha min
his bike tû hin bi hin
yê kû rencê nebînê
jînek çak na bûrînê
tim wê bi mînê li paş
ava wî nayê Ser aş

Berhevkar û Nivîskar: Evîndar

LAWIKMAR

Ji wêjeya herêma Anatoliya Navîn

Çi hebû, çi tunebû!



Li wexteke nenas, li warekê Kurdan gundek hebû, li wî gundê jin û merê hebû, kurikên(zarokên) wana tunebûn, wana pir dixwestin ku ma bibin xwedîyê zarokan. Rokê, jina bê zarok li ber Xwedê digere û dibê; "Xwedê yê min! Tu mezinî, tu dizanî em bê zarok in, lawikekî bide me, ma hînge marek be!".

Roj heldihat-roj diçû ava, şev dihatin-şev diçûn, roj û şevan dida pê hev, rokê jin bar dibe, jin û merê wê pir xenê(şa) dibin. Ew bi kefxweşî, bi dilşahiye li benda dergûşa xwe dibin. Ro, hefte, meh, demsal derbas dibin û dergûşa wan tê ye rû dine. Lê çi meskin! Dergûşa wan marek bû! Tirs, xof li wan peyda dibe. Ew dibên; "Me ji Xwedê lawikek xwestibû, me go ma hînge marek be, bi emira Xwedê dergûşa me wek marekê hate rû dinê, Xwedê lawikek da me, lê ew marek e".

Zeman pir dihere, hendik dihere, lawikê wan wek marekî mezin dibe, li gund her kes bi wî ra dibê lawikmar, îdî navê wî "Lawikmar" bû. Emsalên wî gîşk dizewicin, Lawikmar jî dixwaze bizewice, bi dîya xwe re dibê; "Here ji min re keçika malê axa bixwaze", dîya wî mat dibe! Bi wî ra dibê; "Lawê min te xwe şaş kiriye! Çend kesên axa, beg keçika axa xwestin, axa keçika xwe neda, ewê çing rabe keçika xwe bide marekî". Lawikmar dibê "tu dîsa jî here bixwaze".

Dîya Lawikmar ji bo ku keçika axa bixwaze; ji bo xwazginîyê dihere mala axa, li ber qonaxa axa datweste. Li ber qonaxa axa du kevir hene; yek ji bo xwazginî ye, yek jî ji bo parse ye. Dîya Lawikmar li ser kevirê xwazginîyê rûdine. Axa bi berdevkên xwe re dibê; "Rabin, jinek bi şaşî li ser kevirê xwazginîyê rûniştîye, weng xuya dike ku ew parse dike, hinek nan, bulxur bidinê ma here".

Dîya Lawikmar vedigere mal. Lawikmar jê dipirse, dîya wî dibê "ez li ser kevirê xwazginîyê rûniştîm lê wana ez mîna parsekekê dîtîm û bindirîyek (çengek) bulxur û tixek nan dane min". Lawikmar dibê; "So(sibe) dîsa here bixwaze".

Dîya wî dîsa dihere li ser kevirê xwazginîyê rûdine lê dîsa mîna parsekekê bi çengek bulxur û bi tixek nan vedigere mal. Lawikmar cara sisîya li sibe dîsa dîya xwe dişîne mala axa.

Dîya Lawikmar dîsa dihere mala axa û li ser kevirê xwazginîyê rûdine. Axa dîsa dibîne ku ew jina ye û ew jin li ser kevirê xwazginîyê rûniştîye. Vê care axa bi xwe dihere ba jine û bi wê re dibê; "Xaltî ez dibînim ku halê te xizane, tu çima li ser kevirê xwazginîyê rûniştî, kevirê parse ne va ye". Jin dibê "qusûra min mes meke, ez ne ji bo parse, ji bo xwazginîyê hatim, lewma ez li ser kevirê xwazginîyê rûniştîme, lawikekî min heye lê ew marek e, wî kirîye serê xwe dibê `herin keçika mala axa ji min ra bixwazin`, min go axa keçika xwe nade marekî lê ew fam nake". Axa dibê "keçikekê çel xwazginî dixwaze, heqe te ye ku tu jî bixwazî" paşe axa dibê "lê sê şert(merc)ên min hene, eger lawikê te van şertên min bîne şûne ezê keçika xwe bidim wî". Axa şertên xwe weha dibê;

- 1) "Çîyakî bilind li hêla mala min heye, ji ber vî çîyayî oda min ro nabîne lawê te vî çîyayî ji vir rake"
- 2) "Xanîyekî min heye, tiji ce, genim û çewder e, ew gîşk li hev qelivîne, lawê te vana ji nav hev vede"
- 3) "Di ber qonaxa min ra av derbas nabe, lawê te çemekî çêbike û di wî çemî da qaz, ordeng(werde)kê xwe ajne bikine"

Axa di dilê xwe da dibê "van şertên min însanan şa nekir bîne şûne, marek qet şa nake bîne şûne, ji ber we jî ti keçike min narin marekî".

Dîya Lawikmar vedigere mal û şertên axa ji wî ra dibê. Bi Lawikmar ra dibê "min bi te ra gotibû axa ti keçike xwe nade te, ji ber ku ma nade te wî van şertên zor ji te xwestin", Lawikmar dibê "tu meraq meke daye here rehet rakeve, emê sibe hevdu bibînin".

Seda(sibe) dibe, axa ji xew radibe, çavên wî ji şewqa ro bi zor ji hev dibine, çavên wî alû dibin, ew di pencere ra mes dike, şaş û mat dime, çîyaye bilind ê ku li hêla qonaxa wî ji wir rabûye hatîye hêla din, derdikeve dihere ber male, dibîne ku di ber qonaxa wî ra çemek derbas dibe û qaz û ordeng di wî çemî da xwe ajne dikine, dimeşe xanîye ku ce, genim, çewder têda li hev qelivî, dibîne ku ce, genim, çewder ji hev hatine vedane û her yek li hi hêlekê ye. Axa dibê "min go marek şa nake, nikare van şertên min bîne şûne, lê şertên min gîşk hatine şûne, îdî ez nikarim ji soza xwe vegeim", axa dihere ba keçika xwe û bi wê ra dibê "di axatîye da ji soza xwe vegeim nabe, ezê te bidim wî".

Keçika axa bê çare, bê dil, bi tirs, bi qîrîn, bi nalîn çend ro şunda dibe bûk. Şev dibe, bûk li benda zavaye, deri ji hev dibe, di navbera deri ra mar

dixûşe, dikeve oda bûke, ji tirs û xofê dev û levên bûke gîşk direvin, dipertilin. Mar dixûşe dihere quncike ode û li wir radiweste, bûk bi tirs, bi xof li wî mes dike. Lê çi meske! Qalike mêr diqelişe, ji nav wî qalîkî xortekî bejin zirav, bejin bilind derdikeve, wek ro ew dibiriqe bi şewqa rindîya wî, oda ronî dibe. Bûke heta niha qet ti xorte veng nedîtîbû.

Ew xorte bejin zirav, bejin bilind bi rindîya xwe berve bûke te û destên xwe li ser rûyên wê digêrîne dev û levên wê yên ku rivî, pertilî bi destên zava xweş dibin. Lawikmar bi bûke ra dibê "ez bi diskî me, her kes min mîna marekî dizane, dî û bavê min jî min bi vî awayî nasnakin, qalîkê min tim heye, tu qet behsa min ji ti kesî ra meke, eger tu qala min ji kesî ra bikî ezê com(wenda) bibim, ku ez wenda bûm tu min îdî nabînî, wexta ku ez wenda bûm, `şiveke xwe ye hesinî di dest xwe ke`, `çarxekê di lingên xwe ke` û bi gund gund li min bigere, li kîjan gundî şiva te ye hesinî xwar bû û poze çarxa di lingên te da qul bû bizane ez li wî gundî me".

Li ser vana gotinên Lawikmar bûk qet ji ti kesî ra qala wî nake, bûk her ro, her dem di kêfxweşîyê mezin da ye, ji ruyên wê ken, ji dilê wê dilşayî kem nabe. Bûkek çawa li ba marekî ewqas rehet dibe ti kes fam nake!

Rokê li gund dîlanek; dawetek heye, Lawikmar bi xanima xwe ra dibê "ez jî hîro herime vê dawete, ez jî têkevime nav wê dîlane lê tu qet ji ti kesî ra qala min meke, tu qet mebej ew merê min e, tu dizanî wexta ku te wer go ezê wenda bibim".

Gundî gîşk li wê dawete ne, gîşk li wir dîlane dikine, gundî gîşk di coşîyê mezin da ne. Xortek berve dîlane te, hespê wî spî, kincên wî spî ne, bejina wî bilind e, her kes radibe sêra wî, li wî mes dikin, keçikên gund gîşk ji keçika axa loma dikin, dibên "tu keçika axayî, te xortekî veng nekir, te çû mare pîre ji xwe ra kire mer". Keçika axa qet esa xwe (dengê xwe) nake, devê xwe ji hev nake". Ji ber ku dîlan sê ro diajoye, Lawikmar cara duduya dîsa bi hespe xwe yê spî, bi kincên xwe yên spî te ye dîlane dîsa her kes radibe sêra wî, li wî mes dikin dîsa keçikên gund loma ji keçika axa dikin, keçika axa dîsa qet esa xwe nake, devê xwe ji hev nake. Cara sisîya Lawikmar dîsa te ye dîlane, çavê her kesî dîsa li wî ye û dîsa her kes ji keçika axa loma dike, dibên "te xortekî weha nekir, pê ra nezewicîyî, tu bi marekî ra zewicîyî" îdî keçika axa xwe nagire û dibê "we çi devê xwe kirîye kezeba min, hûn çi loma ji min dikin! Ew xortê ku hûn qale dikin merê min e, ew xwe dike tonî marekî, bi rastî ew va xorta ye". Merê keçika axa Lawikmar, li wê dere wenda dibe!

Keçika axa rûdine digêre, dibê "wî ez çend caran teme kirim, go qet qala min ji ti kesî ra meke, min çima qala wî kir!"

Gotina Lawikmar hate bîra wê, ew dihere mala bavanên(dî û bavê) xwe bi bavê xwe yê axa ra dibê "şiveke hesinî bi çarxekê va ji min ra bîne, ezê bi gund-gund li wî bigerim". Ew şiva hesinî dike dest xwe, çarxa xwe dike lingên xwe û bi gund-gund mîna parsekekê li wî digere, lê qet

raste wî na ye, lê ew aciz nabe, ji gundekî dihere gundekî din, bi vî awayî heft sal derbas dibin.

Rokê dîsa berê wê berve gundekî ye û rewîtiya wê berdewam dike, dema ku ew nêzike gund dibe şiva wê ya hesinî xwar dibe û çarxa di lingê wê da jî poze xwe qul dibe. Ew lewa xwe gez dike û ew xenê dibe, dilê wê şa dibe, ew dibê "merê min li vî gundî ye". Ew dikeve nav gund, ew tî ye, devê wê miçiqî ye, dihere ser kanîyekê, li wir emsaleke wê çatiyên xwe ji kanîye tiji av dike, bi wê ra dibê "xêra xwe bi kûpe xwe avekê bide min, ez ji tîna da şewitîm", emsala wê dibê "na ez nadim, va kûpa ji bo merê min e, ew pir bedew e, di gund da bi tene ye, heft salin ew li vî gundî ye heta niha ti kesî bi kûpê wî av venexwar, tu jî venaxwî". Ji ber ku merê wê jî bedew e û heft salin ku wenda bûye, ew dîsa lewa xwe gez dike, di dilê xwe da dibê "ew merê min bi xwe ye", ew wê jine bi dengkirin dide û nêzike kûp dibe, bi diskî gustîlka tilîya xwe diavê hundirê kûp.

Jina ku kûpe xwe ji kanîye tiji av kirî vedigere mal. Lawikmar, her roj li sibe dema ku ji xewe radibe, berî her tiştî tasek av vedixwar, kûpe wî yê ave tim li ber balgî wî ye, dîsa sibekê ji xewe radibe û ji bo ku aveke xwe vexwe ew ji kûp ave berdide tasa xwe û gustîlka ji kûp bi ave ra dikeve tase, ew gustîlka ji nav ave derdixe, dike dest xwe û gustîlka nasdike, ew gustîlka xanima xwe ya bere bû, ew şaş û mat dime, porê wî dike qirçe-qirç, bi hêrs bane bermalîya xwe dike, dibê "te duh kûpê min da dest kesî?", bermalî dibê "jineke mîna parsek li min peyda bû, gotibû ez tî me, xwest bi kûpê te avekê vexwe, lê min neda wê, wê ez pir bi dengkirin dam". Lawikmar zanî ku jina wî ye bere hatîye vî gundî, ew bi coşî, bi heyecan radibe li gund li wê digere û wê dibîne. Ew bi ser hev da digîrin, şa dibin, Lawikmar pê ra dibê "ez heft salin li vî gundî me, ez raste pîrekê hatim, li ba pîre dijîm, bi keçika pîre ra zewicîm, pîr ji min ra bû xwesî, ew pîreke merxur e (meriya dixwe), ezê te wek jineke xulam bibim mala me, ez bi wan ra bêjim va jina ê ji me ra xulamtiye bike, xizmet bide me".

Ew tîna mal, jina Lawikmar a berê wek xizmetkarekê te ye nasandin, lê pîra merxur pir zehmet bi wê dike. Rokê heft broşan tîne, dibê van

broşan ji min ra bi hestirkên çavên xwe tiji av bike, xulam ewqas li ber xwe dide, lê tene broşek jî tiji nabe, ew bê çare bi girî derdê xwe dike ber Lawikmar, halê xwe ji wî ra tîne ziman, Lawikmar lingê xwe li erdê dixê û av ji erdê derdikeve heft broş jî tiji dibin. Pîra merxur dibîne ku her heft broş jî tiji bûne, ew metal dime, şaş dime. Vê care pîra merxur heft balîya tîne ji xulamê ra û dibê "van balîyan ji min ra bi pirtikên çûçikên ewr tiji bike", xulam dîsa bêçare alîkarîye ji Lawikmar dixwaze, Lawikmar bi zimanê çûçikan bang dike û çûçikên ewr bi kom-kom dikevin rêze û tîna ber xulamê, pirtikên xwe didin xulamê, xulam jî bi van pirtikan her heft balîya jî tiji dike. Pîra merxur dema ku dibîne heft balî jî tiji bûne ew ji Lawikmar şuphe heytene. Lawikmar bi xulamê; xanima xwe ya berê ra dibê "pîra merxur bi me hesîya, ew dizane dilê min berve te ye, ew a me her dudu ya jî bixwe, emê sibe ji vir herin, birevin".

Sibe dibe, Lawikmar dest, ling û devê xanima xwe ya ji pîra merxur girêdide, teştekê tiji av dike û du ordenga dike nav ava di teşte da, ordeng xwe li ave dixin di teşte da. Lawikmar bi xulama male yanî jina xwe ya sifteh va destê xwe dikin destê hev, berê xwe didin gundê ku heft sala berê terk kirin û dest bi rewîtiya xwe dikin. Pîra merxur biryar da bû ku xulam û Lawikmar bixwe, pîra merxur ji bo ku bixwe dihere oda xulamê, lê nabîne, dihere ber deriyê oda Lawikmar, dibihîze ku dengê ave te ye, ji ber wê jî keçika xwe bi Lawikmar va seriyên xwe dişune, ew naxwaza rehetîya wan birevîne, ew li ber deri dipe ku ma serşuştina wan xelas bibe û paşe Lawikmar bixwe, heta nivro dipe lê tim dengê ave te ye, ew dibê "va çi serşuştina veng e!", îdî nape dikeve ode. Lê çi meske! Di ode da di teştekê da du ordeng xwe li ave dixine û keçika wê jî dest, ling, dev hatine girêdane. Pîra merxur dizane ku xulam û Lawikmar revîya ne, bi hêrsekî dikeve pê wan, li dûre du qeratîya dibîne, dibê "paşîya wan hat, ezê wana her dudu ya jî bixwim".

Lê dema ku ew nêzike wana dibe ti kesî nabîne, li wir du mar hene yek spî ye, yek reş e. Pîra merxur bêçare vediger mal. Rewşe ji keçika xwe ra qal dike, dibê "min her du jî dîtî, lê ez nêzîkê bûm ew her du jî wenda bûn, du mar li wir hebûn yek spî,

yek jî reş bû", keçika wê dibê "marê spî Lawikmar e, marê reş xulam e, te çima nexwar?". Pîra merxur dîsa dikeve pê wan, ew dîsa du qeratîya dibîne, lê dema ku ew nêzika wan bû dîsa ti kes tunebû, kanîyek hebû û bi ser kanîye va tasek hebû. Ew dîsa bêçare vedigere mal, rewşe ji keçika xwe ra dibêje, keçika xwe dibê "kani Lawikmar e, tas jî xulam e, te çima nexwar?". Pîra merxur dîsa dikeve pê wan, dibê vê care min çi dît ezê bixwim, ew du qeratîya dîsa dibîne û dema ku ew nêzika wan qeratîyan dibe, her du qeratî jî dibin du kevok û difirin. Pîra merxur zanî ku ew bûne du kevok, lê îdî şa nake, nikare wana bixwe, ew bûne kevok û baskên xwe li hev xistin firîyan û çûn. Pîra merxur, bê teqat dime, bêçare vedigere mal, saxîya xwe ji wan dike, dest ji wan ber dide.

Her du kevok; Lawikmar û jina wî, baskên xwe li hevdu dixin, berê xwe didin gundê ku heft salin terk kirin, gund, bajar, çîya gîşk li paş wan dimen û ew tîna gundê xwe, li ber mala xwe datewistin.

Ew ji tone(qilixê) kevokan derdikevin. Lawikmar îdî ne lawikê ku di nav qalikê mar da ye, ew lawikekê bejin zirav, bejin bilind e, keçika axa jî bi wî serbilind e. Dî û bavê Lawikmar ji xeman, ji wendabûna Lawikmar û bûka xwe bêhal, bêteqat ma ne, çavên wana kor bûn e. Lawikmar destê xwe bi ser çavên wana digerin û çavên wana ronîya dine, şewqa bejna Lawikmar û bûka xwe dibînin.

Axayê gund; bavê jina Lawikmar gotibû "wexta ku keçika min hate gund kê xeber da min, ezê nivî yê malê bazirganîya xwe bidimê". Dî û bavê Lawikmar gotibû "heta ku Lawikmar venegere mal, em ocaxê xwe vênexin".

Jineke xizan li gund hebû, ew dibîne ku paca (dûkêşa) mala Lawikmar dû dike, dimeşe xebere dide axayê gund. Axa nivî yê malê bazirganîya xwe dide jina xizan. Axa li gund heft ro, heft şev daweteke mezin çêdike, li gund çend gundî hene gîşka dawet dike, her kes li wir dîlane dike.

Derd, xem, gîşk xelas dibin û şûna xwe didin dîlşayî û kêfxweşî ye.

Li vir qedîya çeroka min

Sinîyek mit û mast li cumata min.

Ji arşîva tirej.com

**Gelê
Kurd
Yeke,
Lê
Hêzên
Xwe
Ne
Yekin..!**



Beyar Robarî

Ger tê sozbidî xakê teyê peyxberekî hûne! - 2



Min xalê Nehso û jina wî rojeka payîzî sala 1982' yan serlêdankirin û ez bi wan re li ser çûndina bijîşgeha dr. Emînê axivîm. Jibo hevdîtina wê û xakê Semîrê .

Xalê Nehso got: Xarzê ber gî ez kêfxweşim bidîtina te û herwisa razîbûna te tu herî keçîkê bibînî û ew te bibîne û hûn hevdû nasbikin.

Min got: Sipas, ez jî kêfxweşim bi dîtina te û xalojn û zarokan ve.

Xalê Nehso: Zar ger em neşînin pê te, tu netêyî ba me û li me qet napirsî?!

Min got: Xal, bawerke hûn herdem li bîr û bala minin. Lê tu zanî xwendin û hin rojan ez dibêr xwendinê re kardikim bişev . Jibo ez xerciya xwe derînim û zorê pir nedim ser milê babo . Wek tu zanî komek zarok di stude ye . Û ji bilî we jî karê partiyê heye û hinekî mala we jî ji me ve dûre .

Xalê Nehso kenî û got: Erê xarzê tu singan bikute ber! Tirsî min tê tu tim lidû jinkan digerî ...!

Di wê navberê de bi pîreka xwe re got, dotmam ez heyranê te, tu xwarinê ji me re amedebike û mala zarok jî çakê bikêlinin ta xwarin çêdibe.

Xalojin: Serçavan ezbenî, ezê bixwe ji we re çayê bikêlinim û dibere xwarinê jî amedekim. Ma çend xarziyên me hene .

Min got: Sipas xalojinê.

Xalojin: Şaye nîne xarzê.

Xalê Nehso: Bibore min denkirina te birî, kermke bibêje.

Min lê nêrî û got: Xal derdî jinakan hêsane. Pêwîstnake ez li pê wan bigerim, jiber ciyê ez bişev lê kardikim tijî jinike!!

Xalê Nehso: Seyr ma û hindik ma çav ji serî derên û dev bibostekê vebû û got: Te got çi?

Min got: Wek te bihîst, ciyê ez lê kadikim tijî jinikin.

Xalê Nehso: Tu rast dibêjî xarzê?

Min got: Belê ez rast dibêjim. Ma çi pêwîstî heye ez derewan li te bikim!!

Xalê Nehso: Xarzê tu çi karî dikî bişev û li ku derê tu kardikî?

Û ew jinkane li wê derê çi kardîdikin?

Min got: Xal, hêdî-hêdî .. hêdî-hêdî . Te dehe pirs bihevî kirin, ez ke çawa bersîvê van pirsan giştikan bidim!.

Xalê Nehso: Xwe bamede û zû ji min re xeberda, tu çi karîdikî û liku. Berî xalojina te tê û parsîyên me herdûkan xiş dike.

Min got: Hele em berê cixarakê vêxin û ger zehmet nîne tu tepsiyek cixaran ji min bixweze.

Xalê Nehso: Başê, lê li gor min divê tu dest ji van cixaran berdî. Ev nekarê mirovî zane û baqile .

Wî bane kurê xwe kir û got:

- Cemşîd lawê min, ji kerema xwe tepsiyek cixaran ji kurê meta xwe re hûne.

Cemşîd: Başê bav.

Di navbera du xulikan de, Cemşîd tepsiyek cixaran anî û got: keremke ev tepsî.

Min got: Dest xweş Cemşîdo.

Cemşîd: Şaye nîne layê metê.

Min got: Cemşîd tu di kîjan polê deyî niha?

Cemşîd: Ez di pola şeşemîn de me.

Min got: Ger weye, ev sala dawî ye jibo te di dibistana seretayî de.

Cemşîd: Belê gotina raste.

Min got: Ez serkeftinê ji te re dixwazim û biparêze.

Cemşîd: Sipas û tu jî tim xweşbî.

Çemşîd ji hundir çû û ez û xalê Nehso bi tenê man û wî got: Em vegerim ser mesela xwe.

Min got: Mesela çi xal?

Xalê Nehso: Xwe li rentelî mene û were ser rê û zû xeber de, berî xanim tê. Jiber em nikanin babetên wisa li pêşîya wê vekin .

Min got: Mesla dîtina Smîrê? Xelas tu bibêje kengî û çi çaxî û emê bihevî herin û wan bibînin .

Xalê Nehso: Emê werin ser wê meselê, lê berê ji min re bibêje tu çi karî dikî dibêr xwendinêre. Û wan jinkane li ba we çi dikin?

Min got: Ez heftê çend şevan dibêr xwendina xwe re, li xwaringehê li navada bajarê kardikim. Û xelk tîn li wir dixwun û vedixwun û rûdinin û direqsin .

Xalê Nehso: Ev çi xwaringehê?

Min got: Xwaringehêk taybete, xelk lê dixwun û vedixwun û direqsin. Milet netê wir jibo xwarinê, belam jibo şevê xweş û şad bihevî derbaskin li gel mûzîk û reqsê.

Xalê Nehso: Çi kesin even tînî ba we rûdinin û vedixwun?

Min got: Piraniyên wan dewlemendin û hin jî berpirsyarên bilindin di dewletê de. Di nav wan de, fele hene û musliman lê min ti kurd nedîn!

Xalê Nehso: Lo Kurd hemî xizanin û kesî ji me nakin berpirsyar di postên bilinde.

Min got: Gotina raste xal. Û ger kurdek dewlemend jî hebe ya jineka din dibe an mirovekî dikoje yan jî bi wan peran kabê dilîze.

Xalê Nehso: Me dibhîst kû ciyên wisa hene, lê min ti caran ciyek wisa ji hundir ve nedîtî û ne jî çûmî wir. Û ne pereyên me hene em herin li cîkî wisa danîşin û haqas pera di şevê de serfkin . Jinikên tînî ba we rindikin xarzê ?

Min got: Piraniyên xwe ciwanin û ji xwe xweşin.

Xalê Nehso: Xwarin û vexwain li ba we buhayê?

Min got: Helbet buhayê jibo kesên wek min û te. Wek din ligor tiştên tu bixwî û vexî dinêre. Numîne wiskî û maseyên kêleka PÊST gelekî buhane .

Xalê Nehso: Pêst çi ye?

Min got: Meydana mêvan lê direqsinî.

Xalê Nehso: Te dît em tiştêkî nû fêrbûn xêra te. Tu jî meyê vedixî ?

Min got: Belê ez vedixwum lê hindik û li dawîya şevê, jiber xwediyê xwaringehê razînabe em dema kar vexwun da em serxoşnebin.

Xalê Nehso: Ta çi çaxî hûn bişev kardikin?

Min got: Ta demjimara dudiyar, sisiyan û carna ta çaran bitaybetî şeva şemiyê û yekşemê.

Xalê Nehso: Kengî tu xewdikî û derî dibistanê? Û çawa tu kanî damîş bibî ?

Min bersîv da û got: Hincaran du-sê demjimaran ez xewdikim û radibim derim dibistanê. Ez neçarim damîşbim da ez xerciya derxim û destê libe kesî venekim . Jiber ez dixwazim biserê xwe bijîm û kes ji min re nebê kuve çûyî û kuve hatî û habû û haçû!

Xalê Nehso: Nezehmete jibo te, xwendin û kar dibêrêve?

Min got: Zehmete, lê ti rêya din lipêşîya min tunene.

Xalê Nehso: Raste xarzê jiyana tevde zehmetî ye.

Min got: Gotina te dicîde ye.

Deng bideriyê odê ket û dengê xalojina min ji pişt derî hat û got:

- Ez kanim derbasbim?

Xalê Nehso: Belê, tu kanî derbasbî dotmam.

Xalojin: Fermû, ev çayê ji we re.

Xalê Nehso: Destxweş diya Cemşîd, ez bi qurbane te. Û xwarin giştê ku ?

Xalojin: Hindik ma bikele. Ta we çayê vexwarî wê biserîbibe.

Xalê Nehso: Xarzê ne ji vê jinkê be, emê li erdê bimînin.

Min got: Ger weye divê tu qedira wê duqatî bigrî.

Xalê Nehso kenî û got: Ez qedra wê pênc qatî digrim.

Xalojina min ji kenare hişkbû û got:

Xalî te dest ji henekan bernade û xalanên te hemî wisane, tim henekan dikan.

Min got xalojinê: Basiliyan nikanin bêhenek bijîn û ev jî taybetmendiyek xelkê gundê Basilê ye. Û herkes nikane henekan bike . Paşê jiyana bêhenek jî, bi du qurşan nake .

Xalê Nehso: Gotina raste û rastire ji çeneqek maste.

Xalojin: Başê ez vedigerim kelingê, xwarinê biserî bikim. Û bes biserîbû ezê deng li we kim.

Xalê Nehso: Başê dotmam, Xwedê ji te razîbe.

Min got xal: Kengî tu dixwazî em herim ba Emînê û Semîra?

Xalê Nehso: Pênşema werî demjimara pêncan li pêşîya sînema- Al-Harma emê hevdû bibînin û paşê hilgerin ba wan.

Min got: Başê. Bes ger zehmet nîne ezê birakê xwe Hejêr jî bixwere hûnim .

Xalê Nehso: Xem nake, bes xwe xweşik çêke û kincina delal li xweke û were.


Min got: Ji wî alî de bêqîswet be.

Min jê pirsî û got: Xal keçik li Efrînê rûdine lê hero dere û tê?

Xalê Nehso: Wek ez zanim odak bikirê birî tev hevalek xwe û li wir dimîne û heftê carekê dadikeve Heleb - mal.

«Dawiya beşa duyemîn û ji kerema li benda beşa sêyemîn bin»

Çend pêzanîn li ser Keştiya bi navê "Kurdistan"



Keştiya yekê di sala 1914 de ji aliyê kompaniya "Short Brothers Ltd" li Birîtaniya hat avakirin, û navê paporê (keştî) kire Kurdistan .

27 Şibat 2014 Pêncem 09:30

Çend pêzanîn li ser Keştiya bi navê "Kurdistan"

Ew papore kete kar, heta sala 1917 gelek geşt li seranserê dunyayê kirin. Lê ew di 20. meha 9, sala 1917, 50 KM nêzikî Girava Panteleria, bi Subamarinek Almanî bi sarûxên binav ew da ber êrîşan û bin av kir!

Papora duyê ku eva di wêneyê de diyar, di sala 1928 de ji aliyê heman kompaniya Brîtanî ve hat duristkirin û navê wê dîsa lê kir "Kurdistan"

Vê paporê gelek geşt kirin ji Çînê bigre heta Amerîka û Keneda, 13 salan kar kir wekî keştiyêke lojistikî ji bo karubarên Ceng û leşkerî.

Ew jî di 10 meha 12 sala 1941, dîsa kete ber gulebaran balafirên cengê yê Almanî li nêzik Îrlanda, saet 11:57 yê şevê binav bû.

66 leşkerên Neyvî tede bun.. 10 ji wan hatin kuştin û 56 rizgar bûn. Ev nûçe di rojnameyan de nehate belavkirin, nehênî hate hiştin . Di dema şer de, ji ber meselên taktîkî û stratejîk yê leşkerî .

Lê her 50 salan carekê arşîfa gelek dewletan tê aşkere kirin .


Ev wêne ji arşîva Brîtanî ye . (Hişyar Kêsteyî)

Wêne ya Celadet Elî ya herî tali yê...

1950. Li Gundê Hegana, pêştahatîyê Kurd
Husên Hebeş û Mîr Celadet Elî Bedirxan



Danasîna Filimê Siya Zuha (Trockene Schatten)



Li bajarê Mûnster ê Elmanî yekemîn car di mehrecana filimên kurt de li ser asta Europa beşdar dibe.

Ji nav 100 filiman, yek ji 10 filimên baş tê hilbijartin

Nav: **Siya Zuha** (Trockene Schatten)

Lîstikvan:

Mario Schoppe - Daniela June - Akram Kiro - Rainer June

Christian Spät **Çîrok:** Arin Mezgin

Kamîra, senaryo û derhêner: Ekrem Sîtî

<https://www.facebook.com/ekrem.sity.3>

TU DIZANÎ?

05/01/1905 Bûyîna Apo Osman Sebrî.
 8/10/1958 vegera nemir M.M.Barzanî ji Sovêtê
 22/01/1946 Qadî Mihemed komara Mihabad ragehand
 14/02/1925 şoreşa Şêx Seîd Pîran
 01/03/1979 Barzaniyê nemir çû ser dilovaniya xwedê
 03/03/1193 Selahedînê Eyûbî li Dîmeşqê çû ser dilovaniya xwedê
 04/03/1927 Ehmed Parafî bi darvekirin (şoreşa Qetena)
 06/03/1975 Peymana Cezairê.
 08/03/1910 cejna jinan (kongirê Kobinhagin jibo jinên ku şehîd bûbûn li Şîkago).
 09/03/1989 Mihemed Şêxo çû ser dilovaniya xwedê
 11/03/1970 Beyana 11 avdarê ku kurdan mafê Okonomî li başûr girtin
 12/03/2004 Serhildana Qamişlo.
 13/03/1974 Leyla Qasim bi darvekirin
 16-17-18/03/1988 kuştara Helebçe
 19/03/1984 Arif Beg koçkir, li Dugirê veşartin
 21/03/612bz Cejna Newroz
 23/03/2002 Seydayê Tîrêj çû ser dilovaniya xwedê
 21/03/1986 yekem car li Sûrîyê li Şamê, Newroz bi xwepêşandan hat pîroz kirin û Silêman Adî bû yekem şehîdê Newrozê
 24/03/1994 şewata zindana Hisiça
 24/03/2002 Seydayê Tîrêj koçkir
 25/03/ 1975 serokê serhildana Agirî Ihsan Nûrî Paşa mir
 31/03/1947 Qadî Mihemed li meydana çarçira ligel hevalên wî bi darvekirin
 31/03/..... roja bîranîna şehîdên kurdistanê
 21/04/1954 Civata yekîtiya xortên demuqratên kurd li Qamişlo hat damezirandin.
 22/04/1898 Cejna rojnamegeriya kurd.(M.M.Bedirxan rojnameya kurdistan li Qahîre).
 01/05/..... Cejna karkeran
 15/05/1932 Hejmara yekem ji kovara Hawarê li Şamê hate belav kirin
 28/05/1995 Tehsîn Taha li Holenda çû ser dilovaniya xwedê.
 14/06/1957 Damezirandina yekemîn partiya kurd li kurdistana rojava(Sûrîyê).
 29/06/1926 bidarvekirina Şêx Seîd Pîran û 46 hevalên wî.
 04/07/1992 Parlemanê kurdistana Başûr hate lidarxistin.
 10/07/1948 Mihemed Emîn Zekî koçkir.
 11/07/1909 Bûyîna Rewşen Bedirxan li Qeyserê-Anadolê.
 13/07/1989 Dr : Ebdilrehman Qasimlo li Viyena bi destê Îraniyan hate kuştin.
 15/07/1951 Mîr Celadet Bedirxan koçkir



24/07/1923 Peymana Lozanê.
 10/08/1920 Peymana Sêverê.
 12/08/1960 Girtina rêberên kurd endamên partiya yekemîn.
 20/08/1920 Bajarê Qamişlo bi destê Firensiyayan hate avakirin.
 09/09/1984 Yelmaz Gunay koçkir .
 11/09/1961 Şoreşa êlûnê ya ku Berzaniyê nemir pê rabibû
 17/09/1992 Sadiq Şeref Kindî serokê P.D.K.Îran li Berlînê şehîd ket .
 20/09/1992 Mûsa Enter şehîd ket .
 05/10/1962 Serjimartina şovenî li parêzgeha Hisiça di derheqa kurdan de .
 05/10/1992 Girtina 350 kesên kurd bi tawanbariya ku kaxet li dujî hikûmeta Sûrîyê li dîwaran xistibûn koçkir .
 10/10/1991 Ebdilhemîd Zîbarî şehîd ket .
 11/10/1993 Apo Osman Sebrî koçkir .
 22/10/1984 Cigerxwîn koçkir .
 22/10/..... Roja helbesta kurd li kurdistana rojava.
 30/10/1985 Qenatê Kurdo koçkir .
 03/11/1997 Kemal Ehmed Derwîş (sikreterê partî) û Şêxmûs Yûsif Şêxmûs şehîd ketin .
 09/11/1995 Leyla Zana xelata " Sakarov" girt.
 11/11/1918 kovara Jîn li Istenbolê destpêkir .
 13/11/1960 Şewata Sînema Amûdê .
 10/12/1948 Daxuyaniya cîhanî ya Mafê mirovan .
 13/12/1981 Kuştara Cernikê li Qamişlo, 15 şehîd û 3 brîndar .
 17/12/1946 Dagîr kirina komara Mihabad û girtina Qadî Mihemed .



Sernivîs

Qado Şêrîn

Rêvebirê Nivîsînê

Xorşîd Şûzî

Desteya birêvebir

Abdilbaqî Huseynî

Ezîz Xemcivîn

Lawîn Şêxo

Pîr Rustem

Derhêner

Xorşîd Şûzî

Ji bo hinartina berhe mên kurdi:

kurdi.penusanu@gmail.com

Jimarên "Pênûsa Nû" Tev ji vî Emêlî derxînin:

www.penusanu.com

